ويجد بئر مائي قديم حفره أهل المنطقة، عمقه ٣٠-٣٥ م، وتم لفه بالحجارة، وكان يعتمد عليه أهل القرية في تأمين مياههم في السابق. كما كانت القرى المجاورة (حزني، حجيرا، بوغازي، سيحة، بعاجا، تل خنزير) تعتمد عليها أيضاً في السابق، وكانت النساء من كن يجلبن المياه من البئر، ويحملن أوعية المياه من البئر إلى بيوتهن، وقد توفيت امرأة من قرية حزني المجاورة غرقاً أثناء محاولتها جلب المياه من البئر، كما وقعت فتاة من القرية في البئر لكن تم انقاذها، أما في الوقت الراهن، فيملك كل عائلة بئر مائي يعتمد على «الغطاس» لإرواء بساتينهم وتأمين مياه الشرب، وحفر البعض آبار بحرية ضمن أراضيهم لإرواء أراضيهم، ولم يعد الأهالي يعتمدون على البئر القديم.

وبالقرب من القرية يوجد سد «كريمة» على واد يتجمع فيه مياه السيول الناتجة عن الأمطار، وخلف السد بحيرة كان يعتمد عليها في السابق بإرواء الأراضي، أما الأن فأصبحت منطقة سياحية، ويقام بجواره حفلات عيد النوروز في بعض السنوات.

ويعتمد أهل القرية في تأمين معيشتهم على الزراعة وخاصة القمح والشعير والكمون والعدس. كما يملك كل عائلة قطيع من الأغنام، ويكثر في القرية البساتين.

ويوجد في القرية أيضاً مطحنة تضم آلات تعتمد على الطاقة الكهربائية، يعود لصاحبها المعروف بـ حسن أبو خورشيد، وافتتح مطحنته في عام ٢٠٠٤م، ويعتمد عليه أهالي القرية وجميع القرى المجاورة.

كما بنيت فيها مدرسة للقرية (ابتدائية واعدادية) في عام ١٩٨٩م يأتي إليها تلاميذ القرية والقرى المجاورة لها أيضاً.

وكان كبار القرية يقضون لياليهم بأصوات الدنكبيج (الغناء الشعبي) في بعض الأحيان، وفي الوت الراهن يوجد في القرية الدنكبيج فاضل داوود حيدر، وابن عمه محمود حيدر.

صور من قرية عاصي، التقطت في بداية عام 2019

■ صور من قرية عاصي، التقطت في بداية عام 2019

واحة الحلم

إذا تعثّرت به الخُطا في درب من دروب الحياة، ولم ينال ما يحلم به، فلا ينعِ حظه العاثر، أو يلعن الظلام، أو يُلاحق مغتال حلمه، نم ملء جفونك قرير العين وأحلم من جديد، فالأيام حُبلى بكل جديد.

جمعة الحيدر

تسوّغ لي نفسي أحياناً الرغبة في الفرار من زوابع الحاضر وفتنه وإخفاقاته إلى واحة الحلم، الرابضة على ربى الخيال الجميل .... وأنا بذلك أمارس سياحة رومانسيّة ممتعة عبر دهاليز الوجدان، شؤوناً وشجوناً، ويمكن وصف حالة الفرار هذه، بأنّها ضرب من التمرد الصامت للنفس بإرادة وبدونها، سراً أو علناً، على ما حولها ومن حولها، مما تراه رمزاً للإحباط في عالمنا الحزين.

إنَّ الحلم الذي أتمناه وأنكره في آنٍ واحد، هو حالة من نور ونار، فهو نور كلما اقترن بالوسيلة المبدعة لتحقيقه، وهو نار كلما حلّق بصاحبه في أجواء يحتضنها السراب، فإذا استعاد وعيه، أو عاد إليه وعيه لم يشهد إلاّ ألسنة من لهب الفشل.

ولقد علّمتني الحياة أن أمرّ الأحلام أعذبها، لكّنها في هذا الحال تظل أطيافاً لا تُضيء حقاً ولا تطفئ باطلاً والحديث عن الحلم معين لا ينضب، يستمد من الوجدان شفافيته، ورحابة أفقه وحميميّة مضمونه، لكنّه في كل الأحوال يظل نجوى مغلفة بخصوصيّة الأنا التي تمنح الحلم شأناً خاصاً لا شأناً لأحد به أو سلطان.

أُوجه دفة الحديث الآن إلى الحلم نفسه من منظور ذاتيّ، أبسّطه عبر عدد من المحاور القصيرة:

الحلم مراتب، أعلاها المستحيل، وأدناها الممكن، وأوسطها ما لا قد يأتي تحقيقه في اللحظة والآن، لظرف زمان أو مكان، أو لعلة من علل النفس والهوى تتطلب ترويضاً يعدل مائلها ويصلح

ما أفسده الزمان بها.

وقد يسألني سائل بم تحلم؟ فأقول:

أحلم بعالم مفرّغ من الحرب، مشحون بالحب، نقي من الأثرة، غنيٌّ بالإيثار.

أحلم بعالم يعشق حرّية الإنسان وكرامته، ويبدع في ردم فجوات الفقر والجهل والمرض التي تعوق أداءه حيثما وجد.

أحلم بالعيش سعيداً مع من أحببت وأخلصت له حبي.

أحلم بحياة بين أناس جمعهم الحب وألّفت المحبة بين قلوبهم.

واستشهد على بعض ما أقول بشيء من أطلال طفولتي، فقد كان أغرب ما فيها أنّني لم أحلم يوماً خلالها بأي مما تحقق لي اليوم – بفضل الله –.

سواء في الشأن الشخصي أو العام، والسبب في ذلك أنّ مساحة مهمة من فجر طفولتي كان يكسوها جليد الحرمان، وكنت أحلم آنئذٍ أنْ أنعم كبيراً بما افتقدته صغيراً بدءاً من الغذاء اللذيذ وانتهاء بالرداء المنصف لآدميتي، وأحمد الله من قبل ومن بعد أنْ تحقق لي أكثر مما كنت أحلم به، ووجدت من أحبني واستحق حبي.

وليعلم كل من يهرول في سراب الحلم وسناه:

أنّه إذا تعثّرت به الخُطا في درب من دروب الحياة، ولم ينال ما يحلم به، فلا ينعِ حظه العاثر، أو يلعن الظلام، أو يُلاحق مغتال حلمه، نم ملء جفونك قرير العين وأحلم من جديد، فالأيام حُبلى بكل جديد.

لا تحلم بالمستحيل كيلا يتحول حلمك إلى سكين يغتال فيكَ إرادة الحب والحركة والحياة.

تذكر أولاً وأخيراً أن الحلم أصناف.

منها ما يرقى إلى مستوى الإلهام، ومنها ما يهبط إلى قاع الفشل.

ومنها ما تبدده ريح الغلو، فيغدو هباءً منثوراً، عندئذ يتحول الحلم إلى فضلات تسكن العقل الباطن لا تؤتي خيراً.

نافـــذة حـــرة

خاطرة

سارة النعسان

لنتجرّد من زيفِ ما بعد الفُراق
بما يكفي لنصِل مسافةٍ
قدرُها مَيلين من الودّ اليتيم فينا
قلبي غسلتهُ بِماء يقيني
أنّ هذا البُعد لم يكُن إلا ضرباً
من المُباغتة المعزّزة بأكوامِ شوقٍ
وإبرةُ نسيانهِ صَدأة للغاية
والغايةُ لفظَها رحِم الألَم ..
قبل اللقاء الغير مُدبّر لهُ
كانت ذائقتي الخياليّة ترنو
لتحقيقِ ما أخرجَت في سرّها من حواراتٍ
عذبة كـ رذاذِ حُبّ الجيلِ
الّذي لن تُخطّ مشاعرنا في سجلّ تاريخهِ
ورغمَ انفطار الرّوح
على نصفها الفقيمة في ودائِعكِ
صمتتُ كأنّني أبكمٌ
ورداءُ التّعب ارتداني ومضى بي
نحو انبهارٍ .. انهيارٍ لستُ أدري
وأنا تحت تأثيرٍ منكِ يشدُّني إليكِ
تجاهلتُ جبل الكلمات المرتبِكة والخجِلة كـ أنتِ
لألتزمَ حُرمة فُراقٍ أقسمَت
كلّ موجوداتِ الله على الأرض
أنّهُ وفي شريعةِ العِشق حرام . .



Mihemed Çawîş - محمد جاویش

محمد شاهين ـ Mihemed Şahîn

Yasir Kobanî - ياسر كوباني

Ebdo Ebdo - عبدو عبدو

rêgir û reşikên şevê di pêşîya rêya min de bendek ava dikirin, xwe dighandin asoyên xeyalên min ên xweşik û ji xewnên min ên xweş re sînor datanîn, bi tundî kenê li ser rûyê min dişelandin û melûl dikirin dirûvê min. Şevên tarî bi ser min de dihatin zûrzûra guran dihate guhê min, gurgura ba û bablîsokan bi ser min de dihat. Ez dihiştim li ser sinfonîya tevnê bê dengîyê di cenga mirin û jîyanê de û di nava tarîtîya pêlên şevê de digerandim. Lê ez bi vîyanek ji pola me, min dixwest ez bighêjim armanc û omîdên xwe, min hewildana avakirina bexçeyê xeyalên xwe dikir.

Ji germahîya tîrêjên rojê, ji dengê xumxuma ava rûbar û çeman, dengê çivîk û bilbilan, ji bêhna buhara kulîlkên nûpişkivî, çîçek û sosinan û ji semaleke bayê sibehan, ez pir dilşad û kêfxweş dibûm. Dema vedenga dengê siwarê hespê rewan ji dûr ve dihate min, gazî min dikir bi kilamên dengbêjan, bi helbestên evîndaran, bi hêrsa şoreşvanan û digot: Warê hêvî û omîdan pir dûr e delalê, pêl û kaş e, gelî û av e.

Tenêtî zor e, zehmet e, barekî giran e, tenêtî penaberî ye. Ka destê xwe bide min em dê bi hev re rêwîtîya salên bê dawî û bê veger berdewam bikin. Divê em hêvîyên xwe nemirînin û newestin, divê em behsa evîna xwe ya bê mefer li her deverê bikin. Destê min girt û ez li pişta mehîna xwe siwar kirim.

Bi xatirxwestinekê pişta min da oxira felekê û berê min da rêya hêvî û sermedîyê, li zozanên buhişta cîhanê gerandim.

Nizanim, min kul û xemên xwe yên bi dehê salan jibîr kirin, bayê evîna nûjen ji nû ve li dilê min dida. Êdî rûyê gerdûnê têra min nedikir.

Ma seferberîya rêya dûr û bê dawî çi ye hevalo?. Dema ku ez bi xewn û xeyalên xwe re di kêleka te de digerîyam wê demê ez bi bîr û bawerî gihîştim mirad û mexseda xwe.

Xewn û xeyalên min tev bi cih hatin, gava ku ez bûm gulek ji gulîstana evîna dilê te. Wê gavê axaftinê dayika min dihatin bîra min ku digot "Dawîya hemû êş û kederan mizgînî tê, dawîya şevên tarî ronahî ye", belê hevalo min bi te re tekez kir ku dawîya xefetan kêfxweşî ye.

Ey rêhevalo fenera rêya tarî û dûr bi te rê hate vêxistin.

Banga Sibehê

Dema ku ez bi xewn û xeyalên xwe re di kêleka te de digerîyam wê demê ez bi bîr û bawerî gihîştim mirad û mexseda xwe.

Salîha Qasim

Bi berbanga sibehê re hêvîyên min ji nû ve zindî dibin. Şevên ku bi xemgînîyên min ve xatir ji min dixwestin di nava bê tixûbîyan de dihiştin yadgarî û bîranînên min. Bîranînên pir biêş û keder bi bîranînên pir bi hêvî û omîd re diketin cirîd û qoşmê de, ez li pişta hêvîyên pir bi nirx siwar dibûm.

Min lingê xwe li rikêbê dida û berê mehîna xwe ya kimêd berdida, wê li kur bisekine ew der cih û warê min ê sermedî ye. Çol bi Çol, deşt û newal ez gerîyam, di nava gelek pêlên derîyayê re derbas bûm. Lê mixabin mehîna min êdî ji rêya dûr hêdî hêdî dilukumî, sar dibû, diwestîya, nema nedikarîbû rêya hêvîyên min bi min re berdewam bike.

Min rêwîtîya demsalên bê dawî bi tenê berdewam kir. Gelek caran

ku ava van kanîyan di hemû demsalan de diherike. (Kanîya Boliq) li bakurê gund e û xelkên gundê Elkê ango (Balîya Jêrîn) ava vexwerinê jê peyda dikin. Gundê Elkê ango (Balîya Jêrîn) nêzî 1 km li rojhilatê gund e, hemû nişteciên gund ji malbatên Balîyan e.

Nêzî 62 xanî û bêtirî (1200) kes li gund dijîn, her wiha nêzî 60 malbatên gund li navenda Bilbilê nişteciê bûne bi sedema aştengîyên li ser sînor ji alîyê Dewleta Tirk ve ku lawirên gundîyan dikuştin, zevîyên wan mayîn dikirin û gelek kes di teqîna mayînan de lingên xwe ji dest dan.

Di sala 1938'an de sînor di navbera Bakur û Rojava de hat danîn û gundê Balîya Jêrîn tevlî Bakur bû û navê (Barcoqa) lê hat kirin û Balîya Jorîn bi navê Balîya ta niha tê naskirin û ta niha têkilî di navbera herdu gundan de heye û qut nebûn ruxmî têlên rêsayî ku welatê me perçe dikin. Gelek zevîyên gundîyan piştî danîna sînor li alîyê sînor yê din mane û di dest dewleta Tirk de ne.



■ **Gundê Balîya**

tê naskirin û ji heman êlê ne ango êla Bîya.

Derdora gund hemû bi kevirê reş in ku ew cureya herî baş e ji keviran û hemû xanîyên gund bi van keviran hatine avakirin.

Li alîyê başûr (Gelîyê Heskêlê) ye, û (Gelîyê Dêlîv) e. Li rojava (Benê Çirkê) ye, ku ev gelîya carinan di zivistanan de av diherike û dibe lehî her tiştî bi xwe re dibe.

Gundî debara xwe bi çandinîyê dikin, ji darên zêtûn, fêkî, rez û çandina zevîyên zebzeyan. Digel çandinîyê, gundî xwe dispêrin xwedîkirina sewalan ji bizin û mihan, ev jî roleke girîng di jîyana xelkên gund de dilîze.

2 pakrewan ji gund hene ku di xebata Tevgera Rizgarîya Neteweyî de şehîd bûne.

Ji ber ku derdora gund bi daristan û kelem in, hişt ku bibe cihekî guncav ji bo xwedîkirina sewal û mêşan, pirbûna kanîyan bû cihekî baş ji bo jîyan û çandinîyê lewma xelkê gund li vir nîştecih bûn.

Li başûrê gund kanîya (Reş û Osmanîyan) heye bi navê (Qere Pîngar) tê naskirin. Ava (Kanîya Reş) di demên borî de dibirin ta Keleha Horî. Ev kanî ta niha ava wê diherike û xelkên gund baxçeyên xwe jê av didin, her wiha şivan jî pezên xwe li derdorê dimexelînin û av didin. Kanîyek bi navê (Kanîya Mala) di nav gund de heye û gundî ava vexwerinê jê peyda dikin û dar û zevîyên xwe jî av didin. Li paş gund ango li bakur (Kanîya Gelî) an (Kanîya Kuçê) û (Kanîya Sefkê) hene, şênîyên gund ava herdu kanîyan kom kirine û bi rêya borîyan li hemû malên gund belev kirine. Hêjayî gotinê ye

Gundê Balîya

Şerîf Mihemed– Welîd Bekir

Gundê Balîya berê bi navê (Gawo) dihat naskirin, ji ber ku di gund de ga ji bo çandinîyê dihatin bikaranîn.

Gundê Balîya girêdayî navçeya Bilbilê ya kantona Efrînê ye, nazî 5 km li bakurê Bilbilê dikeve.

Gundê Balîya di koka çîyayê (Gir) ji alîyê rojava de ye û ew çîyayekî bi kelem û kevirên reş e. Çîyayê (Gir) ji zîyaratgeha (Şêx Hemzê) dest pê dike di navbera gundên Elîkera û Ze'rê de û ta Balîya bi dawî dibe.û li ser (Gir) qeştelek (Kanî) heye.

Bilindahîya çîyayê Gir (1269 m) ji rûyê deryayê ve. Tê gotin ku mîr û padîşahên (keleha Xorî) havîna xwe li ser çîyayê (Gir) derbas dikirin, ji ber ku ew dever gelekî hênik bû.

Balîya wateya wê (Hinguv) e. Di demên borî de, gund bi xwedîkirina mêşên hinguv navdar bû. Gundê Balîya berê bi navê (Gawo) dihat naskirin, ji ber ku di gund de ga ji bo çandinîyê dihatin bikaranîn.

Di gundê Balîya de 6 malbat hene:

Malbata Heso, Xelo, Horo, Beko, Şe'bo û malbata Balîkê ne.

Gundek nêzî 1 km li başûrê Balîya, bi navê Balîya Jêrîn ango gundê (Elkê)

zimanekî ji wêjeya zimanekî din çêtir tune ye. Dema berhemeke wêjeyî di zimanekî de tê rexnekirin, ew berhem ne li gor ku bi çi zimanî yan bi zimanê kîjan welatî hatîye nivîsîn rexne dibe, ew berhem li gor ku bi çi şêweyî, çi tê de heye û çi dibêje, tê rexnekirin û nirxwandin.

3- Piranîya nivîskarên Kurd di xwe re nabînin ku hev bibînin û pêwendîyê bi hev re bikin, nemaze nivîskarên çîrokê, çire mehrecanan an hefteyên çandewerî û wêjeyî yan komên nivîskaran bi hev re çêbikin ji hev naxwazin?!

Nivîsîn û wêje bi hevdîtin û têkilîyên bi hev re li pêş dikeve. Me li ku derê bihîstîye yan dîtîye ku nivîskarekî navdar bi tena xwe rê vekirîye û gihaye asteke bilind?! Heger rexne, têkilî û pêwendî bi hêza afirandinê ya li ba wî re nebibûna alîkar, ma ew nivîskar dê li wê asta bilind bibûya?!

Çîrok û ziman :

Ziman ne di rêya ferhangan re tê parastin, ne jî bi daxwazîya komgehên zimanwerî yan bi hêvîya di dilê dilxwazan de ezber dibe. Ziman bi afirandina wêjeyî û bi xwendina wê tê parastin û ezberkirin. Helbete ferheng peyv û wateyan kom dike û rengên wan diparêze, lê ziman di ferhengan de gewdeyekî bêcan û bêliv e ku bi axaftin û danûstandina di navbera kesan de tê parastin. Kurdan ev tişt di pêvajoya xwe ya jîyanî de berê bi kar anîye û zimanê xwe jî bi vî rengî parastîye. Niha çi ji Kurdan tê xwestin an çi ji nivîskarên Kurd tê xwestin? Bi rastî di orta çîrok û zimên de tîkilîyeke girîng heye. Heger ziman di rêya axaftin û danûstandinê re tê parastin û ev di warê devokî de dimîne, wêje jîyaneke nû dide zimên û wî dibe seyrangehan û xwîna wî ji nû ve digerîne ango ew bi can dibe û li nav hevalên xwe yên zimanên din digere û dibe zimanekî zindî.

Di vir de rola çîrokê di wêjeyê de ji bo parastina zimên mezintir û hêztir e. Çîrok berî beşên din ên nivîsînê bi zimên re dibe alîkar. Heger pozê helbestê ji ber ku bi zimanekî bilind deng dike û pir caran ji jor de jî dipeyive bilindtir e, lê sînga çîrokê ferehtir e. Ew dikare her peyvê û her wateyê di sînga xwe de veşêre, kedî bike û hevokan li gor ku ew dixwaze yan tê xwestin li hev siwar bike. Karê nivîsînê karekî çifte ye. Dema nivîskarek berhemekê dinivîse, helbet ew hestên xwe bi zimanê ku pê dinivîse li ser rûpelan ronî dike û afirandin bi rengekî zimanwerî di nav wan rûpelan ji hundirê wî diherike. Di vê demê ji alîkî din ve ziman jî bi wan hestên robûyî û wê afirandina ku hatîye herikandin dewlemend dibe û tê vejandin. Ji vir de berî her nivîskarên din, nivîsîkarê çîrokê (çîroknivîs) gava ku bi çîrokên xwe û afirandina xwe mest dibe, ziman jî bi vê afirandinê mest dibe.

Di vir de ez dixwazim li ser rewşa çîrokê di wêjeya kurdî de li Sûrîyê vebêjim. Çîrok di wêjeya kurdî de negihaye asteke bilind û ta niha ji ber gelek sûc û awayan nebûye beşekî wêjeyî da ku serbixwe rêya xwe veke û bibîne. Ew sûc û awa tevî ku bi rewşa gelê kurd ve girêdayî ne ku parçe ye û ji alîyê rijîmên ku gelê kurd di her parçekî de di bin desthilatdarîya wan de dijîn, tê wendakirin. lê tiştên din hene ku bi nivîskaran bi xwe ve girêdayîne ku mirov dikare van tiştan bi sê alîyan ve ku bandora xwe li ser nivîskaran heye girêbide û nivîskar ji wan alîyan ve dibin sûcdarîyê de ne ku gunehê afirandinê radikin :

1- Berê nivîskaran ber bi alîyên din ên ji nivîsînê ve, wek nivîsîna helbestê: Bingeha nivîsînê li ba hindek ji van nivîskaran ne bingeha helbestê ye ango alîyê nivîsînê li ba wan, alîyê çîrokê ye lê ew xwe nas nakin û xwe nabînin lewre di rê de diçin û wenda dibin. Ev jî ji ber pir tiştan tê. Mînak; ji tunebûna rexne û rexnevanan û tunebûna bingeheke çandewerî û wêjeyî di nav deverên kurdî de. Bêguman tiştên ku di helbestê bi xwe de hene, niviskaran ber bi nivisîna helbestê ve dikşînin nemaze di destpêka pêvajoya wan de. Rengê helbestê mirov dixapîne. Ji wî ve ku ristina wê hêsan e û tevna wê pir sivik e, mînak: Kurtîya hevokan, girêdaneke nepêwîst di orta hevokan de, mijarine serbest, hestine bêsînor û pir tiştên din jî veşartî ne. Lê ev bi giştî bi hev re carnan mirov bi alî kortan ve dikşîne û wî tê werdike ku nizane çi dike, çi dibêje û nikare jê jî derkeve.

2- Nivîskarê Kurd xwe bi xwendina zimanê Kurdî û wêjeya vî zimanî, naweştîne. Piranîya nivîskaran ber bi zimanê Erebî ve diçin û pir ji wan bi zimanê Erebî dinivîsin. Ez naxwazim rê li pêş nivîskaran bigirim da bi Erebî nenivîsin, lê ez dixwazim bidim xuyakirin ku hindek kesên bi Erebî dinivîsin mîna ku dixwazin bê ku avjenîyê zanibin, xwe di çem de bişon. Helbet dê ew di wî çemî de binav bibin an dê li kêleka çem bin û bi tirs lingên xwe ta çongan tenê di avê kin û dê newêribin ji pêlan pêş de herin. Nivîskarên ji vî rengî dûrî çand û wêjeya Kurdî dikevin. Bawerîya wan bi wêjeya Kurdî namîne û pêre-pêre nenasî di orta wan û çand û wêjeya Kurdî de çêdibe. Ji alîyekî din ve dikevin bin barê çanda Erebî û ew bar li ser milên wan giran dibe û nikarin di bin de bilivin. Di bawerîya min de ku ev beş ji nivîskaran xwe hindik bi ziman û wêjeya Kurdî biwestîne dê pir berhemên berbiçav ji alîyê wan ve derkevin, baştir e ku xwe pir bi zimanê Erebî biwestîne û tiştek bi wî re dernakeve. Ev beş di xewnekê de ye ku di bawerîya her yekî de ji kesên vî beşî dê bibe nivîskarekî navdar. Di nêrîna wî de tiştên ku wî nivîsandine pir çeleng in û di ser berhemên nivîskaran re ne. Ev beş jî di nezanîyekê de ye. Di nerîna wî de ku cihê wêjeya Kurdî di nav wêjeya cîhanî de tuneye û ne jî dê çêbibe. Ev ne rast e ji ber çi ziman di ser zimanekî din re tune ye û çi wêjeya

Alîyên Afirandinê

Me li ku derê bihîstîye yan dîtîye ku nivîskarekî navdar bi tena xwe rê vekirîye û gihaye asteke bilind?! Heger rexne, têkilî û pêwendî bi hêza afirandinê ya li ba wî re nebibûna alîkar

Reşîd Ebas

Bêguman wêjeya kurdî bi rewşa gel ve girêdayî ye ji ber ku wêje çalakîyek ji çalakîyên mirovan e. Rola mirov di wêjeyê de pêwîst e û ev rol dikeve bin bandora rewşa gel ango pêşketina wêjeyê û paşmayîna wê bi pêşketin û paşmayîna gel ve girêdayî ye. Îcar gelek wekî gelê kurd ji dibistan, cîgehên çandewerî û zanistî parçe,bindest û bêpar ma be, dê rewşa wêjeya wî çawa be?! Bêguman ev pirseke pir derd û ahînan di serê her kurdekî de ku bi rola ziman û wêjeya gelê xwe bawer e, gur dike û pêwîst e di serê her kesekî bi rola wêjeya mirovantî bawermend be jî, gur bike lê ev tişt dibe ku ji dîtina me kurdan dûr be. Îcar dibe em bi xwe li xwe û wêjeya xwe vegerin û em destên xwe deynin ser birîna xwe.

Evêsta Xabûr

Mihemed Welîd

Bûka Efrînê — Evêsta xabûr
Li deşta Cûmê — nêzîkî sînor
Tac da serê xwe — rengê zer û sor
Ket pê Arînê — enî hilda jor

Ber ve tangê çû — ji bin ve teqand
Wêrekîya wê — dilê wan qetand
Dengê jina Kurd — dunya tev hejand
Di ciwanan de — hêzek bi coş çand

Stêrkên bi şewq — qet venamrin
Keçên şoreşger — xweb te nav kirin
Bi sedan hatin — li şûn te girtin
Vî barê giran — tev hildigrin

Te nameya rast — gihand cîhanê
Ji ser zimanan — navê te danê
Ji pê te hatin — ketin dîlanê
Şerê serdemê — gêşt asîmanê

Wek çîyayê Kizwanê her tim şiyar dihêle
Ji dengê Baqî Xido awaza çivîkan
Bi bilûra xwe stranan distirîne
Ji mêtina ava pêxembertîyê û ji çarçiraya dîrokê
Erşa Mihabada Qazî Mihemed dihejîne
Û ber bi Ameda rûmetê û Dihoka rengîn ve diherike
Fermanên Şengala Êzîdxanê vala der tîne
Bê şerm û bê minet çarşema xweyî sor pîroz dike
Bi pêpirk û leylanan rastîya xwe zindî dike
Û her li pey heqîqeta veşartî û nîvçe mayî dikeve
Çavkuja min
Hêlîna çivîkan ji xwe re dike pût û peyker
Pê qad û meydanan dixemlîne
Zayîna ronahîyê bi vêxistina findan
Hestên bidad û firîşteyên xweda
Perîyên bi merd û perperîkên bêguneh
Dixe hembêza xwe wek dergûşekê ji kezeba xwe
Bi sinbila zer, deşta kesk û xwîna sor
Hildide ala xwe li her dever û banî
Perîya dilderya
Stargeh û sîwana azadîya xwe ji xwîna zarokên xwe
û firmêskên çavên xwedawendên xwe diafirîne
Ji ser dihara çîyayên azad tim bi yek qêrîn, hawar û deng e
Tim distirîne awazek bi reng û wisa dilorîne
Ez im dayîka nîştîman, xwedawenda dilan
Ez im rêhevala çîyan, dergeha vînan
Ez im Kurdistana azad, warê şehîd û merdan

Perîya Dilderya

Lîlav Îsa

De bila dîrok pelên xwe vekirî bihêle
Behra dilê min rûpel bi rûpel bixemilîne
Û eşqa dildarê di damarên xwîna min de biherikîne
De bila hestên min her vekirî bimîne û parçe parçeyî nebe welato
Ez ê giyana xwe bi agirê Kawayan bisojînim
Û helbest li pey helbestê rêz bikim bihûnim
Da ku tîna bedena xwe biçekî ziwa bikim
Û bi xwînrijîna pênûsa xwe sosreta evîna xwe pêk bînim
Rûpelek tî û pelek birçî, kevirek winda û helbestek vala, peyalek şikestî û mermîyek teqandî
Nema zindî dibin li gel evîndara bê sînor
Kevoka min azad û serfiraz e
Bi bişirîn û rûken e, dilderya û dilgeş e
Bi germahîya ahenga perweran
Sirûda ey reqîb lê dide û pê dîlana aştîya xwe digerîne
Nemrûdên nerindîyê vala der tîne
Rihê xwe bi çavzeytûnîya xwe şad dike
Gurzek gul û şûşeyek xwîn bi ser de diweşîne
Ev perî tûtina çixareya xwe ranawestîne

Ey xêvzana kewdenî
Rewş bi êş û keder e

Tê çibikî ku kavişk
Va ew jî bi huner e

Heya mişkê kêm livik
Bi wersel û zîper e

Otesîya dîzeyê
Gasin bire ji xwe re

Ew gavîna gefdanê
Ne ronî û fener e

Fêdarîya navxweyî
Ne dozekî perwer e

Nezok tucara nazin
Lê her çaxî azwer e

Ji xêvzanê deng nehat
Zor ji me re dilber e

Omîda perîzadê
Serfirazî ji me re.

Xêvzan

Xalid Qasim

Ey xêvzana perîzad
Vesîn bo min sîber e

Ne xwîder im bûme wîl
Xamûşa min bê ber e

Çi arîşen bo arkan
Bangeşîyek zanger e

Perûkirina helem
Wek perçowek li ser e

Heyte nîne bo hêrsê
Wek heynoş û hilper e

Lagir ketin kaxa me
Lehorê wan pêker e

Radeştîbûn ev qiral
Xwerişt ew ma xweser e

Homanîya bê palav
Hawîş e ne mehder e

bejna wê ya zirav e. Bejneke zirav li ser e ku bayekî kur rabe wê bi xwe re bibe. Du bişkokên kirasê wê jê ketine, ya jor bi derzîyeke qapaxlî ya zengarî girtîye û ya din jî vekirî maye. Pîrê xwe di ser zibalê de daqûl kiribû, pêsîra wê ya rastê dixewînî, çilmisîye wek mewîjeke ku sê çar sal di ser re derbas bûbin be, merî zane vê jinê çend keç çend kur mêjandine, ew kirine kevanî û malxoyên malan. Pîrê serê xwe rakir ku ez dîtim û di ber xwe de got: - tiz/bîya min wenda bûye, ez lê digerim.

Sorbûna gupên wê di paş wan qermîçokan de xwe veşartibûn. Ez ketim ziqaqeke din, kes tê de tune bû, tenê ez û zinginîya ku min ji ziqaqa berîya wê girtî di serê min de hebû. Min pêlava xwe nû kirî bû, ji min re pir bi qîmet bû, lê ji ber taxa me tev ziqûm e celb e, min çi qas kir ku celb nebe, ilim çîlkekê xwe gihandê û ji min re sola min pîroz kir. Ez ketim taxekê hilma xwedîyên gerefêtan jê dihat, min dît li ber dîwarekî nûlêkirî heya çar qatan bodleyek sekinîye ji xwe re distrê ye, strana Hisênê Farê Têlî û strana Baqî Xido Bêaro Dilo kirine nav hev, kirîye şorbe û dibêjeye, bi xwe re jî pozê xwe diqoqilîne û lîkê bi dîwêr didê ye, lîka wî reş bûye merî zane wî vê zivistana sar li ber borîyên sobeyên îsê çedikin derve xwe germ kirîye.

Ez ji wê kolanê derketim û ji vê kolanê derketim, min çi dît û çi nedît min ji xwe re kire xem û ez meşîyam heya nigên min di solan de nimîyan û pîr bûn. Min xwe di nava erdekê de dît, ez êdî ji nav bajêr derketibûm, erdê zîl dabû, li ser herîya sor xunavine siq hebûn. Min pişta xwe da wê dara ku 99 paçik û ben pê ve girê dabûn û turê xwe yê tijî ew derdên min di rê de berhev kiribûn danî kêleka xwe, min li pişt xwe li alîyê bakur nihêrî dîwarekî dirêj lê kiribûn şûna têlan, min devê tûrê xwe vekir û xemeke din tevî kesereke dirêj lê zêde kir, tûrê min tijî bû dikir biqetîya, min serê xwe rakir li alîyê başûr nihêrî li wî bajarê ku niha min jê parsa derdan kirî, li bajarekî wekî kirasê wê pîrê pînekirî, min li qermîçokên wê li pişta wê ya xûz, li çavên wê yên ji girî û bendewarîyê westîyayî, li lêvên wê yên sar, kûr kûr nihêrî.

Devê tûrê min vekirî bû, minê yeke din lê zêde bikira lê cih nema bû, min devê tûr girt û berda girî heya ji min tê ez girîyam, min ji her çar alîyên xwe re heya heft bavan, xeberên qerîşan dan û hîskehîskek bi min ket girîyê kûçikan bû ji kezeba min derdiket. Ez têr girîyam qustika paçê min ji berîka xwe derxistibû şil û pil bibû ji hêsran, min lê nihêrî û li çîlpa celba li ser sola xwe nihêrî êdî girîyê min rawestîya, min bi hêsrên xwe sola xwe pak kir, min hêza xwe kir û ez rabûm ser xwe û min tûrê xwe bi çimelekî darê ve daliqand, min deşe dara mirazan kir, ez careke din ketim nav celb û cenaqê, min da ser rê û ez meşîyam.

Dara Mirazan

Zîlan Hemo

min devê tûrê xwe vekir û xemeke din tevî keser-eke dirêj lê zêde kir, tûrê min tijî bû dikir biqetîya..

Derîyê hewşê dikira ser hişê xwe biçûya, qasî min ew ceht li peyî xwe girt, minê kerba dilê xwe lê honik bikira, lê vê şefeqa sibê ku zikmezinê cîranê me rabe wê ew kerba dilê xwe ji dû jina xwe ya porgijik tev di serê min re derxe. Negerek e, bila dil tijî kerb û qehr bibe heya rojekê bi serê kesî de biteqe, serê min jî bi xwe re bibe.

Di serê ziqaqê de kûçikekî bi dîregekî de dimîşt, ez hîna bi xwe re dibêjim ji bilî kûçikan kî wê vê sibehê li ziqaqan be?! Min dengê xişxişa tûrikekî ji ziqaqa teng a ku ez nû ketimê bihîşt, min got an kûçik e yan jî pisîk e, ser zibalê ji xwe re heştîyan dikuje, lê bavo va çi ye?! Derket ên halê xwe ji halê min xerabtir hebûn. Min dît pîreke porspî, diranzer, çavqehweyî, lêvterikî, deştşixitî, kirasekî belekoşkî pînepîneyî gemaroşkî li

biçin bi wan re bi gogê bilîzin.

Rindê dît ku zarokan pir meraq kirine bi gogê bilîzin. Wê li heyamê nêhirî û dema dît ku heyam xweş e û roj hilatîye, wê rêdan da wan û ji wan re got: Biçin tev zarokan bilîzin.

Herdu zarok çûn li kolanê bilîzin. Rindê jî, pincarên ku duh ji çolê berhev kiribû hûr dikir, di ber hûrkirina pincarê re kêr li tilîya wê ya mezin ket û ew hate birrîn. Bi vê birînê re dilê Rindê pir lê da mîna ku ew dixweze hişyarîyekê bide wê, lê wê nizanî ku ew dixweze çi jê re bibêje. Ji dest nehêminîya dil, wê hûrkirina pincarê rawestand. Rabû ser xwe û ber bi derîyê malê ve çû. Derî vekir da ku li zarokên xwe temaşe bike. Wê dît ku li pêş mala cîranên wan deh zarok kom bûne û ew yarîgehekê ji xwe re çêdikin da ku tê de bi gogê bilîzin. Dema yarîgeh amade kirin. Êdî dest bi dîyarkirina herdu tîman kirin. Kurê wê yê mezin kete nav tîmekê û yê piçûk kete nav tîma din. Ango tîmên herdu birayan li dijberî hev bûn.

Bi dîyarkirina tîman re dest bi lîstinê kirin. Destpêkê tîma mezin xwest ku gog li ba wan be û ew lîstinê dest pê bikin. Herweha tîma piçûk jî xwest gog li ba wan be û ew lîstinê dest pê bikin. Di nav vê nelihevkirinê de gog di navbera herdu tîman de sêwî mabû. Wê nizanî ku kîjan tîm wê despêkê pê bilîze. Dema Rindê dît ku ji dest nelihevkirinê dê lîstina wan berî dest pê bike têk biçe, wê derî girt û ber bi wan zarokan ve çû da ku herdu tîman li hev bîne, ji bo dest bi lîstina xwe bikin. Rindê hîn çend gav navêtibûn ji nişkav ve dengekî mîna birqan bi ezmên ket. Li pêş çavên Rindê bû toz û telaz û li ser erdê kete xwarê. Mîna koran di nav wê tozê de rabû ser xwe û meşî, li tiştekî likumî û kete erdê

Rindê bi destê xwe ew tiştê lê velikumî peland û kire nav destê xwe. Ew tişt gilover bû. Wê di dilê xwe de got: Ev goga zarokan e. Helbet wan li hev nekir lewma gog avêtin vir. Wê gog rakir û rabû ser xwe hingê toz vekişî û wê dît ku tiştê di destê wê de ne gog e, lê serê kurê wê yê piçûk e. Ji dil de wê qîr kir û serê zarokê xwe hembêz kir. Mirov giş li cihê teqînê kom bûn û perçeyên laşên zarokan berhev kirin. Jineke ku li nêz Rindê bû wê bangî Rindê kir û got: Rindê were binêre lawê te yê mezin di nav xwîna xwe de maye.

Weke dînên ku hişê wan ne li serê wan e. Wê serê kurê xwe yê piçûk kire hembêza xwe û berve lawê xwe yê mezin ve xuşî. Laşê lawê xwe yê mezin bi destekî hembêz kir û di destê din de serê lawê xwe yê piçûk hembêz kir. Dagirî û li ser herduyan lorand û got:

Razin Xwedayên min razin
Xewên şêrîn bibînin
Lîstokên xweş li buhiştê bi bavê xwe re bilîzin
Li pey xwe dîya xwe mehêlin
Razin Xwedayên min razin
Min bi tenê mehêlin
Werin dîya xwe jî bi xwe re bibin

Rindê qêrînek bilind ji gewrîya xwe berda û bi ser laşên zarokên xwe de ket û nema livî.

Zarokatî Jîyan e Jîyanê Mekujin

Hind Ebdelo

Xweda heger şad dibe kenê xwe di rûyê zarokan re dîyar dike. Lê heger ew xemgîn dibe rondikên xwe di çavên zarokan re dibarîne.

Xweda û zarok yek in. Kesê ku zarokan dikuje ew xwedayê xwe jî dikuje. Kesê ku zarokan diparêze ew xwedayê xwe jî diparêze. Xweda heger şad dibe kenê xwe di rûyê zarokan re dîyar dike. Lê heger ew xemgîn dibe rondikên xwe di çavên zarokan re dibarîne. Xweda û zarok hevcêwî ne lewma divê ew jî bi pîrozîya Xweda bin. Rindê hertim ev gotin li pêş herdu zarokên xwe digotin. Tevî ku herdu zarokan pir ji gotinên wê tênedigihîştin, lê ew şad dibûn dema ku didîtin dîya wan bi van gotinan şad dibe. Rêdûr hevjînê Rindê, şervan bû, di Berxwedana Serdemê de jîyana xwe ji desŧ dabû. Piştî dagirkirina Efrînê. Rindê herdu zarokên xwe rakirin û berê xwe da herêma Şahbayê û li gundê Tilrifetê bi cih bû .

Rojekê ji rojên koçberîyê kurê Rindê yê dehsalî hat rêdan jê xweŧ û got: Dayê zarok li kolanê dilîzin, bihêle ku ez û birayê xwe yê piçûk jî

xwe bigere. Lê Dîyar cemidîbû. Dayê ew bire hundir û li ber sobê danî û got: Ka kurê min tu cemidî ye xwe germ bike, berxê min ez ê herim bangî bavê te bikim, bila ew jî bê û te bibîne.

Dîyar bi dengekî nizim got: Na dayê, dev jê berde.Vê şevê bila ew razayî be. Ka ez hinekî te bibînim, ez jî westîya me, bila bimîne sibehê. Ji xwe zêde dema min nîne.

-Kurê min, çima dema te nîne? ma tu yê bi ku derê ve herî?

-Dayê, ez ê herim cihê ku ez jê hatime, tu dizanî hîna li ser welatê me êrîş hene. Ma dibe ez hevalên xwe bi tenê bihêlim û bêm li malê rûnim? Lê hêvîya xwe qut neke, ez ê dem bi dem werim û te bibînim.

- Kurê min ev du sal in çavê min li devê rîya te bû, her kesî got şehîd ketîye, lê min qet bawer nekir, her min dizanîbû ku tu li cihekî asê ma ye û tu yê rojekê vegerî, niha jî tu dibêjî ez ê herim, neçe kurê min bes e êdî li ba dîya xwe be.

-Dayê tu çawa tiştek wiha ji min dixwazî, ez dizanim bê te çiqase êş kişand lê jibîr neke ku ev êş ne tenê ya te ye. Gelek hevalên weke min hene ew jî delalê ber dilên dayik û bavên xwe ne. Lê ez nekim yê din neke wê çawa welatê me bê parastin. Bila êşa te ji bo te bibe hêz dayê û serê te bi min bilind be.

-Kurê min serê min her bilind bû ji ber te, lê ez jî bêrîya te dikim û bi hesreta te dijîm, ger tu dîsa biçî jî zêde dûr nekeve hema bera carê ez te bibînim.

-Xeman mexwe dayê, kîjan kêlîya tu bixwazî ez ê bêm gel te. Tenê bila hêvîya te herdem hebe ku em ê hevdu bibînin.

Xecê kesereke kûr kişand û bi destê kurê xwe girt, dît ku hîn destê wî wek bûzê cemidî ye.

-Wey mala min şewitî kurê min tu diber sobê de yî jî, lê hîn destên te cemidî ne ka ez rabim nivînên te deynim ji bo ku tu di nav wan de germ bibî.

Xecê nivînên xwe û dîyar danî ber hev û heya sibehê ew danî ber hembêza xwe.

Xelîl bi dengê zîla saetê ji xewê şîyar bû, li saetê nêrî. 6'ê sibehê bû. Li derdora xwe nêrî, dît ku Xecê ne li hundir e. Fêm kir ku Xecê li odeya din raza ye. Çû çay danî ser ocaxê û çû odeya ku Xecê lê raza bû. Dît ku Xecê vedayî ye û wêneya Dîyar xistîye hembêza xwe û wiha ketîye xewê.

Xelîl: Xecê, ka rabe here odeya din, xwe binixumîne û raze.Tu wisa li vir di xew de çûyî, tu yê bicemidî.

Xecê ji cihê xwe çeng bû û matmayî li Xelîl mêze kir.

-Te Dîyar dît?

Xelîl bi rûyekî şaşmayî lê mêzand û got: Xecê, tu li ser hişê xwe yî?

Xecê li wêneya di destê xwe de nêrî û li rûyê Xelîl mêzand û got: Tiştekî nebêje, bihêle ku ez bawer bikim ku ew rastîbû. Dîyarê min sax e, ew li cihekî pîroz e û carcarn ew ê bibe mêvanê şevên min. Şevên min vê hêvîyê dê hembêz bike.

jand Xelîl tenê xwe dilivand û digot bisekine xewa min tê.

-Kuro, ka rabe hinek li derîyê me dixin.

-Kî ye li derîyê me dixe,Kî ye?

-Ya rebî, tu ji xwe re bala xwe bidê, kuro ma ez ji ku dizanim kî lê dixe. Ka rabe derî veke ku em bizanibin kî li dêrî dide.

- Ma çawa bû?Kî di vê saeta şevê de hatîye ber derîyê me. Ma ew dîn bûye yê ku di vê hewayê de ji mala xwe derkeve. Keçê dibe dengê ba be, ne mumkine kes di vê saetê û vê hewayê de li derî bixîne.

Xecê bi hêrs got: Ka hela, tu bala xwe bidê. Bêje ji min nayê ez rabim, ji xwe tu çavgirtî bi min re dipeyivî.

Dema Xecê ev gotin kir, deng ji Xelîl nehat, xewê ew zevt kiribû û lê giran bibû.

Xecê rabû û di ber xwe de got: Emrê min ji xwedê re, ma ez çibikim, ka ez ê derî vekim.

Xecê berîya ku derkeve hewşê kêlîyekê dudulî jîya. Gelo dibe ku birastî jî ew dengê ba be.

Xwe bi kurkê Xelîl ê bi hêwanê ve daliqandî nixumand û derkete hewşê. Ba nefesa mirov diçikand. Li alîyê serxetê berf hatibû, ji ber wê bayê ku ji wir dihate binxetê sermaya berfê bi xwe re dianî. Xecê tucarî sermayeke wisa zuha û hişk li Amûdê nedîtibû. Tê bê qey tu kes di vî bajarî de tunebû, ji dengê mirovan xalî bû, tenê dengên xwezayê mîna ku bi hev re ketibin cengê, dihate bihîstin. Reşahîya şevê saweke cuda li ser mirov çêdikir, dengê ba jî hestekî cuda dixiste dilê mirov.

Xecê tewekula xwe avête ser xweda û çû ber derîyê hewşê, hinekî guhdar kir. Piştî kêlîyekê ma, careke din derî bi lez lê ket. Xecê di ber xwe de got: Ya rebî tu me bistirîne. Ba çiraya di destê wê de vemirand û her der tarî bû.

Vê tarîtiyê tirsa di nava dilê Xecê de mezintir kir. Lê çibike, gihiştibû ber derîyê hewşê. Vê carê ji kêlekên derîyê hewşê ve ronahîyek xuya dikir, Xecê destê xwe avêt mifteya derî û bi sê dengan ser hev bankir: Ew kî ye? Lê bersiv nehat. Xecê vê carê bi dengekî hêl, qîr kir û got: Ew kî ye li pişt derî?

Dengeke westîyayî û ciwan bersiv da: Ez im, ez.

Xecê matmayî ma û di cihê xwe de cemidî. Ev deng jê re nas dihat, dengekî ku du sal bû ji guhên wê qut bibû, lê di hundirê xwe de her dibihîst. Dengekî ku ji bo Xecê bibû hesret.

Xecê derî vekir. Nedizanîbû bawer bike yan na. Piştî kêlîyekê ku wiha ma, bi dengekî kelogirî qîr kir 'Dîyar' û xwe avête hembêza wî. Du sal berê xebera şehadeta Dîyar bihîstibû, lê qet û qet bawer nedikir, ji xwe re gotibû heya cenazeyê wî nebînim, heya rûyê wî carekê neramûsim û bi destên xwe axê neavêjim ser tirba wî, ez destê xwe jê naşom. Û her çavên wê li benda vegera Dîyar, kurê wê yê delal bû.

Dîyar û dîya xwe çend xulekan hevdu hembêz kirin, Dê digrîya û kur jî ew haş dikir. Xecê bi sermayê bi tundîya ba nedihesîya, bedena wê bibû agir û pêl bi pêl dixwest li dora kurê

■ **Tabloya (Tolîn Omer)**

xwe ya xem û hêvîyan de asê bibû û wer melûl melûl li çira, saet û derîyê hewşê dinêrî. Ger ew deng nehatibaya dê ev rewş heya berbanga sibehê bidomaya, lê bi carekê dengê derî hat. Hişk û ser hev li derî dixistin. Xecê ji xeyalên xwe veciniqî, ji cihê xwe pekîya, li derdora xwe nêrî, destê xwe dirêjî çirayê kir û çû odeya ku Xelîl lê razabû.

Xecê: Xelîl, kuro Xelîl ka rabe hinek li derî dixin.

Te digot qey Xelîl bi salan ranezabû, wer ketibû xeweke kûr û haya wî ji bayê felekê tinebû. Xelîl ji siharê heya derengî şevê li kar bû û dema dihate malê jî ji hereket diket. Zûbizû ranediza lê dema radiza jî xew lê giran dibû. Jixwe bi cilên xwe yên kar razabû. Êdî ji karê zêde nema xweşik rûyê xecê, ne jî yê her çar zarokên xwe didît. Xecê gelek caran xwe bi ser de aciz dikir jî, lê wî dizanîbû çawa wê nerim bike û li ber dilê wê bigere. Xecê zû aciz dibû û difûrîya, lê tiştek di dilê wê de tunebû. Di heman kêlîyê de Xelîl bi henekan ew dikenand û kêfa wê xweş dikir.

Xecê ji milekî ve bangî Xelîl dikir, ji milê din ve dilê wê nedigirt wî ji xewa şirîn şîyar bike. Lê dîsa jî neçar bû gazî wî bike. Ji ber şev bû, herdu keçên wê yên piçûk û her du kurên wê jî di xew de bûn. Şev dereng bû, saet didu bû. Xecê dîsa bi çend dengan bangî Xelîl kir, lê valabû. Xecê neçar ma ku wî bihejîne, bes çiqas ew dihe-

Hêvîya Di Hembêza Şevekê De

bihêle ku ez bawer bikim ku ew rastîbû. Dîyarê min sax e, ew li cihekî pîroz e û carcarn ew ê bibe mêvanê şevên min..

Zinarîn Dîyar

Di şeveke zivistanê de ku ewrên reş xwe li ezman pêçabûn, bayekî cemidî weke kêrê rûyê mirov dibirî, lewma herkesî ji tirsan xwe di malên xwe de kilîd kiribû. Xecê li ber sobeyê rûniştibû û çavên wê li ser agirê çiraya ku hundirê malê ronî dikir, zîq mabû. Her kêlîyê li saeta bi dîwarê malê ve daliqandî dinêrî, kesereke kûr dikişand û dîsa awirên xwe vedigerand ser çirayê. Xewa şevan lê heram bibû, te digot qey saet dijimart ji bo lê bibe sihar. Carcaran di şibakeyê re jî li derîyê hewşê dinerî, weke ku li hêvîya kesekî/ê be. Ji rûyê wê dîyar bû ew li benda mizgînîyekê ye ku dilê wê yê şikestî û xembar şad bike. Xecê nîyetek xistîye dilê xwe de û hêvî dike pêk were.

Ji dengê bablîsoka di hundirê wê de lîlan vedida, dengê bayê derve ku li şibakê dixist nedibihîst. Di cîhana

Ji filmên Sînemaya Sêyem:

Gelek film weke filmên Sînemaya Sêyem tên naskirin, hin ji wan di aşta navneteweyî de bi serketin, hin ji wan jî nekarîn ku beşdarî mihrîcanên navneteweyî bibin. Li vir jî, em hin xebatên ku weke filmên Sînemaya Sêyem tên naskirin, bi bîr tînin:

"Cenga Cezairê" (1966) ya **Gillo Pontecorvo**

"Piştî Îro Tirs Nîne" (2011) ya **Murad Bin Şêx**

"Keştîya Şer Potemkin" (1925) ya **Sergei Eisenştein**

"Weke Her Tiştekî Din" (1968) ya **Jean-Luc Godard**

"Bûyerên Salên Şoreşê" (1975) ya **Mihemed Lexitir Hemîne**

"Çirûsk" (1996) ya Ingrid Sanklar

"Stasyona Qahîrayê" (1958) ya **Yûsif Şahîn**

"Mal Û Cîhan" (1984) ya **Sanjib Rai**

"Buhişt A Niha" (2005) ya **Hanî Ebû Es'ed**

"Avahîya E'qûbîyan" (2006) ya **Merwan Hamid**

"Du'aya Kerewan" (1059) ya **Hênrî Berekat**

"Dewata Celîlê" (1987) ya **Mîşêl Xelîfê**

Afrîka, berê û niha jî piştî Amerîkaya Latînî navenda herî xurt ya Sînemaya Sêyem e. Derhênerên van filman rikberî bi filmên rêûresmên berê re dikirin, weke **Yûsif Şahîn** li Misirê, **Mirzaq Elwaş** li Cizairê, **Gaston Kabore** li Bûrkîna Fasoyê, **Silêman Sîsî** li Malîyê, **Jean-Marie Tino** li Kamîronê.

Li Asyayê jî derherênên ku rewşa civakî guhertin ev bûn: **Lino Broca** li Filipînê, **Mernal Sen** li Hindistanê, **Tran Anh Hang** li Vêtnamê, **Wang Ping** li Çînê.

Rihê Sînemaya Sêyem her wiha li Îranê bi **Dariush Mehrjui**, li Brîtanyayê bi **Isaac Julian** û li Awistralyayê bi **Tracy Moffat** re derket holê.

Ousmane Sembène jî ji Sînîgalê ye û ji derhênerên herî navdar li Afrîkayê ye, jîyana xwe weke nivîskarekî ji bo guhertina civakê dest pê kir û ji bo bigihêje beşeke mezintir ji Afrîkîyan û tevahî cîhanê, xwe ji nivîsandinê veguhest sînemayê. Zemet e ku filmeke tenê ji filmên **Sembène** were hilbijartin, ji bo hemû filmên wî ji filmên Sînemaya Sêyem in. Sembène di filmên xwe de mijarên civakî yên balkêş nîqaş dikir, mîna mêtingerî, ol, hêza jinên Afrîkî û rexnekirina burciwazîyetê. Wî derhênerîya filmên girîng kirin, mîna "Keçikek Reş" (1966) "Moolaadé" (2004) û gelek ên din, ev film jî hiştin ku bi nasnavê "Bavê Gîyanî" yê sînemaya Afrîkî were nasîn.



werger

Belgefilm behsa herêma Zfar a Umanê dike, ku di sala 1965'an de li wir şoreşek çêbû û şerekî ne normal li dijî sultanê Umanê **Se'îd Bin Teymûr** hebû û heya dema sultan **Qabûs** jî berdewam kir, ku **Qabûs** bixwe bi alîkarîya istixbaratên Brîtanyayê darbeyeke leşkerî li hember bavê xwe **Teymûr** pêk anî. Belgefilm pir balkêş û hêja ye, ku behsa şoreşeke jibîrkirî dike, jin roleke sereke tê de lîstibû. Di belgefilmê de dîmenên şer hene û hevdîtin bi şoreşgeran re tê kirin û îdeolojîya wan ya şoreşgerî tê naskirin, bi taybetî jî jin, ku şoreş ji bo wan rêya azadîyê bû, berîya ku piştî pênc salan ji desthilatdarîya sultan **Qabûs** bi temamî were têkbirin.

Sînemaya Sêyem di dema niha de:

Taybetîyên sereke yên Sînemaya Sêyem, hertim nûnertîya welatê derhêner yan welatê ku li wir film hatîye çêkirin nake, lê nûnertîya îdeolojîya ku di filmê de derdikeve, dike. Em ji rastîyê jî dûr naçin dema em bêjin ku Sînemaya Sêyem sînemaya cîhana sêyemîn e, tevî ku ev tişt di manîfestoyê de nehatîye gotin, ev cîhana ku li hember emperyalîst û binpêkirinên bi hemû cûreyan disekine, wiha jî sînema dibe amûreke girîng ji bo belgekirina rastîya civakî. Tevgerên sîyasî û çandî yên di dehsalên heştî, notî û hezarsala nû de, li ser pêwîstîya ji nû ve nirxandina têgehan û pêşxistina daneyên kevin, destnîşankirin. Pirsgirêkên nû, mîna nasnameya hemwelatîyê û çandê bi pêş ket, wate û têgehên nû jî lê hatine barkirin, niha jî bûye şêweyek ji şêweyên têkoşîna civakî. Pêwîst e Sînemeya Sêyem a ku bûye somboleke fermî di cîhana sînemayê de, îro xwe ji nû ve ber çavan re derbas bike û xwe binirxîne, bêyî ku rastîya xwe ya li dijî sînemaya belavbûyî winda bike. Tevî guhertinên li dinyayê, lê heya roja îro jî pêwîstî bi sînemaya şoreşgerî heye. Sînemaya Sêyem, hê jî dîyardeyeke cîhanî ye, ku pirsgirêkan çareser dike, mîna pirsgirêkên neteweyan, şkandina hêvîyan piştî mêtingerîya leşkerî û çandî û derketina şêweyên nû ji binpêkirinên olî, civakî û zayendî.

Guzman bi tîmeke piçûk re li ser çend mehan dîmenên xwepêşandanên sîyasî û civakî kişandin, ev xwepêşandanên ku rê ji darbeya leşkerî ya bixwîn a di 11'ê îlona sala 1973'an de vekir.

Parçeyê yekem yê belgefilmê "Raperîna Burciwazîyetê" (1975), behsa hilbijaritinên parlamanê ya di adara sala 1973'an de dike, di wê demê de hikûmeta **Allende** bernameyek ji bo veguhertinên mezin ên civakî û sîyasî derxist, lê rastgiran di roja yekem de ev bername red kir, ew jî bi rêya xwepêşandanan û derxistina tevlîhevîyê ku ji alîyê Amerîkayê ve bi rêya ambargoyeke aborî piştgirî didîtin. Bi tewaneke destûrî û bi piranîya dengên muxalefetê jî serokkomar ji erkê xwe hate avêtin û sînorek ji hikûmetê re hat dayîn. Parçeyê yekem yê filmê ji gelek hevdîtinên ku derhêner bi namzetan re pêk anî, pêk tê û film bi vê tiştê dest pê dike ji bo têgihaştina hestîyarîya wan û veguhestina wê ji temaşekeran re, her wiha ji bo rastîya wê demê were naskirin.

Di parçeya duyan de "Darbe", derhêner tiştên ku di adar û îlona sala 1973'an de rûdayî derdixe pêş, di nav de şerên di navbera rastgir û çepgiran de yên li kolan, cihên kar, kargeh û dadgehan, heta li parlamanê jî ku serokomar hewil da ku bigihêje lihevkirinekê bi Partîya Demokratîk ya Xiristîyanî re, lê bi bin ket. Û behsa çawayîna amadekarîya artêşê li herêma Valparaiso dike ku plana darbeyekê bi piştgirîyeke mezin ji alîyê çîna navîn re dikir, di encamê de atmosfereke ji şerê birakujîyê li welêt afirî.

Parçeyê sêyem ji belgefilmê "Desthilatdarîya Gelêrî", li vir tê xuyakirin ku çawa gel di navbera salên 1972-1973'an de plan kir ku dest bi avakirina hêzeke gelêrî bike, ew jî bi rêya kombûnên kedkarî û pîşesazî û komîteyên gundewarî ji bo sînorek ji kirîza aborî û tevlîhevîyê re were danîn yan bandora wê ji şerê heyî re were sekinandin. Di vê parçeyê de xwîya dike ku çawa gel piştgirîya hikûmetê dikir û bi hemû hêza xwe şer dikir ji bo **Allende** biparêze û ketina hikûmeta wî dereng bihêle.

Di sala 1997'an de, **Guzman** bi tîmeke biçûk re vegerîya paytexta Şîlî, Santîyago û careke din li kolanan gerîya û vegerîya sînaryoya filmên berê û hewil da kesayetên ku di filmên berê de bibîne ji bo behsa guhertinên ku di welat de çêbûne, bikin. Wiha jî parçeya çaran ya belgefilmê "Şîlî: Bîrdankek Serhişk" hat çêkirin, dehêner di vê parçeyê de li ser ramanên ku bûn sedema bûyerên berîya 20 salan destnîşan dike, û ne tenê vedigere serdama berê, lê bi awayekî kûr jî derbasî dîrokeke ji êşê dibe û birînên ku hîn jî li welat nehatine dermankirin eşkere dike.

"Saeta Rizgarîyê Lêda" – Hênî Sirûr (Libnan):

Dîmenên filmê di sala 1971'ê de hatin kişandin û di sala 1974'an de di pêşbirkeke fermî de "Mehrîcana Can a Sînemayê" hate pêşandan. **Sirûr** yekemîn derhênereke Ereb e ku filma wê di Mehrîcana Can de tê pêşpandan.

werger

civakî di welat de rexne û şermezar dikin û banga têkoşîna çekdarî li dijî biryara radestkirina erdên Arjantînê dikin. Ev belgefilm, weke mifte û bingeha ku li ser wê Sînemaya Sêyem hatîye avakirin, ku li ser sê parçeyan hatîye dabeşkirin, hemû jî di bin yek ramanê de ne, ew jî parastina îdeolojîyên şoşreşgerî ye. Di parçeya yekê de "Mêtingerîya Nû û Tundî", sedmên xirabîyê, koletî, paşketin, rewşa aborî ya xirab û hejarîya civakî ku li Amerîkaya Latînî tê jîyankirin, tê pêşandan.

Di beşa duyem de "Qanûna Rizgarîyê", di vir de bal tê kişandin ser guhdarkirina dengên welatîyên ku pirsgirêk û rewşa welatên xwe nas kirine, û behsa dîroka tevgera Bêronî dike û têkoşîna kedkaran li hember rêjîmên desthilatdar.

Di parçeya sêyem de jî "Tundî û Rizgarî", bi rêya belge û gotinên şervanên dêrîn mîna **Arnêsto Çî Gîvara** jîyana leşkerên Amerîkaya Latînî tê eşkerekirin.

Ev belgefilm li Arjantînê, yek ji sembolên çandî ji rewşa aborî û sîyasî di navbera salên 1945-1968'an de ye, dîmenên vê filmê jî bi dizî ve di dema şerê sar de hatin kişandin, ew jî li Amerîkaya Latînî ku ji alîyê mîlîsên leşkerî ve dihat birêvebirin, ku ew bixwe jî girêdayî Amerîka û dîktatoran bûn. Pir zehmet e ku ev film tenê di çarçoveya sîyasî û civakî di serdama ku tê de hatî çêkirin de were pênasekirin, ji ber ku film weka amûra xebata şoreşgerî di giştî cîhanê de derket holê û film bi taybet li Amerîkaya Latînî di 70 dewletan de hat qedexekirin. Her wiha film, têgîna rizgarîyê di wateya xwe ya kûr û berfireh de derdixe holê. Heya roja îro jî, ev film dibe yek ji girîngitîn filmên ku banga şoreşê dike û tişta **Solanas** li ser gotî, armanca wê bi kurtahî dîyar dike: "Film li ser rizgarîyê ye, li ser qonaxeke ku hê jî di dîroka me de bi dawî nebûye, dibe ku xebatek be bi temamî bi dawî nebûye û ji bo dema niha û pêşeroşa rizgarîyê filmeke vekirî be".

The Battle of Chile "Cenga Şîlî" - Patricio Guzman (Şîlî)

Belgefilmek ji sê parçeyan pêk tê, alozîya sîyasî ya sala 1973'an û şoreşa bixwîn a li dijî hikûmeta **Salvador Allende** ya hilbijartî li Şîlîyê, belge dike.

Alvarez û **Koji Wakanatsu**. Ramana Sînemaya Şoreşgerî hertim di xizmeta gel de bû, kamîre jî li qadên şer, çeper, zanîngeh û kargehan hatin danîn, ne tenê ji bo belgekirina bûyeran, lê ji bo dengek ji wan kesên ku ev demeke dirêj e bê deng in, were bihîstin.

Sînemaya Şoreşgerî, roleke girîng di cîhana Erebî de lîst, bi taybetî li Filistînê piştî ku Israîl ew dagir kir. "Girûpa Sînemaya Filistînî" ku ji çend derhêner û lêkolîvanan pêk tê piştgirya xwe ji Rêxistina Azadîxwaz a Filistînê digirit, ku karên wan jiayana rojane û bûyerên li Filistînê belge bikin, wiha jî kamîre bû amûrek di şerê navbera Ereb û Israîlîyan de û bû rêbazeke girîng di şerê li dijî Israîlê de. Armanca van filman jî ew bû ku rastîya têkoşîna Filistînîyan derxe pêş, ku hertim Israîl bi awayekî rêxistinkirî dixwest wê rastîyê winda bike. Dîmenên di van filman de jî weke parçeyekî ji têkoşîna heyî dihat dîtin, derhênerên mîna **Mustefa Ebû Elî** û **Hanî Cewherîya** filmên xwe, ne ser esasê ku ew hunermendên çêdikran, lê karê xwe weke kesên ku rahiştina çekan û şer dikin, didîtan. Dîmenên filman jî çarenûsa çalakîyên şoreşgerî dîyar dikir û ew beşek ji têkoşîna berdewam bû, kamîre jî mîna çekên şer hate pênasekirin.

Sînemager û filmên herî girîng:

"Tiştek ji tinebûnê çênabe" **Solanas** di manîfestoyê de gotibû, ev jî nîşaneya ku Sînemaya Sêyem ne bi manîfestoyê re dest pê kirîye, lê berîya wê jî hebû, û manîfesto hat ji bo raman û armancên wê bi rêbazekî birêxistinkirî kom bike. Berîya manîfestoyê jî derkeve, gelek film li hemû welatên cîhanê û heta roja me ya îro weke Sînemaya Sêyem tên naskirin, ji wan:

"The Hour of The Furnaces" (1968) - Fernando Solanas û Octavio Getino (Arjantîn)

Ev belgefilma yekem e ya herdu derhênerên Arjantînî **Fernando Solanas** û **Octavio Getino** li ser Arjantînê di salên pêncî û şêstî de. Di vê belgefilma ku 4 saet û 20 deqeyan dirêj dike, herdu derhêner rewşa aborî, çandî û

amûrekê ye ji bo derbirîna kesayetekî dike, napejrîne û dibîne ku derhêner bixwe jî parçeyek ji civakê ye û divê bi rêya filmên xwe banga her kesî bike û rastîyê ji wan re pêşkêş bike û rihê şoreşgerîyê bilind bike. Her wiha divê bi dizî ve film werin pêşandan û xwe dûrî çavdêrî û toreyên bazirganî bikin, temaşeker jî divê di nava metirsî û zehmetîyan de bibîne. Ji ber rastîya civakî, sîyasî û aborî di welatên Amerîkaya Latînî û welatên li parzemînên din de ku li pêşîya binpêkirinên mêtingeran û sîyastên hikûmetan ên ne adil dimînin, dane û teorîyên Sînemaya Sêyem ji dawîya dehsalên şêstî heya dehsalên heftî bi pêş ketin. Filmên Sînemaya Sêyem hewil dida ku şoreşan li dijî newekhevîya çînayetî, nijadî û zeyendî gur bike û pêşî li binpêkirinan were girtin û berpirsyar werin rexnekirin.

Armanc:

Armancên Sînemeya Sêyem bi cûdahîya welatên ku film lê çêbûne, tê guhertin. Lê armancên sereke ji destpêkê heya niha jî weke xwe mane, ji wan:

- Berfirehkirina aso û têgihiştina sîyasî û civakî li cem temaşekeran.
- Çêkirin û belavkirina filman bi awayekî serbixwe, dûrî serwerîya şirketan ku filmên girêdayî wan ber çavdêrîya alîyên hegemon (Ên mêtinger yan hikûmet bixwe be) re derbas dibe.
- Bilindkirina asta hizir û rihê şoreşgerîyê li cem temaşekeran ji bo rewşa xwe ya civakî pêş bixîne.
- Eşkerekirin û teşhîrkirina kes û sedemên dîorkî, civakî, sîyasî û aborî ku ji ber wan milet li gor hin berjewendîyan hatin bikaranîn.
- Êrîş û redkirina filmên rêjîma heyî, ji ber ku tevgera çandê pêş naxîne.

Pêşketina Sînemaya Sêyem (Sînemaya Şoreşgerî):

Weke me gotî, daxuyanîya herdu dernêneran gotara herî navdar e ku tê de prensîbên Sînemaya Sêyem tên destnîşankirin, lê ji ber derketina wê ya zû di sala 1969'an de, tecrubeya sînemaya şoreşgerî nehat destgirtin. Ji bo wê jî, di sala 1971'an de manîfestoyek (Daxuyanîyek) din bi serenavê "Sînemaya Şoreşgerî: Beşek Hundirîn a Sînemaya Sêyem" hate weşandin û tê de bi hûrgilî têgeha Sînemaya Şoreşgerî hate lêkolînkirin. Sînemya Şoreşgerî weke beşeke pêşketî ji Sînemaya Sêyem tê dîtin û yekser bi gurkirina nîqaşê li ser bûyereke sîyasî berî yan piştî yan jî di dema pêkanîna wê de hatîye girêdan, her wiha amûreke ji bo belgekirina tevgerên azadîxwaz ên miletan. Ev tevger parçeyek ji civaka çêkirina filmên şoreşgerî li ser asta cîhanê û di hemû welatan de ye, ku sembolên sînemaya cîhanî têkildarî tecrubeyên hunerî û ramanên nû hevkarîyê bi hev re dikran. Di nava wan de ev derhêner hebûn: **Jean-Luc Godard, Chris Marker, Santiago**

werger

- Sînema ji pêşketinên herî ber biçav di serdemê de ye.
- Sînema, dibe amûra rizgarîya mirov, ku bi rêya wê çanda mêtingerîya derve û hundir a hegemon pûç dike.

Dîrok û navê wê:

Di dehsala pêncîyan a sedsala çûyî de, Amerîkaya Latînî gelek aştengî ji ber berencamên piştî serhildanên mezin dixwar, ku alozîya navbera alîyên îdeolojî weke alîyên kapîtalîzim û sosyalîzim di lotkeya xwe de bû. Di wê demê de jî, têgîna "Cîhana Sêyemîn" derket, ku nîşaneya wan welatên paşketî ne, çi di başûrê parzemîna Amerîkayê de bin, çi li Afrîka û Asyayê bin. Bi derketina tevgerên ku mêtingerîyê red dikin, ku mînaka wê ya herî ber biçav û serkeftî şoreşa Kubî bû, hêdî axaftina ser nasnameya nîştimanî dest pê kir, ku bi rêya wê mêntingerî û hegemonî bi dawî bibe, ne tenê di alîyê sîyasî û leşkerî de, lê di alîyên çandî û civakî de, ku di nav de sînema jî heye.

Filmên ku li Amerîkaya Latînî dihatin pêşandan, dihiştin ku kesên temaşe bikin bi kêmanîyan bihesin û ev film di alîyê perwerdeya civakê de lawaz bûn û ji xwe re sînemaya "Hollywood" wek mînak didîtin. Film li ser lehengên xurt bûn, ku alîyên şerker, ji hêzên tarî yan ji hev bixwe rizgar dikirin. Ev rewşa çandî, **Franz Fanon** di pirtûka xwe "Êşkişînên Erdê" de (sala 1961'an) şîrove dike: "Mêtinger ne tenê dîrokê çêdike, lê belê wê weke destana Odêsayê jî vedibêje". Ramanên **Fanon** paşê dibe bingehek ji derhênerên filman li Amerîkaya Latînî, her wiha **Solanas** û **Getino** di karên xwe de van ramanan ji xwe re bingeh digirin.

Di salên şêstî de, sînemaya Amerîkaya Latînî êdî ji rêûresmên xwe yên berê û rêzba Hollywoodî dûr dikeve, wiha jî xwe di sînemaya cîhanî de bi cih dike. Derhênerên nû yên filman dest bi sînemayeke ku pirsgirêkên civakî yên herî li pêş çareser bike, kirin. Ev veguherîna di sînemayê de hişte ku temaşeker bi awayekî din li filman binêre û ji neyînîya ku li cem wî heyî derkeve, wiha jî ji nû ve ji xebatên çêkirina filman re hat nêrîn.

Di daxuyanîyê de, sê cûreyên sînemayê hatin destnîşankirin, ew jî "Sînemaya Yekê" , "Sînemaya Duyê" û "Sînemaya Sêyê" .

• Sînemaya Yekê: Mînaka wê jî filmên Hollywoodî ne, ku ji bo temaşekeran exlaqên burciwazîyetê weke exlaqên herî baş nîşan dide, ew jî bi rêya dawîyên xweş û karakterên kesane ku tenê armanca wê keyfa temaşekeran bîne.

• Sînemaya Duyê: Ew sînemaya Ewropî ye yan filma hunerî ya Ewropî ye, ku ne weke filmên Hollywoodî ne, ev film derbirîna kesayetî ya derhêner ji xwe re bingeh digire û azadîya derbirîna wî gelekî girîng dibîne.

• Sînemaya Sêyê: Ev sînema, ne ji bo sûda darayî tê çêkirin û rikberîyê bi filmên Hollywoodî re dike û prensîbên şoreşgerî derdixe pêş. Sînemaya Sêyem, gotina ku sînema weke

■ **Ji çepê: Gerardo Vallejo-Fernando Solanas-serokê Arjantînê Juan Domingo Perón-Octavio Getino**

uyanîya ku teorî û îdeolojîyeke nû ji bo sînemayê pêşkêş dike. Daxuyanîya bi serenavê "Ber bi Sînemaya Sêyem ve" bi hevokeke balkêş dest pê dike ku ji gotinên şoreşger, feylesof û civaknas **Franz Fanon** e. Hilbijartina hevoka Fanon a "Divê em nîqaşê bikin, divê em biafirînin..." wateyeke wê ya civakî-şoreşgerî heye, ji ber ku Fanon bi têkoşîna ji bo azadî û li dijî cûdahî û nijadperestîyê tê naskirin, armancên Sînemeya Sêyem jî ji vê serenavê ne dûr e.

Berîya daxuyanîya **Solanas** û **Getino**, herduyan bi derhêner **Gerardo Vallejo** re tevgereke sînemayê bi navê "Girûpa Filêmên Rizgarîyê" li Arjantînê demezirand. Ev tevger jî yekser girêdayî partîya Çepgir a Bêronî bû, bi demê re gelek derhêner jî tevlî tevgerê bûn, li Brazîlê jî tevegereke sînemayê "Sînemaya Novo" derket ku pirsgirêkên civakî mîna nasname, hejarî, bêkarî, gendelî, sûc û paşketinê nîqaş dike. Li Kubayê jî, piştî şoreşê, sînema pêhtir bi tevgerên civakî û sîyasî ve hate girêdan û Sînemaya Sêyem derxist pêş.

Daxuyanîya "Ber bi Sînemaya Sêyem ve" ji gotarên herî naskirî û behsa wê di sînemaya sîyasî û civakî de di dehsalên şêst û heftîyan ên sedsala çûyî de hatîye kirin û dibe baştirîn belge ji "Girûpa Filmên Rizgarîyê" re ku bi awayekî berfireh li welatên bêalî û dewletên cîhana sêyemîn belav bûye, bandora wê li erdîngarîyên nû û pirreng jî belav bû.

Derhêner di daxuyanîya xwe de, prensîbên îdeolojîya xwe ya di sînemayê de destnîşan kirin, ji wan:

- Sînemaya Sêyem, ew sînemaya ku têkoşînê bi hemû cûreyên xwe yên çandî, zanistî û hunerî nas dike.

Ji Amerîkaya Latînî Heya Libnanê
"Sînemaya Sêyem"
Şahidê Şoreşê Ye

Şefiq Tebara
Rojnameya El–Exbar a Libnanî
25'ê Cotmeha 2019'an

Wergera ji Erebî: Hişyar Murad

werger

Sînemaya Sêyem, hê jî dîyardeyeke cîhanî ye, ku pirsgirêkan çareser dike, mîna pirsgirêkên neteweyan, şkandina hêvîyan pişti mêtingerîya leşkerî û çandî û derketina şêweyên nû ji binpêkirinên olî, civakî û zayendî.

"Ez şoreşekê çêdikim, nexwe ez heme", ev gotin herdu derhênerên Arjantînî **Fernando Solanas** û **Octavio Getino** di manîfestoya (Daxuyanîya) ku di sala 1969'an de di kovara "Hersê Parzemîn" de weşandin, nivîsandine. Hevokek di nîvê daxuyanîya şoreşgerî de derbas dibe, dax-

Navê Pirtûkê: Anatolojîya Helbestvanên Nûjen (Helbestvanên Bakur)

Nivîskar: Occo Mahabad

Naverok: Lêkolîn

Ev pirtûk Antolojîya 158 helbestvanên kurdên bakurê Kurdistanê.

Ên tirkan û yên Ewropîyan gelek antolojîyên wan hene. Li Tirkîyê her sal antolojîya helbestan ên salane li dawîya salê dihatin weşandin û ew hêj jî diweşînin. Ev xebata birêz Occo Mahabad dibe destpêka xebata pêkanîna antolojîyên hemû şaxên wêjeya Kurdî.

Hejmara Rûpelan: 600

Weşanxaneya Nayê /2019

Navê Pirtûkê: Yadîgarên Komara Kurdistan a Sala 1946'an 1

Nivîskar: Kakşar Oremar

Naverok: Lêkolîn

Kakşar Oremar salên dirêj e ji bo ronîkirina dîroka Komara Kurdistanê dixebite, gav bi gav dişopîne û bersivên gelek pirsên baldar radestî me dike.

Taybetîyeke kar û xebatên wî yên lêkolînerîyê yek jî ew e, (tiştê ku berî wî ji alîyê gelek nivîskaran ve hatibû paşguhkirin), ew lêgerînên wî yên zindî ne ku li gel wan kesan kirine ku bi xwe di komarê de cih girtine. Bi rêya hevpeyvînên bi wan kesan re gelek tiştên nayên zanîn raberî ber me kirine. Van yekan mirov nikare di tu arşîvan de bibîne.

Hejmara Rûpelan: 648

Weşanxaneya Sîtav /2020

Navê Pirtûkê: **Ax û Welat**
Nivîskar: Şerîf Mihemed- Welîd Bekir
Naverok: Lêkolîn

Gelek rastî hatine windakirin, gelek mafên gelê Kurd hatine binpêkirin û gelek rastî hatine binaxkirin, lewma (Ax û Welat) bersiva van pirsan bû.

Ev pirtûk derbarê (38) gundên herêma Efrinê û (4) gundên herêma kobanê. Li ser dîrok, eşîre, hejmara malan, erdnîgarî, çalakîyên mirovî, navdar û kevneşopîyên xelkên wan gundan.

Hejmara Rûpelan: 226
Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo / 2018



Navê Pirtûkê: **Xwedawendên Bedewîyê**
Nivîskar: Ciwanê Dêrikê
Naverok: Helbest

Di vê dîwanê de helbestvan hema bibêje amaje bi hemû çanda kurdan kirîye û xweştîye hemû hastên dilê xwe di vê dîwanê de bi xwînerên helbesta kurdî re par ve bike. Helbestên cûrbicûr in wekû nimûne li ser dayîkê, li ser jîyana azad, li ser xweşmerîya kurdan a dîrokî bi xetên stûr hatine nivîsîn. Dîsan li ser şoreşa jina kurd û rola wê ya dîrokî ku ji hemû dinyayê re bûye sembola rûmet û serbilindîyê.

Hijmara Rûpelan: 200
Ji Weşanên Desteya Çandê Ya Kantona Cizîrê / 2015



Navê Pirtûkê: **Yekemîn Sînemakarê Bindeştan: Yilmaz Guney .. Jîyanname - Berga Yekemîn**

Nivîskar: Nûser Hozan

Naverok: lêkolîn-Jîyannam)

Di Berga Yekemîn ya vê pirtûkê de serpêhatîya jîyan û hunera Yilmaz Guney, ya ji sala 1937'an heta sala 1970'î digre deşt. Û bi hinek alîyên dîroka Tirkîyê û Kurdistanê ve, bi polîtîkayên dewletê û bi Sînema yeşîlçamê ve girêdide.

Hejmara Rûpelan: 318

Ji weşanên desteya çandê ya herêma Cizîrê-2019

Weşanxaneya Şilêr - Qamişlo

Navê Pirtûkê: **Ber bi Zozanan ve**

Nivîskar: Fehîma Deştan

Naverok: çîrok

Gelek caran pênûs dixwaze xwe li cihên cuda bike mêvan. Da ku karibe êş û elemên heyî tarîf bike û nîşan bide. Nivîsa van bûyeran weke hevokên bixwazin di ezmanê cîhana mirovan de xwe bibask bikin da ku bifirin. Her çîrokek ji van çîrokan wê rewşeke hemwate di cih û mekanên cuda de, yên em jê dûr in yan jî tê de dijîn, xwe bigihînin me. Ev hemû jî ji bo ku ezmûn û tiştên di gelek cihan de diqewimin nîşan bide ne. Dibe ku penûsa ku pê tê nivîsandin ji wê deryaya dewlemendîyan dilopek girtibe yan jî negirtibe. Lê dîsa jî herîkîna wê dixwaze xwe bigîhîne zeryayên rastîyê.

Hejmara Rûpelan: 180

Çapa Yekemîn: 2011

Çapa Duyemîn: Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ 2017

Pirtûkên derketî

Navê Pirtûkê: **Ziman û Çalakîya Rastîyê**
Nivîskar: Abdullah Ocalan
Naverok: Raman

Rastîya Abdulah Ocalan, ji hevkomîya lîteratûra teorîk a ku bi xwe anîye ser ziman dûr e. Darezîneke wisa weke ku dê di fêmkirina bûyerê de kêmanîyan derbixe holê, dê mirov bigihîne encamên xapînok jî. Pirtûk hindekî jî ji ber vê sedemê navê "rastîya ziman û çalakîyê" hildigre. Abdulah Ocalan, ji çalakîyên takekesî-dîrokî razber bi dest girtin, weke ku di hemwateya redkirina rastîya wî de ye, dibe helwesteke betalkirina xebata çavdêrekî ji rêzê jî. Berovajîya vê, ev yek dikare destpêkê bi şêwaza çalakîya wî bi dest were girtin. Alîyê wî yê ku bi teorî hatîye ser ziman, nikare wergirîya kêmekî çalakîyên wî jî eşkere bike. Di alîyê dîtirê de tiştên ku weke teorî hatine ser ziman weke parçeyeke çalakîyên wî hene. Bi çalakîyê re ji bûyîna dîyaletîkê wêdetir, yek ji naverokên çalakîyê ye. Ya rast, sedemên bingehîn ên ku ew dixwaze bi helwestên olî yan jî bi têgehên olî eşkere bike ev e. Sedema herî bingeh a nirxandina wî ya weke xweda, ji zehmetîya fêmkirina wî çavkanîya xwe digre û weke ku wî jî di vê pirtûka xwe de dîyar kirîye, tiştê ku tê xwastin bi xwedatîya wî were dîyarkirin, ji mîlîtanîya wî bêhtir tu tiştek nîne. Tevahîya van rastîyan, belkî jî destnîşana rastîya nîqaşeke mijara gotinê dike, ev jî rewşeke wisa ye ku hînkarîya wî, li gor guncawî û wergirîya çalakîyên eşkerebûyî hîna xwe sîstematîze nekirîye û hîna weke têgeheke serbixwe ku çalakîya xwe eşkere bike derneketîye holê.

Hejmara Rûpelan: 410
Çapa Yekemîn: Çapxaneya Ronahî - 2006
Çapa Duyemîn: Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ 2017

■ **Mîhrîcana Wêje û Hunerê ya Jinan ya çaremîn**

amar û hinavê jinê ve girêdayî ye. Jin zêdetir dikare wateyê bide jîyanê, jin rastîyê nikare sexte bike, xeyalên jinê di wêjeyê de zêdetir hakimdar e. Jin zêdetir dikare êş, bûyer, serpêhatî, berxwedanî û hêvîya jîyanê ajo bike, bike berhem û civakê bandor bike. Jin û wêje mîna dayîk û zarokan e! Mîna ku dayîk her çiqas zarokên xwe perwerde bike, hezkirinê pê de, pend û zanebûnê pê de û exlaqê cewherî pê de mirov dibîne ew zarok zarokekî serkeftî, hêja, hezkirî û aqilmend derdikeve. Lê belê, ku dayîk zarokên xwe piştguh bike ew zarok bêzanebûn, nehezkirî û kêm aqil derdikeve. Jin û wêje jî bi vî rengî ne. Her çiqas jin bi wêjeyê re têkildar bibe, her çiqas lêkolîn bike, her çiqas binivîse û berheman biafirîne, ew civak pêş dikeve, civak dibe xwedî zanîn û zanebûn. Bi rêya wêjeya jinê Zarok, ciwan, kal, pîr û tevahîya civakê dibin xwedî dîrok, destan, roman, çîrok û felsefe… Di vir de em pirseke din ji xwe bikin. Gelo! Her jin dikare wêjevantîyê bike? Bêguman her jin nikare xizmeta wêjeyê bike û di civakê de bi bandor be. Tenê jina ku ji dil de welatparêz, mirovperwer, hezkirîya welatê xwe û civaka xwe, tenê ew jin dikare ji civakê bandor bibe û civakê bandor bike. Lê jina ku ji axa xwe dûr be û di bin sîya desthilatdarîyê de xebatê bike, ew jin tucarî nikare ji civakê re bibe bersiv, tucarî nikare wêjeyê pêş bixe. Jina wêjevan berîya her tiştî divê bi axa xwe ve girêdayî be.

Bitaybetî di vê dema me ya îroyîn de jin zêdetir dikare bi pênûsa xwe rola wêjevanîyê bilîze. Divê dîroka îro bi pênûsa Jinê were nivîsandin, ancax jin dikare biqasî vê dîrokê derkeve. Êş û birîna îro biderman e, dermanê wê heye nebêjin tune ye. Lê, tenê jina wêjevan dikare tedawî bike, ger ku neke wê birîn reş bibe û zindîbûna wê namîne. Ji bo vê, Kanîya wêjeyê Jin e, û bêyî wê nikare biherike. şoreşa jin a wêjevan, fena şoreşa jin a şoreşger e!.

Jin û Wêje

di vê dema me ya îroyîn de jin zêdetir dikare bi pênûsa xwe rola wêjevanîyê bilîze. Divê dîroka îro bi pênûsa Jinê were nivîsandin

Fatma Sîdo

Wêje çi ye? Ajoya hesŧ, raman, daxwaz û xuruşa ruhê jîyanê ye. Yek ji hêvîya dewlemendîya jîyanê wêje ye. Bêyî wêje gerdûn bêwate ye, ne bedew e, ruh û xemla wê tune ye. Bi hebûna wêjeyê aşiq xwe nas dike, oldar dibe mutesawif, mereqdar dibe wêjevan û mirovahî jî dibe xwedî zanîn û hebûn. Lê belê me tenê xweŧ em bi gelemperî pênaseyekê bi kurtasî li ser girîngîya wêjeyê bidin.

-Em çima dibêjin Jin û Wêje?

Gelo! Kanîya wêjeyê bêyî Jinê dikare biherike?!

Bi derketina mirovahîyê re, hebûn û girîngîya jinê gelekî li pêş bû, bi sedan xwedawendên jin hebûn û jîyan bi awayekî wekhev û dilzîz dimeşîya. Xeyal, hizir û ramana jinê gelekî pêşketî û berfireh bû. Raſt e nivîsîn tune bû, lê li şûna nivîsê afirandina alav, vedîtina xwezayê, zaniſta ſtêrnasîyê, ſtran û hunera kevneşop û çêkirina tevnan hebû. Deſtê jinê deſtê afirandina pêdivîyên jîyanê bû û bi keda deſtê xwe hebûna xwe li ser rûyê gerdûnê mayînde kir. Doſt û hevala herî nêz a xwezayê bû, bi xwezayê re diruſt, wekhev û dayîk bû. jin dayîka xwezayê bû. Ji bo vê yekê wêje bid-

Niha rastîyeke wiha jî heye; belê rast e em di sînemayê de amator in. Ji ber ku pir zêde tecrubeya me ya çêkirina filman tune ye. Me film çêkir lê paşxaneyeke me ya ku tecrubeyeke têr û tijî çêke, nîn e. Lê me got her çend tecrubeya me têrê neke jî em dikarin bi awayekî profesyonel bifikirin. Sloganeke me ya sereke jî ev bû. Belê em amator in lê me got em dikarin bi plansazî û displîna xwe bibin profesyonel û karên mezin jî bikin. Lewma jî me helwesta 'em nikarin bikin, em bikin jî encax ev qas e' hema bêje qedexe kiribû. Me bi derfet û tecrubeya xwe dizanî, lê armanca me ew bû ku bi tişt û derfetên heyî ve em tiştê herî baş bikin.

Me ev cesareta xwe ji ku derê digirt? Helbet me ev ji rojnivîskên Sûrê digirt. Em qala berxwedana 100 rojan a Sûrê dikin, gelek nimûneyên wê yên din ên berxwedanê hene. Lê ev berxwedan veneguhastine sînemayê. Xelîl Uysal 20 sal berê ev yek kir, Film kişandin. Lewma divê em wêrek bin. Ez bawer dikim ku dê ev Film ji bo sînemaya kurdî vê cesaretê jî çêke.

- Projeyên we yên paşerojê çi ne?

Ji alîyê takekesî ve, çîrokeke nû ku ez li ser dixebitim heye. Lê ji derveyî wê, amadekarîyên cuda yên Komîna Film a Rojava bo filman heye. Di heman demê de pêwîst e her tiştê em dinvîsin jî hesab bikin bê em karin çawa, li ku û bi çi derfetan bikşînin. Yan na wê tenê li ser kaxizan bimîne. Çîroka min a nû jî dikarim bêjim ku bûyerên rasteqîn ên Kurdistanê tê re derbas dibin, çîroka kesekî ku di dema li kesekî din digere, xwe dibîne û hewl dide xwe nas bike.

-ji bo vê hevpeyvînê em gelekî te spas dikin, gotina te ya dawî.

Em jî we spas dikin ser vê derfetê. Weşan û xebatên serkeftî ji we re dixwazin.

Yanî huner û wêje di her serdemeke şoreşan an jî guhertinên mezin de rolên pir mezin lîstine. Hem ji pêvajoyê bandor bûne hem bandor li pêvajoyê kirine. Gelek serdem an jî pêvajo em tenê ji berhemên hunerî – wêjeyî nas dikin. Bi rengekî bîr, bawerî û bîrwerîya me avakirina yan bandor di teşegirtina wan de kirine.

Dema niha em tê de jî demeke wisa ye. Hem li Kurdistanê, li herêmê û li tevahîya dinyayê jî guhertinên pir mezin çêdibin. Pêwîst e hunermend li paş guhertinê nemîne, heta divê bi xwe pêşengtîyê jê re bike. Sînema jî, ji ber taybetmendîyên xwe yên rasteqîneyî û yên civakbûyînê, dikare hê bêhtir bandorê bike. Yan na mirov piştî 50'î salên din wê li paş xwe binerin û pirs bikin, çima di wê dema ewqasî hesas de, filmên li gorî wê rastî û jîyanê tune bûn.

çelengîyên belgefilman di nav xwe de dihewîne, afirandine. Taybetîya filmê me jî ev e.

Sînemaya Kurdî, weke beşeke opozîsyona civakî ya Kurdan, wê berhemên pir girîng derxîne. Ji ber ku, çawa ku li welatê me rejîmên deshilat ên dîktator hene, li alîyê din têkoşîneke me ya demokratîk û xwe dispêre xeta azadîya jinê ku li çar alîyê cîhanê bi rêzgirtin tê şopandin û piştgirîya wê tê kirin. Sînemaya kurdî gerek êmîşa vê jêderê be.

Çîrokên penaberîyê rastîyeke me ne. Lê çîroka Kurdekî bûbe penaber, ku tevî her tiştî vedigere welatê xwe, mijareke girîngtir e. Yan jî sinemaya Kurd dikare pêşengtîya jina Kurd di qadên sîyasî, leşkerî yan çandî bigire dest û şîrove bike, dikare karekter û modelên xwe ji vê werbigire. Heger em wisa nekin, zehmet e em behsa sînemayeke Kurdî bikin.

Ya din jî; ji bo filmên Kurdî xwebawerî pir girîng e. Mesela lîstikvanên vî filmî, ji xwe ew hîs û hestên film berê jî di nav jîyana rasteqîn de dîtibûn, jîyan kiribûn. Mînak: Rûbar Şervan piştî film, di berxwedana li Heftanînê de şehîd bû. Ew ne lîstikvan bû. Lê li gorî me, rêya herî baş a nîşandana rastîya jîyanî ya sînemaya Kurdî, ew e ku kesên di jîyana xwe de ew rastî dîtîye, di van xebatan de cihê xwe bigirin. Yên ku vê rastîyê herî baş nîşan bidin, ew bûn. Em bi vê yekê bawer dikin. Helbet kesên hem li ber kamerayê hem jî li paş kamerayê bûn, ji xwe di nava wê rastîyê de dijîyan. Lewma jî heger em bi rastî bixwazin, em dikarin vî karî bikin.

-Festîvalên sînemayê yên ku tên lidarxistin, li gor we çiqas girîng in û çiqas bala civakê dikşîne?

Helbete hemû festîval ne wekî hev in û mirov nikare bi çavekî li hemûyan binêre. Di serî de festîval bo nirxdayîna film û filmsaza hatine lidarxistin. Cihên naskirin, danasîn û bi hev re karkirinê ne. Lê di eynî demê de cihê bazara filman e jî. Li gor cudahîyên welatan, bajaran, rewşa çandî ya gelê wir û gellek sedemên civakî û civaknasî, hin festîval dikarin pir bala civakê bikşînin an jî tam berevajî.

Lê em filman ji bo festîvalan çênakin. Helbete li wê derê wek me got derfet hene, hin rê vedebin, bal tê kişandin, mirov pêwîst e binirxîne û nirx jî bide. Lê ya girîng ew e ku film bighêje temaşevanan, xelkê, civakê û ev civak jê hez bike û xwe tê de bibîne.

-Li Rojavayê Kurdistanê, tevgera çandî bi giştî û ya sînemayê bi taybetî, hun çawa dinirxînin?

Ez her carê dixwazim dubare vî tiştî bikim: Divê hunermend û rewşenbîrên Kurd jî mîna şervanan wêrek bin. Rastîya Kurdistanê ev e. Ji ber ku li gel şer, dagirkerî û berxwedanê, ev welat welatê me ye û huner li gel her tiştî divê bidome.

vîrûsa koranayê, hatin taloq kirin.

Heger em behs bikin, wekî mînak li Kolkatayê, li Hindistanê, guhdaneke mezin ji filmê me re çêbû. Hejmara temaşevanan ji kursîyên salonê bêhtir bûn. Helbete bandora meraqkirina bûyerên li herêma me diqewimin jî li ser vê yekê heye. Lê belê alîyê xwe yê din ê balkêş jî ew e ku ev rastî di filmekî de tên nîşandan.

Li gorî bernameya festîvalê, wekî her filmekî din, gerek film du caran were nîşandan. Lê belê ji ber daxwaza zêde ya xelkê, film sê caran hate nîşandan. Li festîvala Rotterdamê jî biletên filmê me di nav rojekê de qadîyan û li wir jî festîval hejmara nîşandana filmê me zêde kirine.

Yanî film Bandoreke zêde li mirovan kir, heta hinek kes digirîyan. Dîsa li vê derê jî wisa dibe.

-Sînemaya Kurdî niha di çi astê de ye, û ji bo pêşxistina sînemaya Kurdî çi pîwîst e?

Kurd li gelek cihan xebatên sînemayê dikin. Lê mirov dikare bibêje ku di halê hazir de ev xebat hinekî ji hev belav in. Ev xebat li hemû parçeyên Kurdistanê û li derveyî welat dimeşin.

Niha mesele wisa ye; filmên mezin bi prodiksîyonên mezin tên çêkirin. Me jî me digot em nikarin mîna wan karine mezin bikin. Lê belê piştî vî filmî êdî em dibînin ku na, em dikarin bi prodiksîyonên mezin jî van xebatan bikin.

Sînemaya Kurdî berhemên girîng ser xeta filmên sînemayê (fiction) ku

Amedê jî bikar anîn.

Dema ku me dest bi kişandina film kir, şer dewam dikir. Operasyona rizgarkirina Reqayê li dar bû. Êrîşên li ser Efrînê hebûn. Dîsa êrîş li ser gelek deverên herêmê hebûn. Di nav şert û mercên wisa de kişandina film bi rastî jî zehmet bû. Ne hêsan bû ku mirov lîstikvanekê/î yan jî amûran bîne yan jî peyda bike. Her wiha, anîna Rojava ya hin kesên pisporên vî karî û teknîka vî karî ji derve, pir zehmet bû.

Ekîbeke berfireh a film heye. Lê ew ekîb komek bû ku bi rastî jî dixwest bixebite û bawerîya xwe bi pêdivîya xebateke wisa hebû. Wek ekîba filmê Sûrê, bawerîya me hebû ku em dikarin vî filmî çêkin. Helbete bi destek û fedakarîya gelê Kobanê jî me ev film kişand.

Sînor bi piranî girtî bûn. Me carinan alavên teknîkê bi rêya rojnamevanan derbas dikirin. Helbete hinek tişt jî li vir hebûn, lê zehmetîya esas ne ev bû. Tiştê herî zehmet, alîyê derûnî yê xebatê bû.

Heger mirov bixwaze rastîyeke wisa bike film, pir zehmet e. Pirsa gelo em ê bikaribin heqê berxwedana Sûrê bidin, pir girîng bû. Şert û mercên me zehmet bûn. Di nav şert û mercên wisa de, helbet zehmet bû ku em heqê rastîyeke wisa bidin. Fikara vê yekê hebû.

Lê belê me jî got ji xwe heger her tişt amade be, wê demê her kes jî dikare vî karî bike. Me şert û mercên Kurdistanê û rewşa heyî hesab kirin. Me got dibe ku şer dewam bike, heta roj bi roj berbelav û kûrtir jî bibe. Lê belê me dîsa jî xebata xwe dewam kir, me got divê di her şert û mercekî de em xebatên xwe yên hunerî dewam bikin.

Wê demê li Efrînê rewşa dagirkirinê hebû, şer dewam dikir. Me jî nîqaş dikir ka divê hunermend li hemberî vê yekê çi bikin. Lewre me got divê sînema nesekine, xebatên me dewam bikin û em filmê xwe bighînin serî.

Ev jî parastina welat bû. Ango bi hunerê me cihê xwe di nav parastinê de girt. Helbet ji bo parastin û berevanîya welat berxwedana çekdarî esas e, lê pêşvebirina ziman, çand û hunerê jî divê tevkarî li vê parastinê bê kirin.

- Filmê ji bo azadîyê li ku derê hate pêşandan û çiqasî bi bandor bû?

Filmê ‘Ji Bo Azadîyê’ nîşandana xwe ya yekem li cîhanê li 25. Festîvala Navneteweyî ya Filman a Koltaka, pêk anî. Nîşandana yekem ser asta neteweyî li Roajva, ya Ewrupa jî li 49. Festîvala Navneteweyî ya Filman a Rotterdamê pêk anî. Li her sê deveran jî guhdaneke pir mezin bo film hebû.

Piştî nîşandana yekem li Rojava ku li Rimêlanê pêk hatibû, li Qamişlo, Dêrik, Hesekê û herî dawî jî li Kobanê hate pêşandan.

Wekî din, di meha Adarê de me film li Elmanya Berlîn, Hamburg û Hannoverê nîşan da.

Her wisa, di mehên Adar û Nîsanê de çar festîvalên navneteweyî ku filmê me jî hilbijartibûn, ji ber nexweşîya

neke ku bîra civakî bi sedê salan afirandîye re tê girêdan. Yanî ew bi xwe min ji xwe re digot, heger ez dikarim xewnan bibînim nexwe dikarim filman jî çêbikim.

- Li gor te girîngîya hunera sînemayê çi ye, û di nava Kurdan de çiqasî guhdan pê heye?

Kurdan, bi qasî dengbêjîyê û çîrokbêjîyê, tu rêbazeke din ku bikaribin xwe pê bînin ziman peyda nekirin. Ji ber wê ez sînemayê weke 'wênebêjîyê' pênase dikim. Yanî bi wêneyan derdê xwe vedibêje, bi wêneyan çîrokan dibêje...

Çîrokbêjî ne tenê li Kurdistanê, li tevayî Rojhilata Navîn kevneşopîyeke xurt û bi kok e. Di çîrokên Hezar Şev û Şevek de, yek ji anekdotên sereke ew e ku heger çîrokan venebêje, heger çîrok rawestin wê bimire. Rewşa ku niha em wekî gelekî tê de ne jî hinekî wisa ye. Heger em çîrokan nebêjin em ê bimirin. Ji xwe tu çîrokan bêjî tu xwe vedibêjî. Nexwe em ditirsin ku em xwe vebêjin, em xwe bînin ziman. Di vê derê de berpirsîyarîya hunermend çi ye? Wê hunermend çi bike? Wê ji ku derê xwe têr bike? Ji xwe hunera ku ji vê derê xwe têr nake, jêdera hest û ramanên xwe cuda be, nikare bi civakê re têkilîya xwe hebe.

Niha jî li tevahîya Kurdistanê yan şer yan jî potansîyalê ku şer derkeve heye. Mesela; kesayeteke sereke ya filmê me Yilmaz heye. Di rojên ku şer pir giran bûbû de wisa gotibû; "Dijmin nikare mala min derbas bike." Hevalên wî jî der barê wî de wisa digotin; "Wekî artêşekê şer kir." Yilmaz mala xwe kir welatê xwe. Welatê xwe jî kir mala xwe. Li hemberî artêşa dewletekê, li mala xwe yanî li welatê xwe wekî artêşekî şer kir. Ev bi serê xwe ji bo romanekê yan jî ji bo senaryoya filmekî bes e.

Çîyager, ê ku fermandarîya berxwedana Sûrê kir, cîyewazîyên wî yên wisa hene; li Amedê rojnamegerî kirîye, li wê derê zanîngeh xwendîye, li çîyayên Amedê gerîlatî kirîye û wisa li Sûrê berxwedan kirîye. Ev ne tesaduf in, ev encamên lêgerînekê ne. Huner jî li tiştên ku ne tesaduf in, digere. Dema tu wekî hûnermendekî kurd li tiştekî, li mijarekê bo hunera xwe, bigerî, heger tu ne kor bî, destpêkê tê vê bibînî.

- Astengîyên ku we di çêkirina Filmê bi navê (ji bo azadîyê) de kişandin çibûn, û bi kurtasî, çîroka vî Filmî çi ye?

Filmê 'Ji Bo Azadîyê' li bajarê Kobanê hate kişandin û berxwedana 100 rojî ya ciwanên Kurd li Sûra Amedê li dijî dagirkerîya dewleta Tirk û bûyerên rasteqîn yên vê berxwedanê, vedibêje.

Me di destpêka sala 2018'an de li Kobanê dest bi kişandina film kir. Film ji sedî 90-95 li Kobanê hate kişandin. Li taxa Gumrikê ya Kobanê ku berxwedanîyeke mezin li wê derê jî pêş ketibû. Hin dîmen jî li Qamişlo hatin kişandin. Her wiha me hinek dîmenên

Piştî zanîngehê, di navbera sala 2006 û 2010'an de di Ajansa Nûçeyan a Dîcleyê (DİHA) li herêma Amed, Dêrsim, Botan û Çukurova'yê wekî nûçegihan û midurê nûçeyan ê herêmê xebitîm.

Di sala 2010'an de ez tevlî kargeheke sînemayê li Navenda Çandê ya Cegerxwîn bûm. Piştre li şîrketeke prodiksyonê, wekî koordinatorê bernameyan, montêr û kameravan xebitîm.

Ji ber nûçeyên min çêdikirin, pir doz ji alîyê dewletê ve li min vebûn û pir caran hatim bin çavkirirn û girtin. Piştî sala 2013'an min li Rojava û Başûr karê xwe yê rojnamegerîyê domand. Di heman demê de, li gel M.Emin Mutlu, me pirtûkeke belgenivîsan (Hevpeyvîn-nivîs-çavdêrî) amade kir. Ev pitûka ji sê cildan pêk tê û navê wê: Serdema Şoreşên nû – Şoreşa Rojava.

Berîya niha min derhênerîya belgeFilmê Lênûsa Lice'yê – Min rastî nivîsandin (2012) û kurtfilmên; Pêlîstok, Cemre, Berfenbar kirîye. Her wiha min di çêkirina pir kurtefilm û belgefilman de jî cih girtîye. Filmê 'Ji Bo Azadîyê' filmê dirêj ê yekem e ku min derhênerîya wî kirîye.

- ji kengî ve hun bi karê sînemagerîyê ve mijûl in, hinekî behsa rêveçûna xwe ya di vî warî de bike?

Min di bersiva persa yekem de behs kir; ji sala 2006'an ve ez bi kamerayê re dixebitîm. Çîroka bi sînemagerîyê re jî, di salên ku min li Kurdistanê nûçegihanî dikir de derket. Di nûçegihanîya ajansê de min ev ferq kir ku, çîrokên ku em dikin nûçe em tam têr venabêjin. Ew bi xwe min pêdivî bi vegotina çîrokan didît, hest dikir. Di destpêkê de, min videoyên nûçeyan li gor fikrekê, ramanekê montaj kirin. Bi rengekî, wekî video-aktîvîst ango çalakger min dest pê kir. Ev qad jî xwe dispêre dualîyan çalakîya videoyê – videoya çalakîyê. Ji ber ku dema me dikir, me hêza dîmenê bi xwe didît. Wisa mirov bi dîmenê dest bi nivîsandinekê dike.

Heger di demeke rast de be, kamerayeke vêketî, bi rengekî dizî yan vekirî, videoyeke yek deqe digire ku dikare bibe sedema berteka bi milyonan kes. Her nûçegihaneke/î li qadan bi dehan tecrubeyên wan ên bi vî rengî hene.

Bi kurtasî, min hêza dîmenê di pratîkê de dît û lêgerîna min a 'Erê, gerek ez çîrokan bi dîmenan ve vebêjim' min ber bi sînemayê ve bir.

Rewşeke min a din a takî (şexsî) ev e: Ez bi xewnên xwe re aram im, li hev dikim. Min bala xwe dayê ku çawa di xewn de, dîmenên pir tevlihev û temirî jî dibin kurtefilmên yek sanîye. Pirê caran jî dema ez sibehan ji xew radibûm, min hewl dida ku her hûrgilîyeke xewnên xwe binvîsim û şîrove bikim.

Min didît çawa di xewnê de têgîn û têgihiştina cih û demê serûbinî dibûn, çawa rewşeke berî xewê we jîyan kiribe bi bîranîneke berî 30 salî ve tê girêdan, yan jî dibe ku bi dîme-

Sînemager Ersîn Çelîk Ji «Şermola» Re:

Divê hunermend û rewşenbîrên Kurd jî mîna şervanan wêrek bin

Hevpeyvîner: Aram Hesen

Didît ku çîrokên dibin nûçe rastîya heyî baş rave nakin, Ersîn Çelîk ji qada rojnamegerî û nûçegihaniyê, bi filmê "ji bo azadiyê" derbasî cîhana sînemageriyê bû.

-Rêzdar Ersîn Çelîk, em bixêrhatina we dikin, destpêkê bi çend hevokan xwe bi xwînerên kovara Şermola bide nasîn.

Sala 1984'an li Meletîyê hatime dinyayê, Min heta dibistana amadeyî (lîse) li Meletîyê xwend, Di sala 2006'an de min Zanîngeh, beşa mamostetîyê qedand.

di hundir de hem jî li derve şer dike. Heke piştgirîya gelê tirk di asta jor de nebe, dewleta tirk dê di şer de qels be. Di vê mijarê de partîyên sîyasî jî hatine dîzaynkirin. Dema mijar dibe şer -bi taybet dijî kurdan- hemû partîyên dewletperest dibin yek û bi yek dengî diaxivin. Ev bi rizandina civakê şer dimeşînin, divê em jî bi mirovên pêşketî re şer bimeşînin. Hemû partîyê kurdî yên welatperwer jî divê li hember dagirker û her cure dijmin yek bin. Wê demê gelê kurd dê bihêztir bibe û serkeftîtir bibe.

Mijareke girîng û nazik jî ev e: Divê bi xurtî xwedî li Rêber Apo û PKKê were derketin. Ji ber ku Rêbertî û PKKê çarenûsa xwe bi ya gel re kirîye yek. Rasterast azadîya Rêbertî dibe azadîya gelê Kurdistanê. Serkeftina PKKê dibe serkeftina hemû gelê Kurdistanê. Çêdibe ku di Kurdîstanê de partîyên xwedî hizrên cûda hebin. Çêdibe ku kesayetên girêdayî van partîyan hebin. Çêdibe ku şexsîyetên serbixwe hebin. Jixwe xwezaya civakan tev wisa ye, yê gelê kurd jî heman e. Lê ew cudahîya ku heye ne asteng e ku gelê kurd li dora Rêber Apo û PKKê bibe xelek. Divê bi hevrabûnek wisa zêdetir derkeve holê. Dema ku di Kurdistanê de PKKê bi ser bikeve bila her kesekî kurd jî pêre serkeftî be. Di vir de tu şaşitî tuneye. Di bin navê ez yan jî partîya min û rêxistina min cuda ye, em belavbûnekê jîyan dikin. Pêwîste em dawî li vê belavbûyînê bînin ku di zûtirîn dem de serkeftina mîsogerbûyî ji gelê kurd re ragihînin.

Di vê qonaxa dîrokî de gelê kurd

neçarê serkeftinê ye. Li gor şert û mercên sedsala 18 û 19an şert û mercên îroyîn pir pir guncaw in. Di du beşên Kurdistanê de statûyek derketîye holê, di beşên din yên Kurdistanê de, dewletên dagirker dema xwe ya herî bêhêz û belave jîyan dikin. Heke bi awayekî rast şerê germ, bîrdozî, sîyasî û rêxistinî were dayîn ne pêkane ku gelê kurd ser nekeve. Lewre di serdema me de ji bo kurdan serkeftin ji binkeftinê hêsantir e, ango zehmet e ku gelê kurd wenda bike lê hêsane ku ser bikeve. Di heman demê de dîrokê berpirsîyarîyekî wiha jî danîye pêşîya kurdan ku heke kurd bi ser ketin dê bi xwe re gelên dîtir jî bi ser bixin. Ji ber ku alozîya ku sala 2011an derketî bi xwe re demokrasî neanî. Lê serkeftina ku kurd bi dest dixin wisa dike ku gelê din jî bi ser bikevin û jîyaneke demokratîk û azad pêş bixin. Bi taybet li Bakurê Kurdîstanê û Tirkîyeyê ew hat dîtin û hat tekezkirin. Pratîka Rojavayê Kurdîstanê jî heman tiştî nîşan dide. Gelê kurd pêşengê gelan e. Ev jî ji bo kurdan serbilindî ye ku ji jêrzemînê rabûn qata jorîn. Di demeke kurt dê xwe gihand asta pêşengtîyê. Bi vê bîr û bawerîyê û bi şerekî rast dê serkeftinên mezin bi dest kevin.

heye ev e: di her serhildanê de beşeke kurdan alîkarîya dagirkeran kirîye. Bi binketina serhildanan re rola beşekî kurdan tim dîyarker bûye. Di bîst salên dawîyê de jî bi pratîkî hat dîtin ku hinek partîyên kurdî dê ji dijminan veneqetin û hevkarîya wan bikin. Lewre şerê bîrdozî girîng e. Di heman demê de gelê kurd êdî xwedî hişmendîyeke welatperwer e. Dê rê nede ku beşekî kurdan di pêşîya dozê de bibin asteng.

Encam

Di şoreşa Kurdistanê de hêzên bingehîn gerîla û şoreşger in. Beşdarbûna gel bi rengekî bihêztir girîng e. Ji bo vê jî pêwîste rewşenbîrên welat û derveyî welat bi awayekî çalaktir beşdarî têkoşînê bibin. Di şoreşan de rola rewşenbîran tim dîyarker bûye. Tevgera Azadîya Gelê Kurdistanê jî bi pêşengtîya rewşenbîran dest pê kirîye. Lê ji rewşenbîran beşek mezin hîna jî dûrî rastîya şoreşê ne. Êdî dem hatîye ku awa û dîmeneke nû yên rewşenbîran derkeve holê. Ev jî di xwe de avakirina bîrdozî û sîyaseteke rasttir dibe. Di bingehê vê de jî demokrasî û welatparêzî heye. Lê di serî de di van mijaran de şelo ne. Zelalîya ku tê xwestin nîne. Ji ber bombardumana bîrdozî û ya polîtîk hem civak hem jî rewşenbîr dikarin xwe şaş bikin û bikevin xizmeta dijmin . Ev bi awayekî bêalî wisa ye. Heke hizirandin û ponijîneke xurt nebe, bombardumana li ser hizr û ya li ser kesan zal dibe. Li gel eşkerabûna gelek dîyardeyan kortêgihiştin heye. Çima? Ji ber ku her çiqas agahî pêş ketibe jî, şaşagahîtî jî ewqas pêş ketîye. Bi toreyên înternetê dikarin reş wekî ku spî be bidin nîşandan. Lewre rewşenbîrîya rast girtina dest girîng e. Pêwîste nexweşîyên ku bi rewşenbîran re hene werin saxkirin. Rewşenbîr ne ew kesê ku difikire, dinivîse û diaxive. Li gel van têgînan rewşenbîr ew kesê ku her roj di nav pratîka kar û barên şoreşê de ye. Heke wisa bû nirxê rewşenbîran jî dê di nav civaka me de zêdetir bibe. Serkeftin dê nêziktir bibe. Êş û azar dê kêmtir bibin.

Şerê sedsala bîst û yekan wekî "Şerê Gel yê Şoreşger hatîye pênasekirin". Tewrîya şer ev e. Bi ezmûnan jî dîyar bûye ku doktrînê Şerê Gel yê Şoreşger rast e û serkeftî ye. Heke gel û hêzên leşkerî xwe baş bi rêxistin bikin û ber xwe bidin, ne gengaze ku gelê kurd bi ser nekeve. Rêber Apo ev rastî dahûrandîye û danîye holê, ya dimîne pratîzekirina wê ye.

Dema em li dewletan jî dinêrin, taybet jî dewleta Tirkîyeyê, şer bi pêşxistina faşîzmê dimeşîne. Bi van rêbazan gel dora xwe kom dike û hem

bibe. Ev hewildanên van dewletan tev tewş in. Lê dikarin timî şer bispêrin û di nava krîzê de rêveberîyê bikin. A rast ew e ku gel li gor bijareya xwe xwe bi rê ve bibe. Dem û çax vê ferz dike. Êdî mirovahî gihaştî ye. Bi bîrdozî, sîyaset û şerên berê rêvebirin nabe. Niha gelan rêya xwe nedîtîye. Pêşengê xwe dernexistine pêş lê dema pêşengtî û bîrdozîyeke rast amade bibe. Di nav çend salan de gelên Rojhilata Navîn dikarin xwe ji dewlet û desthilatdarên herêmî û yên cîhanî, rizgar bikin. Di vir de mînaka herî berbiçav rastîya Rêber Apo û ya PKK ye. Heke bîrdozîyeke rast, têkoşînek rast were dayîn, di sîyasetê de jî serkeftin çêdibin û civak bi temamî dikare xwe rizgar bike.

Şerê ku li Kurdîstanê tê kirin û yê ku dê bê kirin

Kurdistan qada şeran e. Piranî dagirker ji bakur û başûr, ji rojava û rojhilat hatine û kurdistan dagir kirine. Dewletên herêmê her ku derfet dîtine, derketine û êrîş birine ser Kurdistanê. Di sedsala bîstan de parçekirina Kurdistanê bi vê rastîyê ve girêdayîye. Di dîrokê de jî gelê kurd tim serî hildaye û radestî dijminan nebûye. Heta gelê kurd hemû azad nebe û xwe negîne pergala xwe dê tim şer hebe. Ev jî zagona civakê ye û li Kurdistanê zêdetir derbasdar e. Pêşîyên kurdan bi serîrakirinê hiştin ku doza kurdan nemire û tim zindî bimîne. Lê êdî kurd hatine asteke wisa ku dê êdî pergala

xwe ava bikin. Ji ber ku di rêvebertîya Rêber Apo de kurdan xwe gihand bîrdozîyeke hemdem û di rêbazê şer de jî xwe gihand gerîlatîyê. Di bingehê vê de jî stratejîya parastina rewa heye ku piştî şerên dijwar derket holê. Di bîrdozî û stratejîya PKKê de binketin tuneye. Ji ber ku dîyalektîka ku birûxîne û ava bike derbas kir. Kesayetên azad bingeh digire. Xwe bi xwe xweavakirin û pêşdebirin bingeh e. Lewre serkeftin misoger e.

Di Kurdistanê de gelê kurd dê bi rêbazên nû û afirîner xwe bigîne hedefên xwe. Ji bo vê jî şer divê. Heke dewletên dagirker çareserîyên birê pesend bikin dibe ku şerê sîyasî û yê bîrdozî li pêş be lê dewletên dagirker ji çareserîyên pêkan re ne amade ne. Hevsengîyên navdewletî jî li pêşîya kurdan asteng in. Di vî milî de jî şansê gelê kurd nîne. Lewre di paşerojê de li gel dewletên dagirker şer dê rûbide. Astengîyên navxweyî jî li ser bên zêdekirin dê were dîtin ku Kurdistan zû bi zû ji şeran rizgar nabe. Yekîtîya neteweyî her çiqas di nav gel de pêk hatibe jî dema ku em rewşa partîyan û parçeyan dinêrin, geşbîn nabin. Ji ber ku di rastîya gelê kurd de tişta

têgihiştinke şaş e. Ji ber ku peywirên mejî tên mandelekirin. Pratîka rojane, navîn û dirêj bê sinc û wijdan tê hiştin. Ew bi xwe karesateka dorfireh e û mirovahî girtîye nava xwe. Ev teorî ji alîyê hin navendên dewletan tê pêşxistin û bi demê re dibe malê hin kesan ku êdî wisa difikirin. Lê ew navend bixwe pir bi bîrdozîya xwe re girêdayîne. Jixwe ji bo serdestîya bîrdozîya çîna xwe vê yekê dikin da ku bindest, kedkar û rencber bê hizir û sîyaset bimînin ku ew jî bi hêsanî karê xwe bikin. Ev lîstokeke kirêt e. Dewlet rêvebirina dewletê wekî sîyaset nîşan dide lê di dewletê de sîyaset tuneye bi alîyê çînên serdest ve rêvebirin heye. Di sîstema dewletan de partîyên sîyasî û hilbijartin heye. Partîyên sîyasî her çiqas navê xwe partîyên sîyasî be jî ew bi xwe ne sîyasî ne û têkîlîya xwe bi sîyasetê tuneye. Ew tenê mijul dibin ku di desthilatdarîyê de bimînin û yên dijberîyê (opozîsyon) armanc dikin ku bibin desthilatdar. Di vir de xasûkî heye û di çavên civakê da xwe wekî partîyên sîyasetê û sîyasetmedar didin nîşandan. Di hilbijartina hemû dewletan de sextekarî heye. Li tu devereke cîhanê hilbijartinên demokratîk tune ne. Ji ber ku pergala dewletan ne demokratîk in. Cihê ku demokrasî tune be, rêbazê demokrasî jî nabe. Pêwîste were zanîn, cihê ku demokrasî lê ye dewlet tuneye, di cihê ku dewlet hebe demokrasî tuneye, lewre sîyaset jî tuneye. Sîyaseta xwebixwe rêvebirina civakê ye. Her tiştê ku ji civakê re tê kirin, em jê re dibêjin sîyaset. Di vir de azadî û demokrasî heye. Wekî din qet bê bîrdozî jîyan nayê jîyankirin. Ev yek pir zelal e.Îcar di şer de bîrdozî pir girîng e. Bîrdozî yekser bandoreke baş an nebaş li ser şer dike. Bîrdozî çiqas rast û hemdemî be di şer de serkeftin jî ewqas mîsoger dibe. Lê em bala xwe bidin rastîyeke din ku bîrdozî di heman demê de rojane pêwîste ku di nava guhertin û veguhertinan de be. Nexwe di demeke kin de dogma pêş dikevin û bi demê re bîrdozî sûdewer nabe û ziyanê digihîne kesên ku pê bawer in. Ez vê bi hêsanî dikarim bibêjim ku serkeftin û binkeftina di şer de yekser bi bîrdozî ve têkîldar e. Lewre çiqas bîrdozî û sîyaset rast be, ewqas jî serkeftinê bi xwe ra tîne. Lîberalîzm (serbestî) wekî bîrdozî di sedsala 18an de dema xwe temam kir. Pêwîst bû ku bîrdozîyeke nû pêşî li civakê vekiriba. Ceribandina sosyalîzmê di vê mijarê de ne serkeftî bû. Lewra lîberalîzmê temenê xwe dirêj kir. Lê belê rêveberîya cîhanê di nava krîzê de dike. Jixwe ji vê û wê de tu çareya lîberalîzmê ji bo gelan deyne tuneye.

Dewleta tirkan bi bîr û nerînekî radibe. Ew dibêjin pêşîyên (bapîr) me heta Fas, Yemen û Balkanê desthilatdarî kirîye. Dixwazin vegerin wan demên împaratorîya Osmanîyan. Gelo ew di roja me ya îro de çiqas rast e? Di pratîkê de çiqas dikare were pêkanîn? Îran bi bîrdozîya şîatîyê dixwaze bibe mêtingerê Rojhilata Navîn. Gelo çiqas serkeftî ye û dikare çiqas ser bikeve. Amerîka 70 sal e, dixwaze bibe desthiladarîyê cîhanê û bi taybet jî li Rojhilata Navîn. Gelo çiqas desthilatdar r û dê karibe çiqas desthilatdar

rotin çi bobelatek e! Gewadîyeke wisa di vê serdemê de gelo bi çi rave dibe! Lê em binêrên, bala xwe baş bidênê; dewletên zirhêz û yên herêmî bi van kiryaran bi awayekî nixumandî rola bingehîn, dilîzin.

Di şer da bîrdozî

Jiyana mirovan bi sed mîlyonan sal in. Ew yek bi lêkolîn û daneyên mirovnasîyê tê zanîn. Bi lêkolînê fosîlan jî ew yek tekez dibe. Di van sed mîlyon salan de mirov nikare qala bîrdozîyan bike. Bi famdarîya îro em digihêjin van rastîyan. Lê di jîyana mirovan de bîst hezar salên dawî balkêş û fêrker in. Di erdnîgarîya Kurdistanê de şûnwarên ku di binê erdê de aşkere dibin û tê famkirin ku hizirandin û xwebirêxistinkirin heye. Tişta ku mirov lê şaş û mat dimîne bi hezarê salên berê mirovan xwestine peyaman bigihînin yên pey xwe re bi hezarên sal. Di vir de hizirandinake kûr û dûr tê dîtin. Di rastîya îro de hin mirov hene ku di çend salên pêşîya xwe de plan nakin. Ev rastîya pêşîyên me çiqas bi nirx û nirxgiran e! Fêrker e. Waneyên baş dide me. Girê Mirazan berîya 12 hezar salî hatîye avakirin. Tiştên ku ji Girê Mirazan hatine famkirin li gorî gotina şûrwarnasan ji sedî yek e. Em ji ber vê şaş û metel bûne. Heke ji sedî pêncî em rastîya demê fam bikin gelo dê çawa be?

Bîrdozî jî ji vê rojê û şûn de heye û dê tim hebe. Heta ku di serê mirovan de mejîyê ku dihizire û diponije hebe bîrdozî jî dê her hebe. Mandelekirina (Înkarkirin) vê rastiyê bi xwe hewildaneke serdestên cîhanî ye. Pênaseya ku dibêje dema bîrdozîyan bihorîye bi xwe hizireke bîrdozîya serdestan e. Vê bangeşeyê bandoreke xwe li civakê kirîye. Di heman demê de rewşenbîr û hunermendên ku ji vî bandor bûne jî hene. Bi vê ve girêdayî sîyaset tê reşkirin. Ji devê gelek zana û hunermendan tê bihîstin ku ew dibêjin: Em dûrî sîyasetê ne. Ew bi xwe ji bo civakê bobelatek e. Di vir de pênasekirina sîyasetê jî girîng e. Sîyaset çi ye? Sîyaset; rêvebirina civakê ye. Çareserkirina pirsgirêkên civakî, xwezayî û hwd e. Pêşîvekirin û başkirina jîyana civakî ye. Hunera huneran û zanista zanistan sîyaset bi xwe ye. Her mirov di nava jîyanê de her tiştê ku dike sîyaset e. Lewre reşkirina bîrdozî û sîyasetê tuneye û hesibandina jîyana hezarên salan ê mirovahîyê ye. Mandelekirina xwe û civaka xwe ye. Mixabin hemû kirêtî li ser vê têgihiştinê û li ser kesayetên wisa re pratîze dibe.

Sîyaset ne malê dewlet û desthilatdaran ye. Di heman demê de sîyaset bi partîyên sîyasî ve sînordarkirin

Li welatên Ewropa û Amerîkayê piştî 11ê îlona 2001ê dem bi dem çalakî li metropolan çêdibin. Çalakîya 11ê îlonê 2001ê û çalakîyên din ên ku li metropolên sermiyedaran çêdibin, biguman in. Ji ber ku van dewletan toreya saloxgerîyê pir bixurtî ava kirine. Heke bixwazin tu kes nikare çalakîyên çekdarî bike. Bingehê van çalakîyan ku gelan kontrol bikin û rojeva gelan beralî bikin da ku gel û girseyên ji dewlet û desthilatdarîyê ne razî ne bêne bêdengkirin. Bi kurtî û kurdî mirinê nîşan didin û şewbê razî dikin. Beşên civakê yên ku xwe curbicur rêxistin kirîne, bi vê behaneyê tên bêdengkirin. Van dewletanan bangeşeyan dikin û dibêjin: Metirsîya terorê heye. Lê teroristên mezin ew bi xwe ne. Terora mezin ew bi xwe dikin û bi milyonan mirovan dikujin. Çanda wan dirizînin û wekî madeyeke xav digirin dest û ji bo xwe ji nû ve digirînin dest û bi kar tînin. Ev bikaranîn jî dijî civakê ye. Hêza mezin a ku di destê dewletên zirhêz de kombûyî heke di destê gelan de be, rojek jî şer dernakeve. Lê civak bê hêz, bê rêxistin û bê hiş hatîye hiştin. Bîrdozî, rêxistin, sîyaset û amûrên ragihandinê tev di destên dewletan de ne. Heke bi navê gelan hewildan hebin ku hene di cih de têne qedexekirin û ji holê têne rakirin. Evên ku hene jî her çiqas wekî opozîsyon xuya bikin jî di rastî de di xizmeta dewletan de ye. Divê baş were zanîn; her tiştên ku dijî dewletê bin, hebûn û desthilatdarîya dewletê têxe metirsîyê, dewlet di cih de dest lê werdide. Ew ji bo hêzên azadîxwaz û demokratîk pîvaneke bingehîn e. Heke dewletek ji bo partî, rêxistin û rewşenbîrîyekê re razîbûn nîşan dide, di rastî de kêrî dewletê hatin heye. Lewre her partî, tevger, rêxistin û rewşenbîrên ku dibin armanca dewletê, divê were famkirin ku ew di riyeke rast de ne.

Xizanî û bêkarî jî rastîyek şer e. Di civakê de pêşxistina asta tavanbarîyê jî rastîyeke şer e. Ji ber ku dewlet ji bo xwe leşkeran di vana rewşan de bi hêsanî dikare peyda bike. Her kesê ku aram, serhişê xwe û normal be, tu dem nabe leşkerekî dewletê û xwe navêje nava agirekî wekî dojehê. Civak bi birçîhiştinê tê perwrdekirin. Her kesê ku birçî ye ji neçarî bi beralîkirinê dibin leşker. Çetetîya ku bi taybet li Rojhilata Navîn tê pêşxistin xwe dispêre van rastîyan. Tu mêrekî normal û sade çek hilnagire û kuştin, talan û destavêtinan nake. Heke li Efxanistanê heta Fasê çetegerî û rêxistinên wan hene, ew ne jixweber dibin çete û xwe rêxistin dikin. Di vê mijarê de têra xwe belgefilm û dîmen hene ku ev rêxistin bi destê dewletên zirhêz bi awayekî tên pêşxistin. Li ser zemîna birçitî û neçarî her dewletek qasî ku bixwaze, dikare çeteyan rêxistin bike û di şeran de bide xebitandin. Her wiha gelek caran hatîye dîtin ku girtiyên normal ên girtîgehan bi merc hatine berdan û ji bo ku şer bikin hatine amadekirin. Di sedsala 21an de serjêkirin û di nava xwînê de gevizandina mirovan çi kiryarek dijwar e! Di nava çend çirkeyan de bi çend gotinan jin kirine xwedîtîya xwe çi hişek e! Jin di bajar an de fi-

Erê şoreş tên serxistin lê ew şoreş di naverokê de çiqas şoreş in? Lêgerîna vê pirsê hîna jî didome. Tê famkirin ku lazime şerekî rast were kirin û şoreşên civakî werin pêşxistin. Nexwe encam çi bibe jî bi demê ra vedigere serî û desthilatdarî û dewlet temenê xwe dirêj dikin.

Şerên sedsala 21'ê

Şerên sedsala 21'ê şerên asîmetrîk in. Dem û cih bi temamî ne dîyar in. Di şerên berê de meydanê şeran hebûn. Keleh hebûn. Bereyên şer hebûn. Bi dem û cih ve sînordar bûn. Alîyên şer aşkere dîyar bûn. Lê di vê sedsalê de kengî, li kû û çi bibe ne dîyar e. Di van şeran de saloxgerî û zanist li pêş e. Hêzên azmanî roleke dîyarîker dilîzin. Veguhestin û têrkirina leşkeran wekî berê ne zehmet e. Di encamê de şerê sedsala 21an ji her demê zêdetir dorfireh, kûr û rûxîner in. Ji serdema sumeran heta roja me ya îro xeta şer bi destê dewlet û desthilatdaran hatîye asteke wisa ku heke pêşî lê neyê girtin, mirovahî dê dawîya xwe bi destê xwe bîne. Di vir de pênaseya Albert Einstein tê bîra mirov. Ew dibêje: Di şerê cîhanê yê sêyem de kîjan çek dê werin bikaranîn ez nizanim lê di şerê cîhanê yê çarem de ez dizanim; dê ço û kevir hebin. Balkêş e kesê ku rê li pêşîya atomê vekir van gotinan jî dibêje.

Êdî şer tenê bi çekan û teknîka pêşketî nayê kirin. Şaxê şeran zêde bûne. Ji yek van şeran jî şerê bîrdozî ye. Ew şer bi rêya çapemenîyê (ragihandin) ji bo civakê tê veguhestin. Armancên bingehîn tên nixumandin û yên nerast tên pêşxistin. Bi vî awayî şeran ji civakê re didin xwarin da ku bertek neyên nîşandan. Ji ber ku ji bo kirina şeran, piştgirîya civakî pêwîste ye. Heke ew nebe hêzên çekdar her çiqas bi hêz bin jî nikarin encaman bi dest bixin. Hêzên zirhêz ên cîhanê herî zêde bikaranîna têgehên demokrasî û azadî şerên xwe rewa dikin lê di rastîyê de tiştekî wisa tuneye.

Di şeran de aborî dîyardeya dîyarîker a din e. Jixwe şer di serî de aborîyê têk dibe lê her dewleta ku bixwaze yê beramberî xwe binbixîne, di serî de şerê aborîyê dide meşandin. Şerên serdemên berê, vîn bi şerê germ dihate şikandin lê niha bi şerê aborîyê jî vîn tê şikandin û tê radestgirtin. Lewre aborîya civakî girîng e ku welatek an gelek radestî dijminê xwe nebe.

Di sedsala bîstan de her ku diçe şûna şerê dewletan şerê nûnertîyê (wekalet) tê meşandin. Ji ber ku şerê dewletan rûxîner e û encama xwe jî kêm dimîne. Bi nûnertî û derveyî sînoran şer pêşxistin zêdetir hêz dide dewletên ku xwedî armanca mêtingerî ne.

jîyîn. Şerê yekem sala 1914'an dest pê kir û sala 1918'an bi dawî bû. Şerê duyem sala 1939'an dest pê kir û sala 1944'an bi dawî bû. Ev şer ne şerên gelan bûn lê di encamê de hin gelên bindest xwe ji bindestîyê rizgar kirin, lê azadîya ku dihat payîn bi dest neket. Di van her du şeran de teknîka şer pir zû pêş ket. Ji ber ku girîngîya teknîkê zêdetir derket pêş. Dewletan, sermayeyê xwe ji bo afirandin û pêşxistina teknîkê veqetandin. Her ku çû şer kûrtir û berbelav bû. Heke pêşketina zanist û hunerê bi awayekî rast bihata destgirtin, teknîk di xizmeta gelan de bûya û mirovahîyê dikarîbû di nav bihuştê de jîyan bikira. Mixabin bi hev ve girêdayî ye her ku teknîka şer hat pêşxistin, di civakan de xizanî pêş ket. Her ku bi teknîka pêşketî şer hatin kirin, bajar wêran bûn. Bi milyonan mirov jîyana xwe ji dest dan, seqet manû bûn penaber. Heke xetek şaş were kişandin, di destpêkê de milîmek şaştî hebe bi xêzkirinê re dûratî vedibe û bi metreyan, bi kîlometreyan xêz şaş tê xêzkirin. Şerên sedsala 21an jî her wisa bûn ji ber ku di şaşîtîyê de çûyîn, bobelatan mezin dike. Şerê germ û sar encama xwe her wisa bû û ji bo civakan dihat wateya ruxandin û wêranîyê.

Di şerê sedsala 21'ê de dewletan karîbûn gel jî bikin hevkarê xwe. Ev jî bi pêşxistina netewperestî dihat kirin. Nasname, ax û welat, ziman û çand dîyardeyên bingehîn ên mirovahîyê ne lê di vê sedsalê de ev dîyarde ji wateyên xwe yên bingehîn hatin dûrxistin. Wisa hat ayarkirin ku êdî gelan bi nasname, ziman û çanda xwe dijmintîya hev û du dikirin. Di bingeh de gelbûn û netewbûn dewlemendîyeke ji bo gel û neteweyên din e, lê ev hizir hate jahrîkirin û di navbera gelan de dijmintî hat kûrkirin. Bi vî awayî û bi awayekî girseyî gel dibûn şîrikê şerê serdestan. Dema ku wisa lê hat ji bo şer peydakirina leşkeran hêsantir bû. Veqetandina budçeyan bê pirsgirêk bû. Gelek pirsgirêkên navxweyî yên aborî, çandî, rêvebirin û hwd dihatin nixûmandin. Xasukî (fêlbazî) bû jokerê sîstemê. Ji bo her pirsgirêkê desthilatdarên xasuk dikarîn çareyan peyda bikin ku di reseniya xwe de ne çareserî ye.

Di hin welatan de şoreşên çînatî û yên neteweyî hatin serxistin. Salên 1990'î de serûbinbûyîn çêbû. Hat dîtin ku pirsgirêka şoreşan çareser nebûne.

tin hem dijî dewletên din tê kirin, hem dijî derbeyên navxeyî û hem jî dijî êlên azad tên kirin. Di van sîsteman de xwe ji civakê qutkirin, têgihiştina bingehîn e. Qadên jîyanê yên cuda tên sazkirin. Li ser xizanî û bindestîya gelan jîyaneke bihuştî tê jîyîn. Em di vê rastîyê de jî dibînin ku dewlet ne amûreke ya gel û bindestan e. Lewre artêş, hêzên asayîşê, saloxgerî ne di xizmeta gel de ne, lê di xizmeta dewlet û desthilatan de ne.

Di şeran de barût roleke girîng dilîze. Di hezar salê BZ de barût tê vedîtin. Bi sedsalan ji bo armancên curbicur tê bikaranîn. Lê bingeh barût di sedsala 13'an de bi çêkirina topan roleke çalaktir dilîze. Ew dihêle ku kesên ku wê bi kar tînin di şer de bihêztir bibin. Di van deman de êdî girîngîya şerê meydanî namîne. Bi kelehan xweparastin û êrîşkirina li ser kelehan jî destpêşxerî dikeve destê hêza ku topan bikar tîne. Di navbera dewlet û bindestan de cudahiyek derdikeve holê. Hêzên azad û berxwedêr zêdetir lewaz û bêhêz dibin. Asta dagirkerîyê bilindtir dibe û gelek deverên cîhanê tên dagirkirin û şêlandin. Di serî de Efrîka, Hindistan û Amerîka lê gelek deverên cîhanê têne vedîtin û dagirkirin.

Di serdema ronesansê de ango sedsala 13em û pêve afirînerî digihîje asta herî bilind. Di zanist û çand û hunerê de gavên mezin tên avêtin. Qad qada Ewropa ye. Bi vedîtina neft(petrol) û pê ve girêdayî vedîtina motorê bandoreke mezin li jîyana mirovan dike.

Ji Îtalya heta Birîtanyayê demeke biliv û tevger tê jîyîn. Di milekî de zordarî û di milekî din de berxwedan heye. Gel ber xwe didin. Desthilatdar û bazirgan dixwazin destpêşxeriyê bi dest bixin. Di jîyana civakî de guhartin û veguhartinên dîrokî tên pêş. Di encamê de ya ku ser dikeve hizir û pratîka sermayedarî ye. Sergoya kambaxîyê mezin dibe û bihuşta gelan jî tê tengkirin. Mirovahî herî zêde di vê serdemê de taybetîyên xwe ji dest dide. Bêguman di vir de rola şeran dîyarîker e. Heke gel, bindest, karker û jinan serkeftin bi dest xistibana dê rastîya îroyîn cuda bûya. Sermayedarîya Ewropa ku li Ewropa xwe tekûz kir, berê xwe da parzemînên din ên cîhanê. Jiyana ku di serdema neolîtîkê de hatibû pêşxistin weke bihuştê bû. Bi dildarî û moraleke bilind dihat jîyîn. Di dema sermayedarîyê de her deverê cîhanê ji bo gelan bû dojeh. Komkujî bû dîyardeya ji rêzê û talankirin bû merdî.

Şerên sedsala 20'an

Di sedsala bîstan de du şer hatin

vê re jîyana mirovahîyê xirab bû. Ew hiş, çand û têgihiştin heta roja me ya îro jî tê û her ku diçe zêdetir ziyanê dide civak û xwezayê. Şerên ku ji rê derketin û asta parastinê derbas kirin, di heman demê de dest pê kirin. Ew jî rastî dema Sumerîyan tê. Li gor zanyarîyên me yên îroyîn ji wê rojê heta vê rojê dagirkerî û xwînmijî bênavber didome.

Li gel rêveber û oldaran fermandarê leşkerî jî cihê xwe di sîstema nû ya ku hatîye pêşxistin de digire. Di roja îroyîn de jî dema em li rastîya dewletan dinêrin heman dîyardeyan dibînin. Dewlet bê desthilatdar, oldar û fermandaran nayê hizrandin. Lewre pergal xwe di kirêtîyên xwe de nû dike û ji nû ve xwe pêşkeşî civakê dike. Di rastîyê de ya ku di desthilatdarî, oldarî û fermandarîyê de pêş dikeve xwe hûr, kûr û firehkirin e. Lewma niha di asta cîhanê de krîz bê navber tê jîyîn. Tu dewlet nabe dewleta gelan. Em dikarin vê rastîyê di rêveçûna şeran de bibînin.

Di destpêka şerê biplan û rêxistinkirî de, amûrên şer li gor dema me sade û ji rêzê ne, lê ew nayê wê wateyê ku di dema xwe de ne bi bandor bûn. Şûr, mertal û rim amûrên şer ên destpêkê yên dema avakirina bajar û dewletan e. Bi zora van çekan hêzên rêxistinkirî û bitevger di nav bajar de serdestîyê diparêzin û li derve jî mêtingehan ava dikin û dibin mêtinkar. Li hember wan wê demê û heta niha jî tim serîrakirin û berxwedan heye. Êl û hozên azad ên ku dervayî pergala dewletê ne, xwe diparêzin lê pirî caran rastî komkujîyan tên. Lewre dewlet di navendên bajaran de bihêz in û êl jî li dervayî sînorên bajaran azad in. Lê di roja îroyîn de tu devera ku nehatîye dagirkirin nemaye. Lewre xwe spartina qadên azad nemaye. Ji bo vê jî rengê têkoşînê hatiye guhartin. Azadî girêdayî qadekê yan sînorekî nayê jîyîn. Azadî bi bîrdozîyeke rast, bi kesayeteke azad û bi xwerêxistinkirinê tê jîyîn. Heke ev hebin nirxê ax û welat heye. Welatekî dîyarkirî hebe û desthilateke kurdî hebe jî heke ev dîyarde nebin tu carî bi awayekî azad nayê jîyankirin. Desthilatdarî û dewlet dê reng biguhere, şûna yên biyanî yên kurdî dê bigirin û di rewşa civakê de tu guhartin çênabe.

Di rêveçûna dîrokê de dema ku girîngîya teknîka şer tê famkirin, ji bo pêşxistina vê yekê hewildan têne kirin. Di destpêkê de şerê meydanan tê dayîn. Li gel teknîka şer hêza gewdeyî û ya ramanî jî girîngîyeke xwe heye. Her alîyê ku di meydana şer de biserdiket, paşê dest bi talan û dagirkirinê dike. Bi demê re tîr û kevan tê pêşxistin û di şer de roleke girîng dilîze. Ji bo ku dewlet û desthilatdarî li gel oldaran karibin xwe û pergala xwe biparêzin, kelehên biheybet têne avakirin. Paras-

Di Sedsala 21'ê De Rastîyên Şeran

Em Kurd weke ku di gelek waran de û bi taybetî di warê ragihandina civakî de jî qelsî û nepesîyên me hene, ji ber vê çendê ev yek pêwîst e baş were çespandin û di dawîyê de were çareser kirin.

Azad Ararat

Şer di dîrokê de:

Tundûtûjî rastîyeke xwezayî ye. Ev rastî bi vîna mirovan nayê guhertin. Lê tundûtûjîya ku di xwezayê de heye ne rêxistinkirî ye. Ji xweber e. Di jîyana zindîweran de hevsengîyê naguherîne û ziyanê nade xwezayê. Xweza di nav ahengê de bi rêve diçe. Her çiqas di xwezayê de jirêderketin hebe jî lê bandorê li rêveçûna xwezayê nake. Her çiqas ajalên goştxwer hebin jî ew tenê ji bo têrbûnê dixebitin û ne bi rêxistin û plan in.

Kengî di mejîyê mirovan de pêşketin çêbû, di ziman de axavtin pêş ket, hingê di jîyana mirovan de xwerêxistinkirin û plankirin jî pêş ket. Di dema şoreşa neolîtîkê de gavên bi heybet hatin avêtin û heta roja me ya îro jî em hîn di bin bandorê de ne. Heke ew gavên girîng nebûya dê jîyana me ya îroyîn jî pir cuda bûya. Di dema bajar û di bajaran de jî rêveberî û leşkerî hate pêşxistin, pêre çînîtî jî derkete holê. Bi

Parêzvanê bizava futurizmê nivîskar û şanoger **Vladimir Mayakovski** di sala 1893'yan de li Gurcistanê ji dayik dibe. Bi saya fikr û ramanên xwişka xwe Bolşevîkan nas dike di pazdeh salîya xwe de dibe endamê Partîya komînîst a Bolşevîkan. Ji ber çalakî û nêrînên xwe yên Sosyalistî pirî caran tê girtin û dikeve hepsê.

Piştî damezrandina dewleta Sovyetê ji bo pêşxistin û fêmkirina bizava Futurizmê hewl dide, dixebite, gellek helbest û tekstên şanoyê dinivîse.

Dostê wî yê ku jê zehf hez dikir Sergey Yesenin li Leningradê xwe dikuje. Ev bûyera xwekuştinê, dilê wî pirr diêşîne û bandoreke mezin lê dike.

Mayakovski gellek caran ji ber fikrên xwe yên rexneyî tê şermezarkirin lewma ji alîyê nivîskarên din de zêde nehatîye hezkirin û qebûlkirin.

Rihê Mayakovski mîna zarekî piçûk û delodîn bû. Tucarî ji alîyê derdora xwe ve nehat fêmkirin. Em dikarin bêjin ku ew mirovekî tenê bû.

Vladimir Msyakovski di sala 1930' de bi çeka xwe ya emegdar xwe dikuje.

Nivîskara duyemîn ya bîyanî ku jîyana wê zêde zêde bandorker û balkêş e dixwazim hinekî behs bikim, bila xwendevanên me hinekî binasin.

Helbestvan û nivîskara Emerîkî ya zarxweş **Sylvia Plath** di sala 1832'an de li Massachusettsê ji dîya xwe dibe.

Plath helbesta xwe ya pêşî di heyşt salîya xwe de dinivîse. Di sala 1940'î de bavê wê dimire. Ev mirin jîyana Plath tevlihev û serobino dike. Piştî mirina bavê wê tê dîtin ku Plath nexweşê psîkîyatrik ya manik depresif e.

Di sala 1950'î de li Smith Collegeê dixwaze xwe bikuje lê bi ser nakeve wek birîndar xelas dibe. Demeke kurt ji ber vê bûyera xêrnexwez li tîmarxaneyê dimîne.

Di sala 1955'an de koleja Smith diqedîne. Piştî kolejê zanîngeha Cambridgeê dixwîne û xebatên xwe yên nivîskî li wir didomîne. Gellek helbestên wê di rojnameya Varsity ya zanîngehê de tên weşandin.

Di sala 1956'an de bi helbestvanê Înglizî Ted Hughes re dizewice jîyana xwe li Londonê didomîne. Lê ji ber nexweşîya wê ya psîkîyatrîk ya manik depresif zewaca wê zêde dewam nake mêrê xwe berdide jê vediqete bi zarên xwe re bar dike cihekî din maleke kevn û erzan kirê dike.

Di sala 1963'an de ji ber jîyana xwe ya feqîr, belengaz û dijwar zarokên xwe di odeyekê de kilît dike berê xwe dide mitbaxê serê xwe dixe hundirê firinê bi gaza firinê xwe dikuje.

Hûn jî dibînin ku xwekuştin rastîya jîyana cîhana me ye. Helbet gellek sedemên xwekuştinê hene: Sedemên psîkîyatrîk, felsefîk, olî, civakî, îdyolojîk, ekonomîk û yên şexsî.

Sedem her çi bibe jî ev tercîha kesan e. Hûn bûyer û rastîya xwekuştinê qebûl bikin an jî nekin ew ê herdem her roj şopa xwe bi sîya mirinê ve derxe pêşberî we.

temam dike. Helbestên Şiko cara pêşî di rojnameya Zanîngehê de û dûre jî di rojnameya Rêya Teze de tên weşandin û car caran jî li radyoya Kurdî tên xwendin. Şiko dibîne ku dewleta Sovyetê pişta Kurdan digire, her derfetê radixîne pêşîya wan, ziman, çand, huner û jîyana Kurdan mezin û bilindtir dike, ji ber vê mebestê herdem dibe alîgirê dewleta Sovyetê.

Şairê dildar, qelemhez û hestîyar Şikoyê Hesen di sala 1976'an de xwe dikuje lê hê jî sedema xwekuştina wî ya rasteqîn nayê zanîn. Gora wî li paytexta Gurcistanê ya bajarê Tîflîsê ye.

Heta mirina Şiko sê heb pirtûkên wî çap dibin. Di sala 1961'ê de pirtûka Qalçîçek, di sala 1966'an de pirtûka Tembûra Kurda, herî dawî di sala 1970'î de Meremê Dilê Kurd.

Piştî mirina Şikoyê Hesen bi navê "Perwaza Welat" û "Payîz û Ba" du pirtûkên wî çap dibin.

Ez çiqas qala wî şairê zimanhez, helbesthez, fedekar û jêhatî bikim dilê min diêşe. Şiko nivîskarekî wêdetir însanekî ye. Divê xwendevan bizanibin û têbigihêjin ku her xwekuştin çalakîyeke kesane ye û li gor xwe sedemên rast û mafdar dihewîne.

Divê neyê fêmkirin ku xwekuştin qelsî yan jî bêhêzî ye. Ji ber ku her xwekuştin bi zanebûn tê kirin û xwestin. Ka ji xwe bipirsin "Gelo çend kes dikare xwe bikuje û konê xwe bar bike ji vê dinyaya fanî".

Nivîskarê duyemîn yê Kurd ku xwe kuştîye dixwazim bi we bidim nasandin ew helbestvanê zîrek **Mihemed Omer Osman** e.

Mihemed Omer Osman di sala 1957'an de li taxa Dêrgezên bi ser bajarê Silêmanîyê ve ye tê dinyayê. Dema pola sêşemê dixwend ji ber şerê di navbera Iraq û Îranê de xwendina xwe nîvî dihêle. Di sala 1975'an de dest bi karê nivîsandin û rojnamegerîyê dike. Carnan ji ber sedemên darayî karkerîyê dike.

Helbestên wî ji alîyê ciwanên Kurd ve pirr tê hezkirin. Ji ber helbesta wî ya Generalê Payîzê ku di dîwana wî ya Li Xurbetê cih digirt êdî weke Generalê Payîzê hate binavkirin.

Di sala 1991'ê de li Şeqlawayê di Kongreya Yekîtîya Nivîskarên Kurd de dibe endamê Yekîtîya Nivîskarên Kurd.

Berhemên wî heta niha di gellek rojname, kovar û malperan de hatine weşandin. Pirtûka wî ya Li Xurbetê di sala 2013'an de li Bakur ji alîyê weşanxaneya Avestayê ve hate çapkirin.

Ev şairê dilgeş di sala 2019'an de, mixabin di mala xwe de xwe darve dike. Mebesta xwekuştina wî ji raya giştî ve nehate zanîn.

Piştî helbestvanên Kurdan divê em hinek jî bala xwe bidin nivîskarên cîhanê. Gellek nivîskarên cîhanê yên xwekuştine hene mînak: Virginia Woolf, Mayakovskî, Walter Benjamin, Sylvia Plath, Cesare Pavese, Stefan Zweig, Jerzy Kosinski û gellek navên din.

Lê ez ê ji we re bi tenê qala du nivîskarên cîhanê bikim ku bandoreke mezin li ser xwendevanên cîhanê hiştine.

Karl Menninger xwekujîyê di navbera jîyan û mirinê de wekî şerekî dijwar û jêneger dibîne. Li gor fikra wî kîjan xurt be ew qezenc dike.

Ol û bawerîyên modern jî xwekuştin li gor xwe rave kirine.

Ola Îslamê xwekuştinê guneheke mezin dibîne bi tekez qedexe dike girîngîyê dide jîyana mirovan. Lewma rêjeya întixaran li gorî lêkolînên kirî di hundirê Misilmanan de pirr hindik in.

Piştî ferman û nêrînên alim û mirovê dînî yên **Augustin**, **Ola Xaçparezîyê** întixarê erênî nake û nasepîne. Di serdema kevn a klasîk de rewş hinekî cudatir e, carinan Xaçperestên bawermend ji bo ku ji zordestîyê xwe xelas bikin mecbûr dimînin bi komî an jî şexsî întixar dikin. Di roja me de otorîteyên Xirîstîyanî ji xeynî **mezheba Protestanî** xwekuştinê gunehekî erjeng dibînin û napejirînin.

Ola Cihûtîyê xwekuştinê wekî olên din yên sereke gunehekî li hemberî Xweda qebûl dike. Lewma li dijî xwekiştinê disekine. Cihûtî jîyanê pîroz dibîne.

Olên wek **Hînduîzm**, **Budîzm** û **Caynîzim** li hemberî întixarê hikmên dijwar negotine û neanîne ziman. Hema hema em dikarin bibêjin ku rê dane xwekuştinê û teşwîq kirine bi kirinên xwe.

Xwekuştin bi gelek reng, sedem û armancan dikare derkeve pêşberî me. Lê divê em fêm bikin ku xwekuştin rastîyeke civakî ye, mixabin herdem dê rastî me were. Dawîya dawî nivîskar jî mirov e dikene, digirî, bedbext an jî bextewar dibe. Hêza nivîskar qelema wî/wê ye. Bi qelem û fikrên xwe pêşengîya civatê dike. Civat fêm neke jî ew mecbûr e rola xwe ya dîrokî bilîze û bibe neynik û wijdana civatê. Di dinyayê de gellek nivîskarên jêhatî bi sedemên cihê xwe kuştine. Ez ê ji xwendevanan re behsa jîyana çend niviskarên Kurd û yên Bîyanî ku xwe kuştine, bikim.

Dema ku behsa xwekuştinê derbas bibe nivîskar û helbestvanê Kurd **Şikoyê Hesen** tê bîra min.

Şikoyê Hesen di sala 1928'an de li gundê Camuşvana piçûk ku girêdayî navçeya Axbarana Ermenistanê ye tê dinyayê. Malbata Şiko piştî şerê cîhanê yê yekemîn ji bo ku xwe ji qetilama dewletê xelas bike mecbûr dimîne ji Dîgora Qersê koçî Ermenistanê dike. Şiko hê pênc salî ye bavê wî Hesenê Mido dimire. Apê wî Sofî wî xwedî dike.

Şiko piştî xwendina xwe ya seretayî, navîn û ya dawî di sala 1948'an de diçe zanîngeha Yêrîvanê beşa ziman û zanistîyê dixwîne. Bi xelaskirina zanîngehê re di navbera salên 1954 û 1957'an de mamostetîya zimanê Ermenkî dike.

Şiko di beşa kurdî ya radyoya Yêrîvanê de dest bi edîtorîyê dike û di navbera salên 1959 û 1961'ê de jî karê şêwirmendî û wergêrîyê dike. Demekê edîtorîya Radyoya Rewanê dimeşîne. Di sala 1961'ê de bi sedema perwerdehîyê diçe Leningrad'ê û ser zimannasîyê doktoraya xwe dike. Di sala 1965'an de di Enstîtuya Gelên Asya û Afrîkayê de beşa Kurdolojîyê

mirov mecbûr bimîne xwekuştin ferz e.

Eflatun jî wekî Sokrat xwekujî rê û rêbazeke rast nabîne, napejirîne ji xêncî sedemên mecbûrî.

Arîsto bi temamî li dijî xwekuştinê derdikeve. xwekujîyê karê hemwelatîyên bêkêr û xerab dibîne û rave dike. Li gor Arîsto jîyan dîyarîyeke mezin e ji me re hatîye dayîn, divê qedr û qîmeta wê bê zanîn. xwekujîyê wek emelê ehmaqan şîrove dike. Arîsto arîstokratekî ye alîgirê hêzdaran e. Bi dîtina wî, mirina xelkê feqîr û reben girîng nîne.

Epikuros heger mirov bextreş û bêsiûd be dikare bi mafdarî xwe bikuje loma xwekujîyê çalakîyeke rewa dibîne. Li gor wî her mirov azad e ku xwe bikuje. Epikuros giringîyê dide azadîya fikr û ramanên mirovan.

Cicero ji ber sedemên olî û civakî li dijî xwekuştinê disekine.

Platonparêzên Nû yên wekî Py**thagoras**, **Plotinos** û **Porphyrios** jî li dijî xwekuştinê derdikevin.

Seneca heke mirov zehf kal be û zewqa jîyanê nema be xwekuştinê rêyeke mafdar teswîr dike.

Albert Camus bi hêrs dipirse: "Gelo jîyan tiştekî ewqas watedar e ku mirov bijî? Wate nemîne çîrok û serpêhatîya mirinê dest pê dike." Lewma di hişê Camus de xwekuştin mijareke pêwîst û watedar e.

Nietzsche xwekuştinê erênî dibîne û dibêje: "Mirov heyîneke xurt nîne, jîyan her roj lawazîyê bi bêhêvîtîyê ve derdixe pêşberî me. Ji ber vê carinan çalakîya herî mezin, esîl û şanaz xwekuştin e. Întixarê biryara kesên azad qebûl dike.

Schopenhauer jîyanê tiştekî erjeng dibîne xwekuştinê bi dildarî dipejirîne. Bi fikra wî ev civat bi dizî, kuştin, şêlandin û bi hezaran xerabîyan cihekî kambax, rezîl û kepaze ye lewre xwekujîyê weke rêya xelasbûnê dipejirîne.

Civaknasên serdema nûjen jî li ser întixarê ji hev cudatir fikirîne û sekinîne.

Emil Durkheim xwekuştinê rastîyeke civakî şîrove dike. Li gor wî kesên ku xwe dikujin êdî bi civatê re li hev nayên bi zanebûn qestî canê xwe dikin. Durkheim di xwekujîyê de sîya tenêtî, bêhêvîtî û belengazîyê digere.

Kant xwekuştinê naperijîne, wekî tiştekî şermdêr û kerixîner dibîne.

Javata û **Melvin Seeman** di bingeha xwekuştinê de bîyanîbûna mirov û civatê dibînin. Li gorî wan mirovên modern, belengaz û tenê ne rizgarbûnê di xwekuştinê de digerin.

Li ser întixarê gellek teorîyên psikolojîk jî hene, dixwazim fikrên çend psîkologan bînim ziman.

Li gor **Sigmund Freud** ji bo mirov tişta herî girîng dîyardeya zayendîtîyê ye. Freud xwekujîyê weke sadîzmeke rihî îfade dike. Li gor wî mirovên ku rihê wan birîndar û nexweş dikarin xwe bikujin.

Di teorîya **Erich From** de ajoyên civakî girîng in, ne tehnên kesane û zayendî. Li gor wî her mirov di hundirê civakê de dibe mirov. From xwekuştinê pirsgirêkeke civatî qebûl dike û wisa dinirxîne.

Xwekuştin û Nivîskarî

Xwekuştin bi gelek reng, sedem û armancan dikare derkeve pêşberî me. Lê divê em fêm bikin ku xwekuştin rastîyeke civakî ye... Dawîya dawî nivîskar jî mirov e dikene, digirî, bedbext an jî bextewar dibe.

Occo Mahabad

Di dîrokê de gellek kes û nivîskar hene ku xwe kuştine. Her xwekuştin sedemên cuda dihewîne. Di vê çalakî û biryara kesane de mirov di tûrika jîyana xwe de gellek raz û hestên tevlihev û nefambar vedişêrin. Em nikarin mijara xwekuştinê bi pêşdarazên beredayî mehkûm bikin. Divê baş bê fêmkirin ku nakokî û alozîyên heyî yên jîyanê xwe bi sîya mirinê ve nîşanî civatê didin. Loma pirsa "Gelo çima xwe kuşt?" piştî mirinê giringîyê nade wate û sedemê. Hûn rast bibînin an jî nebînin her xwekuştin ji sedî sed mijareke şexsî ye ku li gor mantalîte û hebûna xwe sedemên rewa û mafdar dihewîne. Mirin û xwekuştin jin, mêr, zarok, netew nas nakin.

Ramyar û fîlozofên serdema pêşîn û nûjen di vê dîyarde û bûyera girîng de cuda cuda fikirîne û tevgerîyane.

Sokrat canê mirovan milk û sermîyana Xwedayan dibîne, lewma ne alîgirê xwekuştinê ye, lê dibêje heger

Qedrê qelema me bête zanîn

Gelo ma dibe ku rêberek ji me Kurdan jî rabe û bi saya wî, şûrê hunera me bê danîn. Mirov dikare di vir de bi du wateyan peyva "şûr" şîrove bike. Yek, şûrê ji bo şer yê tê naskirin, ya din, sûreh. (Dîwarê li hawîrdorê kelehan. Hin kes dibêjin; guhertin di peyvê de çêbûye bûye şûr) Li gorî wateya yekê wiha dibe: Hunera me ku weke şûr tûj û bibandor e, bê pêşkêşkirin. Xanî herwiha balê dikişîne ser bedewî, hêz, bandor û dewlemendîya hunera kurdî. Li gorî wateya din jî wiha ye: Bingehê sûreha hunera me bê danîn. Xanî li vir hunera kurdî di bilindbûn, qîmet û bandorê de şibihandîye kelehan. Û ka çawa pêwîstîya kelehan bi parastinê heye, pêwîstîya hunerê jî bi parastinê heye. Çawa ku keleh bi sûrehan tên parastin, hunerên gelekî jî bi saya hebûna rêberan tê parastin. Mebesta Xanî ji vê malikê ev e: Eger rêberek ji me rabe, bi saya wî hem wê bingehê hunera me bê danîn û parastin, hem wê qedir û qîmetê qelema me bê zanîn. Ango wê helbestên me, hunera me, nivîsên me, wêje û pirtûkên me jî li cîhanê bên naskirin û qîmetê wan çêbibe. Mirov dikare qedrê qelemê wiha jî şîrove bike: Qelem, werger û tercûmanê fikir, zikir û nêrîna xwedîyê xwe ye. Bi gotineke din qelem sembol e. Xanî wiha dibêje; eger serokek ji me rabe wê bi saya wî qîmetê axaftinên me jî, nêrîn û fikrên me jî çêbe. Peyameke wiha jî ji gotinên wî derdikeve. Ka çawa di gelek malikan de behsa şûr û hêzê kirîye, behsa qelemê jî kirîye. Ango ne bêşûr dibe, ku sembola hêzê ye, ne bêqelem dibe ku sembola zanebûnê ye. Dîmenê ku Xanîyê nemir dixwaze nîşanî me bike, Kurdekî di destekî de şûr, di destekî de qelem e. Dema em li rewşa xwe ya niha binêrin, emê bi hêsanî bibînin ku îro jî pêwîstîya Kurdan hem bi şûr heye, hem bi qelemê. Çawa ku di dinyaya me ya îro de şûr û qelemên her gelî hene. Xanî dibêje; eger Kurd jî weke gelên dinyayê bibin xwedîrêber, wê encameke wiha derkeve meydanê:

Derdê me bibînitin ilacê Ilmê me bibînitin rewacê?

Ma dibe ku em jî bibin xwedî serok û bi saya wî ji derdê me re derman peyda bibe? Herwiha ilmê me, zanista me biqîmet bibe, were naskirin û em jî bi ilmê xwe di nava gelên cîhanê de cihê xwe bigirin? Di vê malikê de jî têgeha "Derd", "Ilac", (Derman) "Ilim" û "Rewac" xwedîwateyên girîng in. Xanî di vê malikê de careke din ji Kurdan re dibêje; rewşa em ketînê li me bûye derd û derman jî di peydabûna rêberekî de nîşan dide. Xanî di vê malikê de herwiha behsa ilmê Kurdan dike. Wiha dibêje: Em xwedîilim û xwedîzanist in. Lê ji ber bêxwedîtîyê ilmê me, zanista me nayê naskirin û bêqîmet e. Lê eger em jî weke herkesî bibin xwedîserok, wê zanista me jî biqîmet bibe, jê bê heskirin û bikeve nava zanistên dinyayê.

ji xewê şîyar bibin? Di vê malikê de jî Xanî sê têgehên watebarkirî bi kar anîne; "Bext, Yar û Xew." Xanî balê dikişîne ser bextreşî û bêşansîyê. Her çenda mirov bi jîrbûn, zanebûn û keda xwe digihe armanca xwe, lê gelek caran bextê hinan di serkeftina wan de ji wan re dibe alîkar. Çawa ku tê gotin; jê re li hev hat. Yan jî çawa ku tê gotin; esil lêhatin e, ne jêhatin e. Herwiha dibêje; heger stêrek derkeve dibe ku bextê me ji me re bibe yar, dost. Di vir de dîsa gazindan ji bext dike, ku her tim bûye neyar, nebûye yar. Di nîvmalika dawî de Xanî bi gotina "Carek bibitin ji xwabê hişyar." rexneyeke pir giran li civaka Kurd dike. Xanî ne sergirtî, bi awayekî eşkere Kurdan bi mayîna di xew de rexne dike. Mirov dikare bêje ku ji bo civakekê piştî xîyanetê kêmayîya herî mezin mayîna di xew de ye. Heta dibe ku carnan xeterîya xewê ji ya xîyanetê dijwartir be. Lewre dibe ku kesê di xîyanetê de rojekê rastîyê bibîne, yan wijdan û aqilê wî serdestîyê li xîyaneta wî bikein û ji rêya şaş vegere. Lê kesê di xew de weke kesê kerr, kor û lal e. Ne dibîne, ne dibihîze û ne dikare biaxive. Û ne tu dikarî tiştekî jê re bibêjî. Çawa ku tê gotin, xew û mirin yek in. Mebesta Xanî ji xewê bêguman xewa mecazî ye. Bi kurt û cewher dixewdebûna civakê mirina civakê ye. Û Xanî jî balê dikişîne ser vê kêmayîya giran. Di vir de dîsa peyva "Carek" dîsa pir girîng e. Dibêje; ku carekê hişyar bibin. Ji vê tê fêmkirin ku her tim di xew de ne. Lê dibêje; heger bextê me vebe, stêrek ji me re derkeve, carekê şîyar bibin, wê êdî nekevin wê xewa mirinê. Xanî di malika li jêrê de naveroka bext û şans wiha vedike:

Rabit ji me jî cîhanpenahek
Peyda bibitin me padîşahek

Ew stêr me ji xew şîyar bike û ronahîyeke wisa bide pêşîya me, ku ew ronahî wisa bike ku ji me jî cîhanpenahek (Kesê ji cîhanê re bibe pişt, pena û destegîr. Mebesta Xanî ji "cîhanê" yan cîhana Kurdan e, yan mebesta wî ew e ku rêberekî wisa ji Kurdan rabe ku li dinyayê deng bide û ji wan re jî bibe alîkar û destegîr) rabe. Ji bo rizgarîya me ji vê bextreşî û belengazîyê serokek, rêberek, padîşahek ji me jî rabe. Xanî piştî ku di malikên borî de behsa perîşanî, belengazî, bextreşî, êş, nexweşî, derd û dixewdemyîna Kurdan dike, di vê malikê de jî behsa çareserîyê dike. Ango çawa derd dîtîye, wisa derman jî dîtîye. Xanî bi awayekî eşkere dibêje; sedema bextreşî, belengazî, bindestî û dixewdemayîna Kurdan nebûna rêbertîya wan e. Xanî di vê malikê de bi daçeka "jî", Rabit ji me "jî" cîhanpenahek", agahîya rewşa civakên din jî ji me re radighîne. Ango çawa ku cîhanpenahên herkesî hene, gelo dibe ku ji me jî cîhanpenahek rabe. Di vir de Xanî rewşa Kurdan û rewşa civakên din dide ber hev û ji ber ku Kurd weke civakên din ne xwedîreber in, axîneke kûr û veşartî dikişîne. Xanî dîyar dike ka bi derketina stêrê re wê geşedanên çawa çêbin û wiha dibêje:

Şûrê hunera me bête danîn

Ya her wehe dê li istiwa bit
Hetta weku dewrê munteha bit?

Yan wê ev rewşa em tê de ku rewşa herî xerab e, heta dinya dewra xwe biqedîne, ango heta dawîya dinyayê wê wiha weke xwe dewam bike? Xanî rewşa Kurdan ewqas xerab dibîne ku ew bixwe jî biguman e, ka wê bextreşîya heyî rabe, yan wê wisa dewam bike. Ji peyama wî tê fêmkirin ku, ka wê ew qanûna xwezayî ya li ser her hebûnê pêk tê, li ser Kurdan jî pêk were yan na, biguman e. Çawa ku tê zanîn di qanûnên xwezayî de guherîn çênabin. Heta dinya heye wê ew qanûn bêguherîn weke xwe li ser her hebûnan pêk werin. Mînak ava germ bibe ku bigihe aştekê wê hilim jê biçe, bigihe sed dereceyî wê bikele. Dereceya wê bigihe sifirê wê bibe qeşa. Ev qanûneke xwezayî ye û guherîn tê de çênabe. Weke her civakê Kurd jî beşek ji xwezayê ne û pêwîst e qanûnên xwezayê li ser wan jî pêk werin. Lê ji ber rewşa wan a pir xerab, di mijara pêkhatina van qanûnan de, Xanî biguman e. Bi pirseke din hem hêvî, hem jî gumanên xwe di malika li jêrê de ji me re dibêje:

Qet mûmkin e ev ji çerxê lewleb
Tali´ bibitin ji bo me kewkeb

Gelo ma qey dibe, ma ji çerxa felekê hîç ev mûmkin e; ku ji bo me stêrek derkeve? Ma dibe ku bextê me vebe, ji me re jî stêra mizgînî û bextewerîyê serê xwe derîne û derî li bext û şansê me vebe? Xanî dîsa balê dikişîne ser rewşa Kurdan a wê demê ya tarî û hêvî û bendewarîya xwe dîyar dike. Li benda stêrekê ye ku derkeve û wan ji wê tarîyê rizgar bike. Ji peyama wî tê fêmkirin ku hem biguman e, hem jî bihêvî ye. Xanî di vir de jî du têgehên girîng bi kar anîne; "Çerxa Lewlebê û Kewkeb". Çerxa felekê çawa ku bi serê xwe bûyereke pir girîng e, her kêlîya gera wê jî bi xwe re bûyereke girîng diafirîne. Çerxa felekê ji bo bûyerên giran û girîng heye û ji bo wan digere. Xanî bi vê têgeha gîring, dixwaze balê bikişîne ser giranî û girîngîya rewşa Kurdan a wê demê. Ango rewşa Kurdan hinde giran e, hinde zehmet e, encex bi çerxa felekê derîyek ji wan re vebe. Bi qasî têgeha "Çerxa felekê", têgeha "Kewkebê" jî ewqas girîng e. Lewre Xanî di vir de çend wateyên giîrng li "Kewkebê" (Stêr), bar kirine. Wateya hêvî û bendewarîyê, wateya ronahîyê û wateya rizgarkirinê. Ango dibêje; pêdivîya me bi ronayîyekê, bi rizgarkerekê heye ku me ji vê rewşa xerab rizgar bike. Ew jî ew e ku çerxa felekê ji me re bibe alîkar û ji bo ku em li ber ronahîya wê pêşîya xwe bibînin, stêrekê ji me re bişîne. Xanî pirs li ser pirsan dike û wiha dibêje:

Bextê me ji bo me ra bibit yar
Carek bibitin ji xwabê hişyar

Gelo ma dibe ku stêrek ji me re derkeve, ew stêr wisa bike ku bextê me ji me re bibe yar û careke tenê be jî em

naskirinê heye, dîyar dibe ku wê demê jî heman pirsgirêk hebûye. Ka wê bextê Kurdan vebe yan venebe, Xanî bi evîn û zanebûnê ve girê dide. Ku dil ronî bibe û zanebûn hebe, tu yê hem kêlîya tu tê de bibînî, hem kêlîyên pişt re. Rewşa wê demê Kurd tê de, Xanî wiha şîrove dike:

Idbara me wa geha kemalê Aya bûye qabilê zewalê?

Bextreşîya me gihaştîye asta herî bilind; belengazîya me gihaştîye jora herî jor; perîşanîya me gihaştîye sînorê dawîyê; bindestî û zordestîya li ser me gihaştine derece û xeleka başî. Gelo dibe ku ev rewşa em tê de biqede? Dibe ku bextê me vebe? Dibe ku em ji vê belengazî, perîşanî, bindestî û zordestîyê rizgar bibin û bi awayekî dilxweş û bextîyar bijîn? Xanî di vir de ji ber rewşa pir xerab a Kurd tê de, dide ber qîran û hawarhawara wî ye.

Xanî di vê malikê de têgehên "Idbar, Kemal û Zewalê" bi kar anîne. Ev sê têgehên pir girîng in. Her têgehek bi serê xwe bi wateyên pir giran hatîye barkirin. Ku ev her sê têgeh, baş bên fêmkirin û şîrovekirin, wê rewşa Kurdan ya wê demê pir baş bê dîtin. Ku rewşa niha ji ya wê demê ne baştir e.

Em werin ser wateya têgehan. "Idbar" peyveke erebî ye; ji bo rewşa herî xerab ya kesekî, yan civakekê ev têgeh bi kar tê û çiqas wateyên rewşa neyînî dîyar dikin, weke bextreşî, perîşanî, belengazî, xizanî, stûxwarî, bindestî û... hwd. lê hatine barkirin. Û Xanî ev têgeh ji bo rewşa Kurdan ya wê demê bi kar anîye. "Kemal" jî peyveke erebîye; van wateyan tevan di hundirê xwe de dihewîne: Jê wirdetir nîne; sînorê dawîyê ye; gihaştîye asta herî jor; jê pêve tişteke bê kirin nemaye; kêmayî tê de nemane. "Zewal" jî peyveke erebî ye û bi wateya tinebûn e. Xanî bi van têgehan balê dikişîne ser vê qanûna xwezayê: Ji bo her hebûnê "Destpêk, Kemal û Zewal" hene. Çi mirov, çi ajel, çi şîntayî; her zîndewer ji cîyekî dest bi jîyanê dike. Piştî re hêdî hêdî mezin dibe heta digihe sînorê xwe yê dawî, ku ew jî "Kemal" e. Piştî hingê, ango piştî gihatina "Kemalê", hêdî hêdî ber bi tinebûnê ango "Zewalê" ve diçe. Ji bo rojê jî em dikarin heman tiştî bêjin. Ji derketina rojê heta avabûnê dibin du dan. Danek ji hilatinê heta digihe nîvê ezmanan, ku jê re tê gotin "Istîwa", ango cîyê "Kemalê" ku em dibêjin cîyê herî bilind. Danê din jî, ji "Istîwayê" heta avabûnê. Piştî ku roj digihe cihê herî "bilind" ango "Istîwayê", êdî ber bi avabûn û tinebûnê ve diçe. Mebest ji tinebûnê windabûna ji ber çavan e. Xanî vê qanûna xwezayî bîr dixe û vê pirsê dike: "Aya bûye qabilê zewalê?" Ango gelo dibe ku "Idbara" me, ev rewşa xerab ya em tê de, ku gihaştîye sînorê xwe yê herî dawî, ango "Kemalê", ji ser me rabe, tine bibe. Ango bigihe "Zewalê"? Cewherê pirsa Xanî ev e: Gelo dibe ku ev qanûna xwezayî; "Destpêk, Kemal û Zewal" ji bo me jî pêk werin? Û bi awayekî biguman pirsa xwe wiha didomîne:



■ Ehmedê Xanî

lê dinêrîya dinya û hebûnên tê de tev didîtin. Mebesta Xanî ji mey û camê evîn û dil in. Xanî dixwaze dilê wî ji evînê tijî bibe, weke cama Cemşîd zelal be û bi wî dilî bikaribe dermanê derdê Kurdan bibîne. Sedema vê daxwazîya wî ya meyê jî ev e:

Da cam bi meyê cehannuma bit Herçî me îrade, tê xuya bit

Da bi alîkarîya wê meyê cîhan xuya bibe û her tişta em dixwazin bibînin, di wê camê de were ber çavên me. Ango heger dilê me bi evîn, zanyarî û hikmeta ji alîyê Xwedê ve ronî bibe, em ê bikarin tiştên em dixwazin di dinyayê de bibînin, xwe bigihînînê. Xanî vê peyamê dide me: Derdên me Kurdan pir in, em pir êşê dikişînin û nexweşîya me nayê dermankirin. Pirsgirêkên me, nexweşîyên me û êş û lawazîyên me tev dîtine. Hem dîtine hem nîşanî me dide. Lê çare jî dîtîye. Çawa ku derd di bedenê de ye, derman jî di bedenê de ye ku ew jî dil e. Bi kurt û cewher wiha dibêje: Heger em dilê xwe bi wê meyê (Zanist, evîn û hikmet) tijî bikin, wê dil hem ronî bibe, hem ronîyê bide. Bi alîkarîya wê ronîyê em ê bikaribin tişta ji me re pêwîst e bibînin. Ango hem derd li cem me ye, hem jî derman. Bi gotineke din, divê em bi çavê xwe bibînin, bi destê xwe derman bikin. Ango divê em xwe bixwe bibin bijîşkê xwe. Sedema xwestina dagirtina camê bi meyê wiha didomîne:

Da keşf bibin li ber me ehwal Kanê dibitin muyesser iqbal?

Hem da rewşa sergirtî ya em tê de eşkere bibe û li ber çavan bê dîtin. Heger wisa bibe em ê bikaribin bibînin ka paşroja me ronahî ye yan tarî ye, wê bextê me yê girtî vebe yan na. Xanî di vir de balê dikişîne ser xaleke girîng û peyameke wiha dide: Haya Kurdan ji rewşa wan ya bindestîyê nîne, haya wan ji nexwşîya wan nîne. Ji ber wê li derman jî nagerin. Ev jî tê wateya ku Kurd wê demê jî di xefleteke pir mezin de bûn. Lewre ji wê xefletê mezintir nîne ku nexweş nizanibe ew nexweş e. Ji ber wê bi awayekî eşkere dibêje; "Da keşf bibin li ber me ehwal." Ango da em hem xwe nas bikin, hem derdê xwe. Çawa ku niha pirsgirêka xwe-

Xanî û Welatperwerî

Xanî Hem Derdê Kurdan Nas Kirîye, Hem Jî Derman Dîtîye



Xanî bi awayekî eşkere dibêje; sedema bextreşî, belengazî, bindestî û dixewdemayîna Kurdan nebûna rêbertîya wan e.

Diyar Bohtî

Lêkolîn

Her cara mirov Mem û Zîn´a Ehmedê Xanî dixwîne, peyamên di carên pêşî de nehatin dîtin, çawa ku nû bê xwendin, mirov peyamên nû û pir girîng dibîne. Xaleke din a bala mirov dikişîne, hema hema ji bo her qada jîyanê peyamên eşkere û sergirtî dane. Di hejmara berî niha de, min nêrîna Xanî ya li ser desthilatdarîyê nivîsîbû. Di vê hejmarê de dixwazim li ser neteweparêzî û welatperwerîya wî rawestim. Xanî li ser derd û dermanê Kurdan bi rêya meyger alîkarîyê ji Xwedê dixwaze. Wiha dibêje:

Saqî, tu ji boy Xwedê kerem ke
Yek cureyê mey di camê cem ke

Meyger, ji bo xatirê Xwedê qencîyekê bi min bike û qurtek mey berde Cama (Peyal) Cemî (Şahê Îranê yê bi navê Cemşîd). Dibêjin, cameke şahê Îranê Keyxusro hebûye, dema

Derhêner Ganî Rizgar û derhêner Hakan Gurtep filmê bi navê Çavên Min Ehmed, ev filim li ser jîyana hunermendê nemir Ehmed Kaya çêkirin, lê piştî wan xilas kirin û karê weşandina wî kirin, lê malbata wî bi mehaneya ku destûr ji wan nehatîye xwestin û agahîyên wan tenê ji Google in û ne rast in, li dadgehê gilih kirin û nemayeşeya film rawestandin.

Di dawî de, Xwînerên xoşewîst: Kurdên me gotine: Giya di bin keviran de namîne, lewma çiqas stemkarîya Rêjîmên dagirker li ser gelê kurd hebe jî, ew nikarin bigihêjin armancên xwe yên tunekirina çand û neteweya kurd, ji ber ku ew war e, lê ne ew Bihar e, ew di kiryarên xwe yên dijî gelê kurd bi taybetî hunera kurdî de bi ser nakevin. Ji ber ku bi sedan filmên kurdî êdî ronîyê dibînin û tevlî mehrîcanan dibin. Ew jî bi saya jîrekîtîya xwezayî ya gelê kurd e û xebatkarên dilsoz ên di beşa Sînemaya Kurdî de dixebitin.

Hêjano: Filmên kurdî ji yên me nivîsandî pir bêhtir in û beşdarîya wan di mehrîcanan de jî bêhtir e, lewma dema me hinek ji bîr kiribin, em lêborînê ji wan dixwazin, ji ber keda wan hertim dimîne pîroz. Mebesta me ji vê mijarê em hinekî şopa sînemaya xwe ya kurdî bigirin û nas bikin, li gor dem û salan bi rêbazî û bi mînakan, ji bo em rewşa wê hinekî nas bikin.

Jêder:

Rûpela fêsbûkê ya KOMÎNA FILM A ROJAVA
Malpera Sînema Kurdî.
Malpera Bas Filim.
Rûpela fêsbûkê ya Ronahî tv.
Rûpela fêsbûkê ya Rûdaw tv
Rûpela fêsbûkê ya K24tv.
Mlpera El-Mihwer El-Mûtemedin.
Malpera E-Alalem.
Malpera El-Beyan- gotareke nivîskar Hewas Mihemed.
Malpera El-Eyîn a nûçeyan- gotara Seîd Ebû Miela.
Pirtûka Elsînema Elkurdiya ya Ibrahîm Hac Ebdê.
Malpera Durer Eliraq.
Pirtûka Medxel îla elsînema elkurdiya ya nivîskar û rexneger Burhan Elşawî

ji ber ku ew li ser sê jinên YPJ ne yên ku li Kobanê berxwedan dikirin dijî Daişê) û yên derhêner Kazim Oz mîna filmê Bîr û Kongreya Niştimanî.

Li Rojavayê Kurdistanê; Desteya Çandê Komîna Filman saz kirîye. bi xebateke balkêş radibe, hejmarek ji filman çêkirîye,bo mînak filmê Ji bo Azdîyê û filmê Darên Bitenê.

Li herêmên Rêvebirîya Xweser, li gundên Senceqa Sadûn derhêner Şêro Hindî digerîya û film ji zarokan re nemayeşe dikirin, ne yên Kurdî bûn. Lê belê ew derhênerekî Kurd e û wî filmên kurdî yên mîna Çîrokên Bajarên Wêrankirî û yê Sûr çêkirin

Sala 2012z Li Dihokê, Li Başûrê Kurdistanê Mehrîcana Filmên Kurdî hate lidarxistin. Bi dehan filmên kurdî lê hatin pêşandan. Derhêner Şewket Emîn Kurkî filmê Bîranînê Neqişandî Li Ser kevir derhênand.

2013z Mehrîcana Filmên Kurdî li dewleta SIWÊDÊ bi (13) filman li dar ket.

2014z di Mehrîcana Ebû Zebî de filmê kurdî yê bi navê Bîranînên Neqişandî li Ser Kevir ê Derhêner Şewket Emîn Kurkî xelata yekemîn stand.

2016z derhêner Xemgîn Salih filmê Yê Nizane Baqê Nîska ye çêkir. Di wê salê de li Qamişlo Hefteya Sînemaya Kurdî hate lidarxistin ji (50) filmên kurdî û erebî. Ji wan ên derhênerên mîna: Huner Selîm, Mihemed Evdilezîz û Behmen Qubadî bûn.

Filmê bi navê (A157) yê keçikên Êzdî di destên Daişê de, yê derhênerê kurd ê ji Rojhilatê Kurdistanê, Behroz Nûranî di Mehrîcana Fecir de li Îranê xelata yekemîn stand.

Li Hewlêrê 2017z Mehrîcana Kurdistanê ya Filmên Kurdî hate lidarxistin (46) film tê de beşdar bûn.

Li Enqerê 2017z mehrîcaneke navdewletî ya filman li dar ket, nêzîkî (20) filmên kurt û dirêj ên kurdî tê de beşdar bûn, yek ji wan filman; filmê bi navê Reûf ê derhêner Soner Caner û derhêner Bariş Yilmaz bûn, yê li ser stemkarî û qirkirina Rêjîma tirk ji kurdan re.

Çêkirina Sînemaya Kurdî bi derbasbûna demê re berdewam e. Derhêner Teymûr Evdik li sala 2018z filmê Li Paş Mala me derhênand.

Ji Rojhilatê Kurdistanê, derhêner Saman Hisênpor ê ji bajarê Seqizê, di Mehrîcana Şeşem a Film û Muzîkê de li Îtalyayê xelata baştirîn film, li ser filmê xwe yê bi navê Himbêza Dawîyê bi dest xist.

2019z Mehrîcana Yekem a Filmên Kurdî li Parîsê (FFKP) çêbû (19) filmên kurdî hatin pêşkêşkirin.

Filmê herî vê dawîyê yê ku li ser jîyana berxwedana gelê kurd bû ê hate weşandin, filmê derhênera Fransizî Karolîna Forst ê bi navê Xwîşkên Çek bû.

Li Stembolê Sazîya Mezopotamîya ya Sînemayê, ji 6 ta 10-3-2020z Mehrîcana Yekem a Filmên Kurdî li dar xist. (30) filmên ku derhênerên wan kurd tê de beşdar bûn, ji wan: Hisên Tabak, Hisên Hesen (Ev derhêner bi filmê Reşeba beşdar bû).

hêner Huner Selîm. Filmê Badê Li Ser Me Bigrî yê Derhêner Kazim Oz hatin çêkirin û sala 2000z Filmê Textê Reş yê Derhênera Kurd a ji Rojhilat Semîra Mexalbav hate çêkirin.

Sala 2002z Mehrîcana Filmên Kurdî li Berlînê paytexta Elmanîyayê li dar dikeve. Tê de gelek filmên kurdî mîna Qeştel ê derhêner Mihemed Ektaş û Polend Kuçuk hatin pêşandan.

Derhêner Hanan Îpekçî sala 2002z li ser qedexekirina zimanê kurdî li Tirkîyê filmê bi navê Hejar – Mêrê Mezin, Evîna Piçûk derhênand. Filmê Qevdek Gîya yê Derhêner Roland Soso Rêtşer, filmê Awaza Dayîka Niştiman ê Behmen Qubadî wê demê bûn ji berhemên Sînemaya Kurdî.

Piştî salên 2003z li Başûrê Kirdistanê Sînemaya Kurdî di qonaxeke berhemdar re derbas bû. Gelek film çêbûn, ji wan filman; filmê Jîyan ê derhêner Cano Rojbeyanî, filmê Tonêl ê derhêner Mihdî Omîd, filmê Entêna yê derhêner Ednan Osman, filmê Dîwar ê derhêner Tehsîn Fayiq, filmê Tirawma yê derhênera jin Ciwana Sêîd, filmê Rihan ê derhêner Tenya Kerîm û filmê Kargeha Revandinê yê derhêner Rêvîn Seîd. Hêjayî gotinê ye ku em bibêjin derhênerê kurd ê misrî yê navdar Ehmed Bedirxan behsa çêkirina wî ji filmekî re li ser jîyana Seydayê Berzanî dikir, bi lehengîya Ûmer Şerîf, lê me ta niha tiştek li ser weşandina wî nebihîstîye.

Li Londonê paytxta Birîtanîyayê mehrîcana Sînemaya Kurdî 2007z li dar ket. Bihtirî ji (100) filmên Kurdî lê hatin nemayeşekirin, ji wan Erdê



■ Derhêner Behmen Qubadî

Zivistanê yê Derhêner Hîşam Zeman, filmê Kursî yê Derhêner Keya Ezîz, filmê Derbasbûna Tozê yê derhêner şewket Emîn Kurkî û filmê Miletê Tawis ê derhêner Binefiza Bêrîvan.

Di mehrîcana Xelîc a sîyem de 2010z filmê kurdî yê bi navê Derbeya Yekem ê derhêner Şewket Emîn Kurkî xelata yekemîn bi dest xist.

Bi derbasbûna demê re û hebûna heyberan û hinek ji azadîyê û bi pêşketina zanista sînemayî bi kurdan re, sînemaya wan jî pêş ket û filmên wan pir bûn. Derhêner Selîm Ûmer Xelîfê filmên: Zagros, Erdê Mêrxasan, Mêsîyê Bexdadê 2012z û hineke din ên kurt lê çêkirin û derhêner Ekrem Heydo 2011z filmê Helebçe derhênand û derhêner Gerzan Qadir filmê Bêkes derhênand.

Gelek filmên Kurdî di wê qonaxê de çêbûn, ji wan ên derhêner Çayan Dêmerêl û yên Weysî Atlî (Jîyana Nû. Lê Rêjîma Tirk nehişt were pêşandan,

■ Derhêner Yilmaz Guney

D. Kerîm Daxistanî û komek ji dostên wî mîna Mano Xelîl û Ekrem Heydo. Di wan derfetên zehmet û xebata nepenî de û bi dizî. Lê piştî film xilas jî bû sîxurê Rêjîmê pê hesîn û dane pey xebatkarên film bi lêpirsîn û zextan, ku di encama stemkarî û pêstûrîya zêde de wan filmê xwe şewitand.

Li Rojhilatê Kurdistanê Sînemaya Kurdî qonaxeke serkeftî tomar kir, bi taybetî li ser destên Derhêner Behmen Qubadî ji salên 1990z û pê de, wî hejmerek ji filman derhênandîye, ji wan filmê Gulbajî. Hejmara filmên ku wî derhênandin giha (21) filman. Em dikarin bibêjin ku filmê herî navdar ji wan;filmê Kosî jî Dikarin Bifrin.

Li Başûrê Kurdistanê rewşa azadîyê bi raperînê re hate guhartin û ber bi başîyê ve çû, lewre Sînemaya Kurdî jî gavin avêtin. Derhêner Huner Selîm 1992z filmê Azadî bo Kurdistanê derhênand û filmê Kîlomêtre Zîro jî.

Sala 1992z Hunermend Nîzamedîn Ariç ê ji Bakurê Kurdistanê ye, filmê Kilamek ji bo Beko çêkir.

Derhêner Xelîl Dax filmê Bêrîtan derhênand. Ew şervana azadîyê, ya ku ji bo nekeve destên dagirkeran de xwe ji çîyê de avêt û gihaşte asta pakrewanîyê.

Sînemaya Kurdî bi wê derfeta xwe ya zehmet û kêm jî di naveroka xwe de pisporî û cureyî bi kar tanî. Lewre di gelek mehrîcanên herêmî û navdewletî de jî beşdar bûye û xelat jî bi dest xistine. Filmê bi navê Seîd Efendî yê derhêner Kamîran Hisnî yê sala 1956 z di mehrîcanê Laybizgê de di sala 1992z de beşdar bû.

Li Qahîrayê paytexta Misrê mehrîcana filmên kurdî hate lidarxistin û tê de jî gelek filmên kurdî hatin nemayeşekirin.

Derhêner Ciwan Bamirnî piştî sala 1994z de filmên Girdê Pîroz (Girê Pîroz) û filmê bi navê We ji Bîr Nekim û filmine din derhênandin.

Derhêner Enwer Sindî filmê Berbanga Zû çêkir û pê xelat standin. Derhêner Birahîm Selam Filmê Rêwîtîya Bêdengê hilberandin.

1997z filmê Rêwîtîya berbiroj ê Derhêner Yeşim Usawgilo. Filmê Bijî Buk û Rizgarîya Kurdistanê yê Der-

giring bibînin:

Heger ji alîyê demê ve em Sînemaya Kurdî bidine ber a cîhanî û em bibêjin dereng hatîye, lê dema ku ew lê peyda bûye demeke dûr e û nenêzîk e, ji ber ew berîya sed salekê ye. Ev dem ji gelekî weke gelê Kurd bindest re, pir binirx e.

Cara yekem û bi şêweyê fermî li ser destên derhênerê Ermenî (Jêderine dibêjin ku ew kurd e) Hamo Nezarîyan bû, dema bi kamereya xwe re li nav gundên kurdan ên li Ermenistanê yên herêma çîyayê ALEGEZÊ (ARAKSÊ) digerîya û filmê bi navê Zerê di sala 1926z de çêkir, li ser evîna keçeke êzdî ya navê wê ZERÊ bû, dema wê û xortê bi navê Seydo ji hev hez dikrin, lê mêrikê zemîndar û têr Teymûr dibû asteng di navbera wan de û dixwest ZERÊ ji xw re bibe.

Weke em dizanin ku li Ermenistanê çanda kurdî di qonaxine balkêş û pêşketî re derbas bûye, lewra sala 1930z derhêner Amîl Lodwing ev filmên kurdî hilberandin: Selahedîn, Mem û Zîn, Xanê dimdim û Sîyabendê Silêvî.

Em dikarin bibêjin Sînemaya Kurdî mîna raperînekê pêk hat di salên şêstî de, ji çerxa bîstan, çimkî wê gavên serkeftî avêtin. Derhêner Kamîran Hisnî 1956 z filmê Seîd Efendî çêkir. Raperîna Sînemaya Kurdî bêhtir disala 1957z dedeng veda, piştre li ser destên derhêner, nivîskar, sînarist û şanogerê nemir Yilmaz Guney, li Bakurê Kurdistanê yê ku bihtir ji (110) filman hilberandin. Ji wan: Rê, Kerî û Omîd. Li Tirkîyê û Cîhanê (17) xelat standin, ji wan xelatan Çiqlê Zêrîn li mehrecana KAN li Parîsê 1982z. Wî gelek filmên xwe di zindanê de çêdikirin û rê dikirin ji hevrêyên xwe re yên ji derveyî zindanê û wan pêk tanîn. Ji ber ku ew ji kesên gewre ye di cîhanê de, lewma dema çû ser dilovanîya Xweda, cendekê wî li goristana Şarilpas (Gewreyan) li Parîsê hat veşartin. Şanogerê navdar ê li Tirkîyê Cinêd Erken dibêje: Carekê xelata yekemîn a şanogerîyê li ser asta Tirkîyê bû para Yilmaz Guney, lê rêjîmê nedayê. Da min, lê ji ber ku min ew xelat layîqî dostê xwe yê ku me pevre jîyan kirî ango Yilmaz Guney dît, min ew xelat negirt.

Ya balkêş em dibînin ku çanda kurdî bi giştî û Sînemaya Kurdî bi taybetî li derveyî Kurdistanê bêhtir pêş ketîye, ji ber pir astengî jê re hebûn û cara ku di hundirê Kurdistanê de be jî, bo mînak Filmên nemir Yilmaz Guney ew ne bi zimanê kurdî bûn. Lewma li derve bûn, nexasim li Yekîtîya Sovyêt a ku di sala 1975z de sê belgefilmên kurdî hatin berhemdayîn: Em Miletî ne, Em Kurd in û Kurdên Ermensitanê.

Sînemaya Kurdî bi gavan ber bi avakirina xwe ve diçû. Derhêner Memdûh Yon zîp romana nivîskar Yeşar Kemal a bi navê Efsaneya Çîyayê Agirî kire filmek. Piştî wê bi salekê Derhêner Bêlkî Olcak filmê Rojek Dê werê, derhênand. Di sala 1982z derhêner Êrol Kiral filmê Demsalek li Colemêrgê çêkir kir.

Li Serê Kanîyê, li Rojava sala 1985z hewildanek çêbû ku cara yekem bû filmekî kurdî ronî dît li ser destên

Kurtedîroka Sînemaya Kurdî



Çanda kurdî bi giştî û Sînemaya Kurdî bi taybetî li derveyî Kurdistanê bêhtir pêş ketîye, ji ber pir astengî jê re hebûn û cara ku di hundirê Kurdistanê de be jî, bo mînak Filmên nemir Yilmaz Guney ew ne bi zimanê Kurdî bûn.

Biradostê Mîtanî

Lêkolîn

Sînemaya Kurdî jî weke beşek ji çanda kurdî ya ku kesayeta kurdî ava dike ketîye bin feraşên stemkarîya dagirkeran de, ji ber ku wan dagirkeran netweya kurdî serkut dikir. Wilo jî çanda kurdî bi giştî û sînemaya wê bi taybetî di bin wê stemkarîyê re derbas bû û çêkirina filman qedexe bû. Lewre gelek xebatkarên wê di zehmetî û astengîyan re derbas dibûn, diketin zindanan, amûrên wan dihatin şikandin û piştî ku wan bi zehmetî û derfetên teng û aborîya lawaz film çêdikirin, qedexe dibûn ku werin pêşandan û gelek caran ji mehrîcanan jî dûr dixistin.

Çawa gelê kurd li ber xwe daye û bi vîna xwe ya xurt xwe gihandîye vê qonaxa şaristanîyê, di heman demê de jî sînemaya kurdî li ber xwe daye. Çiqas kêmayî di pêşeketina wê de hebe jî dema ku em wê bidin ber a welatên rizgar bûyî, lê dêsa jî ew xwedî hebûneke balkêş e, ta radeyekê gavên pîroz avêtine. Dema em wê bişopînin em ê van qonaxên wê yên



■ **Çand û Huner û Sînema**

Wladimir Mayakovskî dibeje ‘îro çavên sînema bi tozên zêr kor dibe. Ji ber ku wexta sînema tê gotin piranî milê wê yê madî, teknîkî, gişe, hest û popûlûzmaka kesayetê de pêş dixe dikeve pêşîyê; huner, lêgerîna heqîqtê û manwîyata ku di civakê de ava dike. Divê di vî milî de têgihîştineke hunerî û bîrdozî hebe. Wek perçeyekî lêgerîna heqîqetê huner û hunermed jî bê bîrdozî û ji rastîya civaka xwe dûr nîn e. Ketina bin bandora pergala kapîtalîzmê hunermendên sînemager ji rastîyê dûr dixe. hunermendên ku xwe negihandibe wê têgihiştinê, rastîya nebînin yan jî di bin navê hunerê de dibin weke neferek kapîtalîzmê û li dijî civakê rastîyê manupule dikin. Sedema esas jî ya ku dihêle gelek berhem ji milê cîvakê de encama xwe nagrin ev e.

Pêwîst e sînamagerên modernîteya demokratîk beramberî modernîteya kapîtalîst a ku çanda resen, jiyana xwezayî û exlaqa cîvakê asmîle û tûne dike; berhemên hunerî yên ku çanda xwe pêş dixe, dibe perçeyekî civakê û xwe gihandina heqîqetê rola xwe bilîze û biafirînin. Wek civaka giştî û gelê kurd ku bi sedan sal di gelek milan de ji pergalê derbeyên giran xwarine. Lê belê wek hunera heftemîn sînema dikare bi bondora xwe ya efsûnî gelek birînan derman bike û bandora bi sedan sal ji holê rake, Bi berhemên xwe dikare di avakirina modernîteya demokratîk de rola xwe bilîze û bandora polîtîkayên asmîlasyonê û qirkirinê ji holê rake.

li ser vî easasî bi bandora sînemaya efsûnî, bi awayekî etîk û estetîk xebitandin berbipsiyerîya hemû sînamageran e.

û hunera xwe ye. yê ku çanda xwe bi hunerê nexemilîne, bi çandeke din xwe dihelîne.

Mînak di serdema navîn de çawa ku sedema pêşketina Ewropa; ronesans (vejîn) ango pêşketina huner û zanistê be; di heman deme de sedema paşveçûna Rojhilata Navîn a ku berê di gelek mijaran de li pêşîya Ewropayê bû, ji dûrketina huner û zanistê ye. Ronesans ango ji nû ve dayîkbûn, tê wateya ji nû ve gihştina hunerê, ji nû ve gihiştina feraseta azad e. Hunermendên demê xeterîya heyî didîtin, civak her roj hîn zêdetir ber bi tunebûnê ve diçû. Li ser vî esasî pêşketina civakê di çûyîna hêza afirandina hunera berê de didîtin. Çûyîna Dema Roma û taybetî jî Yewnana kevn. Armanc xwe gihandina asta vê demê bû. Berevajî vê, Rojhilata navîn a ku berê (huner jî di nav de) û di her mijarê de li pêşîya ewropa bû, îro eqsê vê girtina derîyê îçtîhatê(pêşketin, nûbûyîn) bû sedema qirkirina hunerê û paşveçunê. Niha jî tevî ewqas cewher û çavkanîyan jî di milê hunerî de xelayê dijî.

ji wê xelayê gelê Kurd jî para xwe girt. Her çiqas gelê Kurd di her demê de bi hunerê re di nav hev de bû jî, ew piranî bi hunera gotinê ve sînordar mabû. Gelek berhemên hêja yên nîvîskî kêm be jî xwe gihandin roja îro. Ji alîyekî de perçeyekî Rojhilata Navîn bûyîn, JI alîyê din de jî êrîşên netewdewletan a şli ser çanda kurdîstanî her çiqa pêketina hunerê sînordar kiribe jî, ji ber sedema xurtbûna çand û hafîzeya hunêrê ya cîvakî bi ser neket.

Her çiqas ji ber asmîlasyon, qirkirin, sînor û... hwd. Di milê afrînerîya gelek beşên hunerî de astengî hatibe jiyîn jî, îro di Rojhilata Navîn de gelê Kurd di milê zanist, felsefe û hunerê de dema xwe ya herî pîroz dijî, hişmendîya hunera ku bi şoreşê re asoya wî firah dibe, derîyê gelek pêşketinan vedike. Ew girêdayî têkoşîna azadîyê, avakirina feraseta gelê azad û kesayeta azad e. Ango bi paradîgma serokatî gelê Kurd başî, xweşî û rastî çiye têdigihêje. Çawa ku têkoşîna azadîyê bi paradîgma xwe milê siyasî û leşkerî de di Rojhilata Navîn de balê dikşîne ser xwe û ji bo civakan rola peşengtîyê dilîze, ev derfet weke perêyekî heqîqetê di beşa hunerê de jî heye. Lewre di navbera azadî û hunerê de têkilîyeke kûr heye. Yê ku azadîyê baş fêm bike û bide fêmkirin huner û hunermend in. Li ser vê bingehê divê di hemû beşên hunerê de (şano, muzîk, wêne û... hwd) hunermendên xurt derkevin û ew rastiyê, dîrok û têkoşîna gelê xwe bi hêza etîk û estetîk bînin ziman.

Di roja îroyîn de hunera heftemîn ango Sînema pêwîst ebi awayekî taybet û xurt li ser bê sekinandin. him weke gelê Kurd dereng naskirina sînema him jî ji ber ku sînema îro hunera ku herî bilez xwe digihîne gerdûnê ye û xwe belav dike, divê girîngî û guhdaneke taybet jê re bê dayîn.

Sînema ku gelek beşên hunerê di nav xwe de dihewîne, di sedsala 21'ê de beşa herî bandorker e. Wisa ye ku pergala kapîtalîzmê bi taybetî li ser beşa sînema disekine wek sektorek lîstina bi mejîyê civakê bikartîne.

Çand û Huner û Sînema

sînema dikare bi bondora xwe ya efsûnî gelek birînan derman bike û bandora bi sedan sal ji holê rake...

Andok Serdem

Weke tê zanîn gelek rêbazên şîrovekirina heqîqetê hene. Huner jî yek ji wan e. Tişta ku hunerê ji rêbazên din cuda dike; di nirxandin û anîna ziman a heqîqetê de lêgerîna estetîk e, ango bandora bedewîyê ye. Gelek caran sedema têkçûn an jî bê bandor mayîna tekoşînê, yek ji sedema xwe ji asoya hunerê dûr ketin an jî hunerê weke beşeke tekoşînê nedîtin e. Serokatî dibeje: 'Hûnermendekî rast, dikare rastîya min sed qet ji min baştir bîne ziman.' Lewre hunermend sir û manewîyeta ku dibin madîyatê de veşartî ye derdixe holê û derveyî elimandinê bandorê tîne ziman .

Dibêjin sedsala 21'ê sedsala çand û hunerê ye. Lewre yê ku civak an jî neteweyan ser lingan dihêle û wan dighîne paşerojê, têgihiştina giranî û bandora hunerê ye. Kîjan civak di çand û hunera xwe de pêşketî be ew ê xwe belav bike, bide qebûlkirin û xwe bighîne paşerojê. Ji xwe tê zanîn ku her sal gelek ziman û çand ji holê radibin. Bêguman ew alîyekî polîtîkaya modernîteya kapîtalîst e, ji alîyê din ve jî têgihiştina civakê ya beramberî çand

Piştî Sed Salî Sînema Li Ku Ye?

Îro roj sînema li mala me her kesî heye, em dikarin bi laptopekê an jî telefoneke girêdayî xeta înternêtê li Filmên salê temaşe bikin, piştî wê jî hemû nirxandinên ku li ser Film hatine kirin bixwînin û bi qehremanê Film re jî bibin heval li ser facbookê. Ji bo vê mijarê du nerînên cuda hene, yek dibêje ku sînema bê nirx bûye û ji asta hunereke qedirbilind dakatîye, tu wate ji Film re tune ye heger tu neçî salona sînemayê û li ber perdeya spî tamaşe nekî. Nerîna din dibêje ku sînema hunereke di dest tebeqeyeke taybet de bû ji civakan, lê aniha di destê her kesî de heye û her kes dikare bi vê hunerê şa bibe. Her nerînek jî ji bo ya din navek dîtîye, kesê ku piştgirîya sînemaya li malê dikin, ji yên din re dibêjin bircwaza nû ya ku nizane xwe di ku di bi cih bike di pêşveçûnê de ji ber wê jî xwe di ber hunerê re dike, yên ku piştgirîya sînemaya salonan dikin ji yên din re dibêjin tembelên ku ji bo wan kîsekî çîps û Filmek weke hevin.

Ji Bo Kurdan Sînema Li Ku Ye?

Ev pirseke ku her ji bala min naçe, miletekî ku heqê xwe nestend ku di salonan de li Filman temaşe bike, heta roja îro jî yek salona me tune ye, înternêt derfeteke mezin da me ku em li malên xwe li Filman binerin û vê hunerê nas bikin, lê gelo tamaşekirina Filman li ber perda spî li salonekê ew ê ne weke sihrekê be? Lê heger me jîyan nekiribr em nikarin beşdarî vê nîqaşa ku ji bo me bê wate ye bibin.

Ya herî ku merev xemgîn dike ne şêweyê ku sînema pê tê nîşandan e, lê ew e ku ev huner di destên dezgehên baziragniyê û bazirganan de ma ye, ji bo ku sînemager Filmekî çêbike hewce dike ku pereyan ji van dezgehan bistîne, ji bo ku dezgeh pereyan bidin pêwîst e ku çîrok li gor sîyaseta wan be, reklamê ji wan re bike. Ev xemgînî li vir naqede, piştî ku Film qedîya ji bo ku di festîvalan de bê qebûlkirin hewce dike ku tu stêrk bî yan jî têkilîyên te yên xurt di vê bazarê de hebin, her wiha divê ku Filmê te tu mijarên ne li gor dilê vê bazarê bide nîşandan, pêvajoya bikaranîna vê hunerê di bazarê de pir dirêj e û însanan xemgîn dike, lê dîsa jî gava ku em li hejmara Filmên baş yên ku di qadên mezin de nehatine pêşandan bibînin, ev tê wateya sînemagerên ku qebûl nakin di bazarê de bin pir in. Bi tenê qadeke ku bikaribe wan hemûyan himbêz bike hewce dike, lê ev hunera bedew a ku dikarîbû şoreşan çêbike dikare sînemageran jî himbêz bike, biparêze û bi filan jîyanê xweştir bike.

çêke, hemû bi hev re jî nikarin bêyî senaryo Filmekî çêkin. Zencîreke dirêj ji karan ji bo yek Filmî hewce dike, qelsbûnek di yek xelekê de hebe tevahîya Film qels dike, her wiha xurtbûna beşekê hemû Film xurt dike, di her xelekeke vî karî de hunermendek hewce dike û ew hunermend jî dikare di beşa xwe de biqasî hêza xwe afrîner be. Lê çima stêrkên sînemayê çêdibin? Navên mezin yên derhêner û lîstikvana ne? Ev ji ber medyaya nû ye, ji ber ku ewqasî medya û qadên nîşandana Filman di nava sîstemê de kûr bûne, êdî naxwazin her kesî ku kar kirîye bibînin. Dixwazin yekî bidin pêş û bikin stêrk û bi civakê jî bidin hezkirin, heger hewce bike jî wêneyê wan li ser parfûn û erebeyan jî bixin da ku di mejîyê me de stêrkbûyina wan biçînin.

Sînema Dikare Çi Rolê Bilîza Li Ser Asta Şexsî Yan Jî Li Ser Asta Civakê?

Ji ber ku sînema çîrokan ji jîyana me ji me re dide nîşandan, têkilîyeke sînema ya girîng bi sosyolojî û saykoljîya civakê re heye, her wiha çîrok bi rewşa sîyasî, ekonomî û oldarî ya dem û cihê ku Film tê de hatîye çêkirin bandor dibe, ji ber van rasteqînan hemûyan weke ku Film bi derdora xwe bandor dibe dikare bi eynê astê yan jî asteke bilindtir bandorê li kesan û civakan bike.

Mînak: Keçeke heft salî ya ku li afrîkayê dijî, ji ber xwezayê helbete ew ê çerm reş be, ji ber feqîrîya civaka li wir helbete wê birçî û nexweş be, ji ber rewşa sîyasî û çekdarî helbete ew ê keçik di bin xetereya kuştina hêzên çekdar be. Li vir karakter ji derdorê hate afrandin, lê bi çîroka vê karakterê ez çawa dikarim bandorê bikim, heger bixwazim bandorê li civakeke rojavayê dunyayê bikim ez ê wê ji ber birçîbûnê bikujim, miletê Rojava ew ê dest pê bike alîkarîyê ji welatên afrîkyayê re bişîne, heger bixwazim bandorê li sîyasta navneteweyî bikim ez ê wê keçikê bi êrîşeke çekdar bikujim, heger bixwazim bandorê li keçikên wê civakê bikim ez ê bihêlim ku karaktera min 7 salên din jî li ber xwe bide û jîyan bike, piştre jî bihêlim ku li hember vê rewşê derkeve, ez ê wê bikim mînakek ku hemû gel bixwaze weke wê be û di dawîyê de bihêlim ku bi serbikeve, da ku hêvîyê li cem gelê wê çêbikim ku ew dikarin bi serbikevin. Ev mînakeke piçûk û sade bû, Film li gor asta xwe dikare bandorên pir mezin an jî piçûk bike, heger em vegerin dîroka sînemayê em dikarin mînakên mezin bibînin.

Filmên Ayzeyniştayn bandor li hemû Rûsyayê kir bi dîmeneke li ser pêlekanê bajarê Awdîsa her wiha mînak pir in û nayên jimartin.

Beşên Filman bi derbasbûna demê re her zêdetir dibe, heger di Filmê yekê de me tenê xebatkarê ji trênê derdikevin dîtin, aniha cureyên Filman ji hijmara wan xebatkaran zêdetir bûye, ji bo her cureyekê jî tamaşevanên wê yên taybet çêbûne. Filma ku rojekê dîmen bi dîmen ji Filma 18mm dihate qutkirin û dîsa bihevekirin îro dîmen di hundirê kompîterê de tê amadekirin û montaj kirin, lê dîsa jî sînema dimîne ew hunera ku hestên te tevlihev dike, gava ku bixwaze te dike xwedî biryar der heqê jîyana xwe de, di heman demê de dikare te bê biryar bihêle.

her wêneyekî ku çav dibîne, an dengekî ku guh dibihîze dike mijara Filmekî nû, her tevgereke zindî ku bala sînemager bikşîne dikare bibe mijareke li ser rûpelan ku dîsa di Filmekî de were jiyîn, her çiqas ne weke rastîyê be jî, lê weke xeyalê çêkerê Film bixwe be.

Gava ku çalakî ji rastîyê derdikeve û dikeve Filmekî, êdî dibe milkê sînemager û dikare bi şêweyê ku dixwaze ji nû ve li ser ekranê zindî bike. Her axaftinek dibe dîyalogek di hundirê Film de û her kesê ku di jîyana sînemager de derbas dibe dikare bibe karektereke sereke di Film de. Ji bo sînemayê sînor tune ye, her wiha jîyan kanîyeke bê dawî ye ji bo afriandina Filman.

Rast e ku sînema her şeş hunerên din di hundirê xwe de himbêz kirîye, ew her heft huner di senaryo de dest pê dikin û bi Filmekî li ser perdeya spî diqedin, her neheqîyeke ku li wan huneran bê kirin, asta filim ya hunerî kêm dibe û nayê hezkirin, ji ber wê jî Filmê baş hewce dike ku weke sihir be, bizanibe çawa bandorê li ser hemû hestên însanan bike. Filmekî baş dikare jîyana te bigre dest, baş bihûne û nîşanî te bide, ew Film ji jîyana te zêdetir dikare bandorê li te bike.

Çima? ji ber ku jîyana me pir qerebalix e û gelek çalakî di rojekê bi tenê de bi mere derbas dibin

Gelek caran em li jîyana xwe bi giştî vedigerin, lê pir tişt bala me nakşînin, lê Film ji jîyana te xaleke sereke ya ku te jî nedîtîya radike û li ser esasê wê xalê çîroka te dibêje. Di tevlihevîya mejîyê te de winda nabe, lê xalên girîng û bi bandor dikare bibîne.

Çêkirina Filman:

piştî karê kolandina ji bo fehmê, tê gotin ku sînema karê herî zehmet e, tevlî vê gotinê nabim ne ji ber ku çêkirina Filman ne hêsan e, lê ji ber ku herdu kar pir cuda ne sînema karekî hunerî ye û kesên di sînemayê de kar dikin bi arzû dikin.

Çêkirina Filman proseseke pir dem dirêj e, lê xebata herî komînal e ku însan bikaribe tevlê bibe, deng bêyî kamera nikare Filmekî çêke her wiha kamêra jî bê ronahî nikare, ronahî jî bê dekor nikare Filmekî

Hunera Heftemîn

Ji ber ku sînema çîrokan ji jîyana me ji me re dide nîşandan, têkilîyeke sînema ya girîng bi sosyolojî û saykoljîya civakê re heye..

Safînaz Evdikê

Sînema, ango hunera heftemîn, hunera herî piçûk e di malbata xwe de, lê ya ku her şeş hunerên din jî di hundirê xwe de himbêz dike. her çiqas zêdeyî sed salî ser çêkirina filman re derbas bûye, lê dîsa jî kevn nebûye û di hemû civakan de tê xwestin û hezkirin, salane bi hezarên Filman tên çêkirin û li seranserê dunyayê jî bi hezaran salonên sînemayê hene, li her welatekî jî gelek festîvalên sînemayê ji her hunerê zêdetir hene.

Sînema hunera ku derbasî her malekê bûye û xwedî bandoreke mezin e, li kîjan malê zarok bi Filmên Çarlî Çaplin nekenîyane, kîjan dayik û bav bi Filmê Rê bandor nebûye û li ber negirîyaye, an jî kîjan ciwan nexwestîye weke Romeo be.

Va, di pêvajoyên dawî de sê keçên me xwe kirin bombe. Yek Bermal, yek Rojbîn û yek jî Binefş bû. Ev keç keçên evînê ne. Bi hezaran ciwanên Kurdan xwe wisa şewitandin.

Çima wisa dibe? Yek; evîna Kurd ji qurmê xwe ve ji nû ve şîn dibe. A duyemîn jî ev hemû bi navê min dibin.

Niha ez ê çi bikim? Divê ez pêk bînim ku careka din Edûlê û Derwêş, Mem û Zînê xwe wisa neşewitînin. Hemû destanên Kurd bi evînê dest pê dikin. Berxwedêrîyeke mezin û piştre jî bêçareyî... Va, destan wisa diafirin. Di van destanan de yekîtî tune ye, şerê Kurdan bi serkeftinî nayê birêvebirin. Xîyanet heye û bêşensîya herî mezin jî dijmin hêzdar e.

Min got, divê ez serkeftina evînê biafirînim û ez diafirînim. Serkeftina evînê, serkeftina gel e. Hemû hewla min ji bo pêkanîna evîna Kurd e. Ez ne li dijî zewacê me, ger tu tiştekî bikî, divê tu bi evîn û hezkirinê çêbikî. Evîn gelê me ye û em ê ji nû ve bidine afirandin.

Hinek Kurd hê ji niha de li ser mirinê hin lîstokan saz dikin. Heke Beko tunebana, me ji zû de serkeftin bi dest xistibû. Ji mirina min a yekemîn dijmin, a duyemîn jî ev Beko berpirsîyar in. Ez li ser sewdaya Mem û Zîn ji nû ve şîn bûm. Ez dijîm û xwedî tol im. Bila her kes hesabê xwe baş bike. Ez egîdîya xwe bernadim, hesabê dipirsim. Divê Kurd jî hinek tiştan fêm bikin. Beko'yên me pir in. Heke em fersendê bi wan nedin, em ê bi ewqas ked û xwîna pakrewanan dikarin bibin xwedîyê jîyana mezin. Zilamê Kurd di bin navê namûsê de nasnameya jinê girt. Min ev baş fêm kir. Dema ku keç dibe jin, nasname, ziman û xweşiktî ji dest diçe. Weke ku di destana Derwêşê Evdî de tê dîtin; Edûlê xwedî nasname, evîn û hêz e. Ji serê tilîkan hetanî mûyên pora xwe xweşikbûna xwe diparêze, ev e evîn! Niha dema ku mirov van dibêje, dibêjin eyb e. Nexêr, ev Kurd e, binasname ye û em nikarin dev ji vê berdin. Jina bênasname nabe, jîyana bênasname nabe, egîdî nabe. Ev felsefeya Ehmedê Xanî û Derwêşê Evdî ye. Va ji bo vê bi hezaran keçên me xwe şewitandin û gihîştin evînê.

Min bi stranekê dest bi vê xebatê kir. Niha hinek xebatên min nas nakin. Hunermendekî ku straneke baş diafirîne, li ba min ji sed fermandaran hêjatir e. Ez dizanim ka kîjan baştir e. Ev tiştekî weke sedî sed li hedefê xistin e. Dema ku min dest bi van xebatên xwe kir, min got berîya her tiştî divê ev dengê Kurd qut nebe. A duyemîn, min got divê keç wisa bi hêsanî ji dest dernekevin.

qadeke piçûk heye. Ji metirsîyê dûr bimînin. Di halê berevajî de rewşên mîna lêgerînên zayendîyê xîyanet e. ji ber ku dikeve bêvîyanîyê. Da ku bikeve bêvîyanîyê, nikare yekeyê bi rê ve bibe. Ji ber ku nikare yekeyê bi rê ve bibe, derbê dixwe. Dema ku derbe xwar, ev dibe tawana xîyanetê. Ez hizir dikim ku, yên vê disepînin jî hene. Hinek ji wan çawa ku heq kiribûn hatine cezakirin. Vîyana wî şikeştîye û hedar nekirîye. Helbete nikare hedar bike. Ji ber wê yekê evîn pir zor e.

Dîroka Kurd careka din bi teşeyekî jandar derdiket ser dikê. Ez hizirîm, ma gelo dîrok dubare dikir? Ez li ser gotinên Edûlê û ketina Derwêşê Evdî pir hizirîm. Divê ev çarenûs bihata guhertin. Min got, ji ber ku ewqas xwîna pakrewanan heye. Li derdora min mirov yeko yeko xwe dişewitînin. 1500 suwarî û gerîlayên me yên ku bi dilêrî şer dikin... Min got, xwedayo ev bi serê min de jî tê. Qur-an dema ku tê xwendin çawa tê guhdarî kirin, va min jî wisa li vî dengî guhdarî kir.

Min got, îman ev e. Di vir de kirûyên hunerî yên mezin hene. Bûyer ewqas bi hev ve girêdayî ne ku, tenê yên ku hene dikarin vê fêm bikin. Welatparêzîyeke mezin heye. Ev, dilêrîya gerîla ya îroyîn e.

Derwêşê Evdî gerîlayekî mezin e. Edûlê jî...

Jixwe gelek hevalên me yên stî xwe dişewitînin. Di bingeh de ya Edûlê evîneke mezin e. Dibêje, "filan paşe min dixwaze, lê ez tenê ji Derwêşê Evdî hez dikim. Ger ev jî nebe, ez a gorê me." Ev rêgezên hezkirinên Kurdan in. Egîdîya mezin e. Derwêşê Evdî ne radestê Tirkan û ne jî radestê Ereban dibe. Ev welatparêzî ye, serxwebûnîya mezin e. Him evîna xwe dinase û him jî dijminê xwe.

Li ser vê yekê min ji hunermendê me Dîyar re got, "heke hun bi şerê mezin re nebin, a ku hun dikin sextekarî ye!" Min jê re mînaka evîna mezin a Derwêşê Evdî nîşan da. Ti kes ne weke Edûlê, ne jî weke Derwêşê Evdî dikare bibe xwedîyê evîneke mezin. Şerên wan jî mezin e. Va, destana Kurd, va evîna Kurd. Ma em ê çima van ji bîr bikin?

Evîna Edûlê evîneke mezin e. Tu hunermend nikare weke ku Edûlê Derwêşê Evdî pênase dike, pênase bike. Ez nikarim ji wan kesên ku nikarin vê pênaseyê bi îro re girê bidin re bibêjim hunermend. Ez ên heyî mandel nakim, lê ez nikarim Edûlê jî mandel bikim. Ger Edûlê bê mandelkirin, mezinahî, evîn pêk nayê. Ev gotinên mezin in. Gîyana Kurdan e. Tu van ji bîr bikî û ji xwe re bibêjî ez hunermend im, hozan im, ez ê ji te şerm bikim, nikarim te bipejirînim. Gotin, newa (melodî) û bûyer ewqas di nav hev de ne ku, ez hizir nakim di gelekî din de hebin.

Evîna Kurd hetanî ku xwe neşewitîne nikare bi ser bixîne.

na van pirsan re pêwendîdar e. Niha mirov bi hêsanî nikare bibe wêjevan, çawa ku nikare bi hêsanî bibe şervan, bi hêsanî nikare bibe xwedî wêje jî. Edeb bûyereke gelekî cidî ye. Ji bo afirandina edebê, divê em pêwendîya Kurd çareser bikin. Divê em jina Kurd, zilamê Kurd, egîdê Kurd çareser bikin.

Serkeftina Evînê Serkeftina Gel e

Min ji berê de gotibû, ka çima bûyera Mem û Zîn ewqas zor pêş ketîye. Di wê derê de ezmûneke evînê heye. Hinekî zorê li pîvanên feodal dike. Di bingeh de ev, bêrîya şoreşa netewî-demokratîk e. Dibe ku di mîrên Cizîrê de bûyereke wisa qet derbas nebûbe. Lê Ehmedê Xanî yekîtîyê dixwaze. Tunebûna yekîtîyê di navbera feodal-mîrzadeyan de, va ji hikumdarên Ecem, Ereb nizanim Bîzansîyan re derfeta layan û dagirkirinê dide. Di salên 1600'an de rewşa Kurdan a dewletbûnê û avakirina destpêkeke netewbûnê heye. Feodal-mîrzade û mîr, li pêşîya vê bi îhtîmaleke mezin asteng in. Çareserîya vê dixwaze di wêjeya Mem û Zînê de nîşan bide. Nexwe kurekî mîr û keçeke mîr bi rehetî dikarin hev û du peyda bikin û bizewicin. Ev zor nîn e. Jixwe di wan sedsalan de, bi tevahî zewacên navbera mîran wisan bûn. Hemû zewacên tebeqeyên jor, zewaca kurên mîr û keçên mîran in û zorî jî nîne. Di bingehê hev û din xurtkirinê de hê jî çêdikin. Li vê derê rewşeke derepîvan; li ser mîran, bi gor vê qonaxê ku yekitîyeke jor an jî bûyîna dewletekê re (em dikarin bibêjin bûyîna keyatîyekê jî) nebûna xwesteka zordayînê ye. Va li pêşîya vê pêşketinê ew mîr asteng in. Ev, tê xwestin ku bi destana Mem û Zîn bê şênberkirin.

Evîneke zor e. Çima evîneke zor e? Yekîtî pir zor e, dewletbûn pir zor e. Ji bo pêkanîna vê, pêwîst e ev evîn wê mîrîtîyê birûxîne û çepera feodal biçirîne. Ger ku pirtûk bê xwendin wê bê dîtin ku, daxwazîya yekîtîyekê heye. Divê gelek rêpîvanên kevin bên hilweşandin. Gelek fitne û fesad hene; ji bo rakirina ji rastê hindek azadî pêwîst e. Bûyîna van, tê wateya pêkanîna şoreşa netewî-demokratîk. Ji ber ku şoreşa netewî-demokratîk peyda nîne, di Mem û Zîn de pevretîyeke serkeftî nayê pêk anîn. Yanî di cîyekî de tê wateya nepêkanîna yekîtîya bi serkeftî ango nebîyekbûyîna Kurdan.

Ya me jî, peywira pêkanîna bûyereke sîyasî ya mezin heye. Yekîtîya sîyasî bûyereke mezin e û em dikarin ji vê re bibêjin evîna mezin. Da ku tevahî evînên piçûk karibin wateyekê biderbirînin, pêwîst e ev yekîtî pêk were. Xwe têxin şûna Mem û Zînê; ji bo ku hun evîna xwe pêk bînin, pêwîstîya yekîtîyeke sîyasî û li hember serdestan pêdivîya rizgarkirina

ev qas kirêt dike kî ye? Çawa kete vê rewşê? Xala yekem ev e.

Ya duyem, ma berxwedan pêkan e? Ma pêkane em bangî wî ji hezkirin û tekoşînê re bikin? Ma derfeta ji têkçûnê gihandina serkeftinê, yan ji bêdilîyê gihandina wêrekîyê, yan ji kirêtîyê gihandina bedewîyê heye? Tu yê çawa rabikî? Tu yê li dijminê ku ew xistîye vê rewşê temaşe bikî. Tu yê ev şerê xwe li dij dijmin bimeşînî. Tu yê bibêjî dijminê gelê Kurd bibîne. Destpêkê tu yê bangî dîtinê bikî. Piştre ger derfeta te ya berxwedanê heye, berxwe bide. Gotina "berxwedan jîyan e" vala nehatîye gotin. Ev yek şert e, jîyankirin berxwedan e, berxwedan jîyan e. Ev gelekî girîng e û divê mirov rêzdarîyeke mezin raberî vê bike. Tenê berxwedan jî têr nake, êrîşa ber bi serkeftinê dibe jî gelekî girîng e. Ji hemû enîyan ve derbasî êrîşê dibim. Ger ev kes ber bi serkeftinê ve neçe, xwarina dixwe jî heram e. Tu yê bi vî nedî xwarin û vexwarin, tu yê nedî razîn, tu yê her dem li ser stirîyan re rabigrî.

Dema tu Kurdê nû diafrînî, ji bo bi destxistina hindek mafan, hewceyîya te bi hindek serkeftinan heye. Azîneyên min li ser vê hîmê ne. Ji ber ku wekî din rêyên vê yekê nînin. Ez vê yekê herî zêde li ser xwe pêk tînim. Bi rêxistinê û çalakîyê ve amade bike, demdirêj bide jîyîn û rê li pêşîya gelek serkeftinên girîng vebike. Ger tu bikaribî van bikî, tu dikarî rihet bî. Ev yek şert e! Bêyî afirandina vî Kurdî, her tişt heram e, her tişt ketibûn e.

Pêşvexistina Hezkirina Kurd Peywira Wêjeya Kurd e.

Pêşvexistina hezkirina Kurd û şêwaza jîyana Kurd ji peywirên sereke yên wêjeya Kurd e. Balkêşkirin, xweşikirin, wêrekirin û daecibandina jîyanê, sereke peywirên wê ne, helbest û muzîkê ne. Lûtkeya wê evîn e, bêguman heger em bikaribin pêk bînin. Ez li dij evînê nînim. Berovajîyê wê, weke hêza afirandêr a mezin ez xwe dinirxînim. Hun dê bibêjin çawa? Çawanîya wê kêm zêde bi vî şerî ve hatîye bersivandin. Ez naxwazim bi hêsanî dev ji vî gelî û van axan berdim. Ji bo vê yekê li dij dijmin şerekî dijwar hewce dike.

Êdî nivîskarîya weke ya Ehmedê Xanî jî bes nake. Qiralîya ku wî daxwaz dikir, carnan ez dihizirim, dibêjim ev yek jî bes nake. Divê ji alîyekî ve em Memê, ji alîyekî ve jî Zînê biafrînin. Dem bi dem ez xwe wisa lê dikim. Wekî din mirov nikare çareserîyê peyda bike. Afirandina bûyera Kurd, evîna Kurd, wêjeya Kurd misoger bi bersivandi-

vê mijarê de rewşa herî xeternak dijîn. Hiştina li derveyî vê yekê bi serê xwe şarezayîyekê hewce dike. Terbîyekirina wan, kirina xwedîyê edebekê hewleke gelekî girîng e. Divê mirov vê yekê di wategirtina wêjeyê de weke hewleke girîng binirxîne.

Ez li ser têgîna Evînê jî radiwestim. Divê ev yek weke têgîneke herî bingehîn a wêjeyê were hizirandin. Divê di vê mijarê de em Mem û Zînê ronî bikin. Hewceye ez eşkere bibêjim; hestyarîyên niha peyda dibin, her dem nefreta min kişandine ser xwe. Mînak di nava gelê me de beşekî kadro yê herî xwe şoreşger dihesibîne, wexta hindek pereyan bi dest dixe û jinekê dibîne, ya ku siftê tê bîra wî rêxistinkirina revê ye. Çima ev yek min gelekî bandor dike? Dikarîbû wan pereyan ji bo hevalekî xwe jî pir baş xerc bikira. Dikarîbû bi wê jinê re di nava refên me de rîyên hezkarîyeke xweşik raxîne. Çima bêyî ku li ser van xalan bihizire, hema revê tînê bîra xwe? Dê biçe kû derê? Zêde cihekî ku biçe jî nîne. Dê herin himbêza polîs, çend rojan ew ajoyên xwe yên çors bijîn, piştre dê werin lêdan û werin avêtinê. Xala ez pê hêrs dibim, ev yek e. Şarezayîya wan a hezkirinê nîne. Xwezîya we kariba hez bikira, minê hetanî dawîyê xizmeta we kiriba. Niha hindekî rastîya Kurd ev e. Evîna wî nîne, dilê wî nîne. Tenê tişta ku ji destên wî tê, derfetan li ser bingehê xîyanetê bi kar tîne. Niha divê em vê çareser bikin.

Ev mînakek e, lê rastîya me ya neteweyî ji sedî nod wisa ye. Li vê derê jinên ku xwedî ziman in, tên pêşxistin. Ji her alî ve jinên ku dikarin li ser pîyên xwe bimeşin tên pêşxistin. Bi koleyan ve bizimanîbûn nabe. Ziman û dilê koleyan nabe. Zimanê kesekî ku hişk bi pergalê ve hatîye girêdan nabe. Ger wê bigre, ma dê bi çend qirûşan be? ma ji zayendîya çors çi derdikeve? Ez vî qasî eşkere dibêjim. Hîna xwe nedayîna ber fêmkirinê heye. Di bûyera Kurd de têkîlî klasîk e. Divê wêjevan li ser vê yekê raweste.

Hewceye ez dîyardeyekê destnîşan bikim. Dema mirov wêjeyê pêş dixîne, tenê di pêvajoya serûbinbûna şoreşê de ne, divê ji berîya wê em kesayeta tarî, ya bêçareserî, ya ji dil ve hatîye zincîrkirin, ya gelek caran dilê wê hatîye tunekirin, eşkere bikin. Em di çalakîyên din ên hunerê de jî û di romanê de divê mirov li ser van raweste. Di romanê de em ê Kurdê qedî çawa pênase bikin? Kurd çawa hate qedandin? Ger dê romaneke ji çend cildan çêbibe, divê cildek ji vê re were veqetandin. Kurdê qedîyayî, Kurdê evqas ketî, Kurdê têkçûyî, Kurdê bûye çehl, Kurdê revîyayî, Kurdê ev qas bi erzanî ji axa xwe diqere û Kurdê ku têkîlîyê

Divê Evîn Weke Têgîneke Bingehîn a Wêjeyê Were Hizirîn

Min bi stranekê dest bi vê xebatê kir. Niha hinek xebatên min nas nakin. Hunermendekî ku straneke baş diafirîne, li ba min ji sed fermandaran hêjatir e

Abdullah Ocelan

Ger ez niha xwe weke wêjevanê herî sereke binirxînim, ez çi dikim? Min çîroka xwe ya bi dayika xwe re vegot. Min pêwendîyên xwe yên bi mirovê Kurd re vegotin. Min pêwendîyên xwe yên bi axa Kurd re vegotin. Ez mirovekî wisa me, têkîlîyên min bi xwezayê re gelekî li pêş in. Ger ez pir awarte bi mirovê Kurd re eleqeder nebûma, jixwe me nedikarî em vê rêxistinê û vî şerî derbixin holê. Ma pêkanbû ku tu guleyekê biteqînî? Ev qas keçên ciwan, ciwanmêr hene, di

Ewrûpayê, li Firensayê bi cih bû, êdî mîna hunermednekî cîhanî dihate naskirin. Gelek xelatên cîhanî wergirtin, xelata yekemîn a mehrîcana ‘‘Kan’’ a navneteweyî bû di sala 1982’an ser filmê ‘‘Rê’’ wergirt, her wiha gelek xelatên mehrîcanên navdewletî. Di nîva salên heftêyî de ji bo xelata Nopelê jî hate hilbijartin. Berhemên Guney weke destpêka sînemaya Kurdî tên pejirandin û navê ‘‘bavê sînemaya Kurdî’’ lê hate kirin. Di dema ku Guneyî li Tirkîyayê rastî astengîyan dihat, rêjîma dethilatdar a Sûrîyayê jî heman rêbazê qedexekirina doza kurdî di ragihandin û sînemayê de dikir, ev rewş li her çar parçeyan jî didomîya.

Piştî şoreşa gelan a Rojava û bakur û rojhilatê Sûrîyê sala 2012’an, damezrandina rêveberîya xweser di sala 2014’an de, hunera sînema ji nû ve hate vejandin. Cara yekem sazîyên taybet bi karê sînemagerîyê hatin damezrandin mîna Komîna film a sînema ku di 2015’an hate damezrandin, gelek belgefilm û filmên kurt û dirêj çêkirin, perwerdeyên akademîk ên di der barê sînemayê de vekirin. Filmê ‘‘ji bo azadîyê’’ yê bi zimanê kurdî û ji bo gelek zimanan hete wergerandin ku di sala 2019’an hate çêkirin weke baştirîn filmên ku li Bakurê Sûrîyê hatine hilberandin, tê nirxandin.

Êdî ev huner li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi pêş de diçe, lê pêwîstî heye ku hîn bêhtir gudan bi vê hunerê çêbibe, yanî divê akademîyên taybet bi hunera sînema werin vekirin, ev beş di zanîngehên heyî de bê vekirin, salonên sînemayê û stodyoyên taybet bi karê sînemayê, her wisa kovarên taybet û di rêya ragihandina xwecihî re ev huner ronî bibe. Û pêwîst e ji alîyê aborî ve jî piştgirîya sazîyên sînemayê bê kirin û hemû pêdivîyên çêkirina sînemayê pêk werin.

ew e ku ramanên mirovî yên erênî û tekoşîna li dijî kedxwerî, keysbazî, dagîrkirin, jêrdeştbûn, koletî û gendelîyê pêş dixe. Bi gotineke din, sînema, li gor dîtina wan, amûreke ji bo azadîya mirovî ye, deştpêkeke ji bo tunekirina çanda dagirkerîyê ye. Bandora ramanên vê sînemayê li welatên Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê jî belav bû.

Gelek sînemagerên Rojhilata Navîn karîbûn xwe bigînin asta cîhanî, mîna derhênerê Sûrî Mustefa El-Eqad(1935-2005). Xwedîyê filmê Elrîsala û Umer EL-Muxtar, El-Eqad xwedî nerîn û dîtinên taybet bû, armanaca wî ew bû ku sînemayê bike bin xizmeta gelên Rojhilata Nvîn de, nemaze gelê Ereb, her wisa di rêya Sînemayê re şaristanîya Islamî Erebî vejîne.

Kesayeteke din a sînemayî ji Rojhilata Navîn xwe gihand asta navneteweyî, ew jî derhêner û romanivîsê Kurd Yilmaz Guney ye(1937-1984) ku di sala 1957an de derbasî sînema cîhanî bû weke lîstikvan, alîkarê derhêner û sînarîst û piştre jî wekî derhênerê romanên xwe, ku piranîya wan di girtîgehên Tirkîyayê de nivîsîne.

Filmên "Guney" bandoreke mezin li sînemaya Tirkî kir, ji ber ku reyalîteya civakî derbasî sînemayê kir, piştî ku piranîya Filmên Tirkî bi şêwazê bazirganî û li gor şêwazên pergalên sîyasî yên heyî bûn, ji ber ku naveroka filmên wî rastîya Kurd li Tirkîyayê derdixist holê û ji ber nivîsên wî yên sîyasî ku li dijî faşîzmê bûn, ew ji carekê zêdetir hat girtin. Nasnameya Tirkîyayê jê hate kişandin. Di demên binçavkirin û girtîgehê de wî binirxtirîn romanên filmên xwe nivîsandin, di vî warî de sûd ji girtîyên sîyasî, rewşenbîr û belengazan digirt.

Filmê wî yê bi navê "Hêvî" yê ku di sala 1970' î de hate çêkirin, veguhestineke girîng bû di jîyana wî ya sînemagerîyê de.

Guney di hilberîna Filmên xwe de, şêwazekî hevseng di navbera sîyaset û alîyên hunerî de da meşandin, lewma pêşnegê çêkirina filmên cemawerî bû, dozên civakî bi awayekî pêşketî ji alîyê teşe û naverokê de pêşkêş dikir.

Piştî vekişandina nasnameya wî, karîbû ji zinadanê bireve

ku navê, “bavê huneran”, li sînemayê bikin, ev navê ku heta demeke dirêj li “şanoyê” dihate kirin. Tevî van hewldanan, têgeha “hunera heftemîn” ji bo sînemayê dimîne, bi taybetî di bernameyên medyayê yên girêdayî vê hunerê û di çapemenîyê de têtе bikar anîn.

Sînema di gelek qonaxan re derbas bû ta ku îro gihaştîye vê asta pêşketî. Ji destpêka sala 1880’î ve, hewildanên gelek afrîner û wênekêşan henbûn ji bo pêşxistina vê hunerê mîna herdu bira-Lumîere li Parîsê û heta laboratuarên Edîson li Amerîkayê. Hewildanên wan bi çêkirina yekem dîmenên anîmasyon û pêşandana wê li ber cemaweran Di sala 1895’an de. Dûvre dest bi çêkirina belgeFilman û drama bû, destpêkê de kurt û bê deng bûn, piştre bûne xwdî naverokên xurt û bideng, bikaranaîna deng û rengan û montajê derbasî dîmenên sînemayê bûn, salonên sînemayê hatin vekirin û stodyoyên taybet bi çêkirina filman.

Gava mirov behsa sînemayê dike destpêkê filmên Hollywood têne bîra mirov, Hollywood ku bûye sembol di cîhana sînemayê de. Hêjayî gotinê ye ku Hollywood ne navê sazî yan kompanîyekê ye, lê ew navê deverekê li Losenclosa Emerîkayê ye, di sala 1910’an de hemû sînemageran berê xwe dane Hollywoodê û kompanîyên xwe yên hunerî li wir dane avakirin, niha jî gelek kompanîyên çêkirina sînemayê li wir hene. Mîna: “Disney, Fox, Goldwyn-Mayer Metro, Paramount, Birayên Warner, Universal, Kolombîya, û yên din.” Wê studyoyên mezin, korîdorek ji bo kombûna celebrityên sînemayê, û salorek ji bo Oscars sînemayî hene. Ji ber vê yekê jê re dibêjin “Bajarê Sînemayê”.

Ji alîyekî din ve, di cîhanê de rûyekî din yê sînemayê xuya kir, ku bi naverokên Filmên “Hollywood” re dijber bû, ev rikberiya bi Hollywoodê re bi rêya sazkirin “koma Filmên rizgariyê” ku gelek derhêrenên Amerîkaya Latînî jî di nav de bûn, û destpêkirina “Sînemaya Sêyemîn” ragihandin, destpêkirin bi daxuyanîya herdu dehênerên Arjantînî Fernando Solanas û Octavio Getino bû, ku di sala 1969an de weşandin û sernavê wê “Ber bi sînemayeke sêyemîn ve”. Li gor dîtina wan “sînema sêyemîn”

Pêşekî

Der Barê Sînemayê De

Desteya sernivîskariyê

Yên ku hunera sînemayê dişopînin ji girîngî û bandora wê ya mezin haydar in, sînema awayekî belavkirina raman, çand û bîrdozîyên cuda bi rêbaz û şêweyên cûrbecûr e.

ji destpêka derketina sînemayê, hin rexnegir û fîlozofên Ewropî ew wekî "hunera heftemîn" binav kirin, bi domana demê re ev danasîn bû sernavek ji bo sînemayê, sedema vê navlêkirinê jî ji kronolojîya derketina sînemayê ye, ku piştî mîmarîyê, muzîkê, wênesazî, peykersazyê, edebîyat, û dansê di rêza heftemîn de ye. Her wiha pêwîstîya çêkirina sînemayê bi her şeş hunerên ku berî wê derketine heye.

Tevî derengderketina sînemayê, lê ji hemû hunerên din zûtir belav bû û bala her kesî kişand ser xwe, bi taybetî piştî bikaranîna teknîka modern.

Ji bo vê, hin rexnegirên hunerê di dehsalên dawî de hewl dan

• **Pirtûkên derketî** .....
- Pirtûkên derketî.. (Desteya sernivîskarîyê) 59

• **werger** .....
- Ji Amerîkaya Latînî Heya Libnanê "Sînemaya Sêyem"
  Şahidê Şoreşê Ye .. (Şefîq Tebara, Wergera ji Erebî: Hişyar Murad)..... 63

• **Çîrok** .....
- Hêvîya Di Hembêza Şevekê De.. (Zinarîn Dîyar) 72
- Zarokatî Jîyan e Jîyanê Mekujin.. (Hind Ebdelo) 76
- Dara Mirazan.. (Zîlan Hemo) 78

• **Helbest** .....
- Xêvzan.. (Xalid Qasim) 80
- Perîya Dilderya.. (Lîlav Îsa) 82
- Evêsta Xabûr ..(Mihemed Welîd) 84

• **Serbest** .....
- Alîyên Afirandinê.. (Reşîd Ebas)..... 85
- Gundê Balîya .. (Şerîf Mihemed- Welîd Bekir) 88
- Banga Sibehê.. (Salîha Qasim)..... 91

Naveroka Hejmarê

• **Pêşekî** .....
- Der Barê Sînemayê De.. (Deŝteya sernivîskarîyê) 5

• **Analîzên hizrî** .....
- Divê Evîn Weke Têgîneke Bingehîn a Wêjeyê Were Hizirîn ... (Abdullah Ocelan) 9

• **Dosyaya hejmarê** .....
- Hunera Heftemîn.. (Safînaz Evdikê)..... 15
- Çand û Huner û Sînema.. (Andok Serdem)..... 19

• **Lêkolîn** .....
- Kurtedîroka Sînemaya Kurdî... (Biradoŝtê Mîtanî) 22
- Xanî û Welatperwerî... (Diyar Bohtî) 28
- Xwekuştin û Nivîskarî... (Occo Mahabad) 34
- Di Sedsala 21'ê De Raŝtîyên Şeran... (Azad Ararat) 39

• **Hevpeyvîna hejmarê** .....
- Li gel Sînemager Ersîn Çelîk e (Aram Hesen) 50

• **Jin û çand** .....
- Jin û Wêje .. (Fatma Sîdo) 57

Şermola... Dîdargeheke çandî, wêjeyî resen e

Divya bû em weke rewşenbîrên Bakur û Rojhilatê Sûryê asta keda çandî bilind bikin di rewşên herî dijwar û di şerekî bê hempa de, ku destwerdanên navdewletî , herêmî û xwecihî tevlî hev bûne, şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûryê ji hinavê vê rewşê pengizî. Gelên wê qurbaniyên herî mezin pêşkêş kirin ji bo bidestxistina jiyaneke demokrat û azad , ku nirxên civakbûyînê yên bi hezarên salan rehên xwe berdane bîrgeha vê xakê biparêze, di encama vê keda tê dayîn de me ev kovar weşand ku em tê de hewil didin di riya pênûsên şareza de radeya pêkanîna çandî pêş ve bibin ta ku bibe hêjayî asta bûyerên ku diqewimin, her wiha ji bo bibe bingeh û hêzeke bandorker, ku asta civakê ji milê ramyarî û çandî ve pêş bixe ji bo xwe bigihîne ayîndeyeke baştir û çêtir.

Desteya sernivîskariyê navê Şermola hilbijart ji ber sedemên dîrokî ku reseniyekê lê bar bike. Şermola bi xwe navê girekî dîrokî ye li Amûda Bakurê Sûryê ye, di gel ku girên herêmê bi giştî di serdema Horî-mîtanî de weke nîşana kombûnê di rewşên awarte de û li hemberî êrîşan dihatin bikar anîn, lê piştre ew gir weke rawestgeh û dîdargeha karwanên guhêzer di navbera mîrnişînên hundirîn ên Sûryê û bakurê wê û Kurdistanê bi gelemperî bi kar dihat.

Lewre ev nav rehendeke dîrokî digre ku reseniyeke ramyarî û wêjeyî peyît dike , ta karibe bibe dîdargeheke çandî ji bo rewşenbîrên gelên herêmê bi giştî. Deriyê kovarê vekiriye ji bo hemî şiyanên wêjeyî û afrînerî, ku hevdengiyekê li gel armancên kovarê di şiyarkirnê de dike, her wiha veguhastineke bê hempa di rojeva çandî de li Rojava û li Bakurê Sûryê bi giştî diafirîne, li kêleka sazî û yekîtiyên rewşenbîrî, rojname û kovarên wêjeyî li herêmê.

ŞERMOLA
شـــرمولا

-Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane û serbixwe ye, bi zimanên Kurdî û Erebî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê weşandin.
-Di 24 Êlûna 2018›an hatîye damezrandin û Hejmara yekemîn di roja 7›ê Sibata 2019›an de derket.
-Kovarê rêdana xwe Ji Encûmena Bilind a Ragihandinê ya Rêveberiya Xweserîya Demoqratîk a Herêma Cizîrê girtîye, li gor belgeya NO 3 a ku di dîroka 29.1.2019›an Hatiye Dayîn.

Rêgezên weşanê

-Kovar bi dilxweşî pêşwaziya hemû berhemên wêjeyî û rewşenbîrî dike.
-Hemû berhemên ku digihêjin kovarê; di nirxandina desteya nivîskariyê re derbas dibin.
-Derbarê berhemên ku têne weşandin; nayê wateya ku ev berhem nêrîn û polîtîkayên kovarê derbirîn dikin.
-Pêwîst e ku hemû lêkolînên ji kovarê re tên şandin, ji aliyê zanistî ve bi belge bin, ku qasa gotarê di navbera 700 ta 1.200 peyvan de be û ya lêkolînê di navbera 2.500 ta 3.000 peyv de be.
-Ji bo jêgirtinên ji jêderan; pêwîst e bi vî awayî werin belgekirin:
Navê nivîskar-navê pirtûkê-navê wergêr, eger pirtûk wergerandî be-cih û dîroka çapkirinê. Ji bo dezgehên ragihandinê ku weşaneke wê weke çavkanî û belge hatibe bikaranîn bi vî awayî tê rêzkirin: Navê nivîskar-serenavê berhema hatiye weşandin-navê dezgeha ragihandirê (rojname, kovar, malpera elektironîk) - hejmara weşanê (ya rojname û kovaran) - dîroka weşanê.
-Berhemên ku tên şandin ji bo kovarê heger desteya nivîskariyê bibîne ku ev berhem ji aliyê wêjeyî û çandî ve bênirx e, berê hatiye weşandin, ji dezgehine din re yên ragihandinê hatiye şandin, ji derveyî rêgezên giştî yên civakê be yan jî devavêtin ji ol û gelan re hebe; kovar lêborînê dixwaze derbarê weşana van berheman de.

Rêveber û Sernivîskarê giştî:
Dilşad Murad

Sernivîskarê beşa Kurdî:
Aram Hesen

Beşa hunerî:
Rêvan Yûsiv

Desteya sernivîskarîyê:
Aram Hesen
Abdullah Şikakî
Ehmed Alyûsiv
Fatma Sîdo

-Malpera kovarê:
www.shermola.net
-E-MAIL:
shermola2018@gmail.com
-Telefon û whatsapp:
0998149668

-Kovar li çapxaneya Sîmav – Qamişlo tê çapkirin.
-Belavkirin û Firotin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşgeha Alşemal – Qamişlo 0998234958.
-Pirtûkxaneya Amara ya navendî (Qamişlo, Bazara navendî) 0937812709.
- Nirxê kovarê (1000 L.S).

ŞERMOLA

شـــــرمولا

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane ye Hejmar: 6 Buhara 2020 z

Çêkirin û Rola Hunera Sînemayê

Qapa Hejmarê: fîlma (Ji Bo Azadiyê)

Hevpeyvîna hejmarê li gel Sînemager Ersîn Çelîk e

Kurtedîroka Sînemaya Kurdî

Ji Amerîkaya Latînî Heya Libnanê "Sînemaya Sêyem" Şahidê Şoreşê Ye